# EV ROMANA

# JİYANA HER KESİ YE

**JI BO BIRANÎNA RÊHEVAL ŞEHÎD BÊRÎTAN (GULNAZ KARATAŞ) KU GOTIYE "EZ DIXWAZIM BI ALÎKARIYA DAHÛRÎNÊN RÊBERTÎ ROMANEKÊ BINIVÎSIM".**

**EV PIRTÛK JI BO TEVAYÎ ZAROKÊN ROJÊ HATIYE AMADE KIRIN**

**HEVAL RUMET**

## ARMANCA AMADEKIRINA VÊ PIRTÛKÊ

Di pirtûkên welatê me Kurdîstanê de, li ser jiyana Rêber APO gelek zanîn û nirxandin hene. Di heman demê de Paraznameyên Rêbertî tên xwendin. Di derbarê Rêbertiyê de gelek caran zanînên taybet tên xwestin. Her zarokek Kurdîstanê pêwîstiya xwe bi lêkolînê dibîne. Lê çavkaniyeke berhevkirî li ser jiyana Rêber APO tine ye. Agahî û nirxandinên ku hatıne kirin jî, pir caran kêm mayîne. Bi armanca ku her zarokek welatê me Kurdîstanê, bikaribe bixwîne, jê sûd werbigire û encam bigire ev pirtûk hatiye amadekirin. Bi vê bîr û baweriyê, ev pırtûk jı bo hemû zarokên Rojê weke dıyarî hatıye amadekırın.

## PERGALA AMADEKARIYÊN NIVÎS

Piraniya vê nivîsê binirxandinên RÊBER'ê me ABDULLAH OCALAN hatiye amadekirin. Tê zanîn RÊBERTÎ bi navê Romana Jiyana Min xebatek destpêkiribû. Bi xwe jiyana xwe nirxandibû. Lê ew nivîs heya cihekê dihat. Li ser wê nivîsa Romana Rêbertî nirxandina paraznameyan di derbarê Rêbertî de hat berhevkirin û li gor kronolijiya dîrokî hate sazûmankirin. Di serî de bi nirxandinên malbatê û agahiyên heyî nivîs hate dest girtin. Piştre binirxandinên Rêbertî hate berdewamkirin. Hinek nirxandinên ku bikaribin vê nivîsê temam bikin ji belgeyên cûr be cûr hatine girtin. Ev belge hem nivîs dewlemend kirine, hem jî hinek xalên ku nehatiye ser ziman temam kirine. Nivîs sal bi sal hatiye destgirtin. Di hinek salan de bûyerên girîng yên ku hatine jiyankirin bikinahî hatiye destgirtin. Hinek hevalên ku di avakirina Partiya Karkerên Kurdîstan de bûne mînakên bingehîn û zarokên Kurdîstanê binavê wan tekoşerên azadiyê hatine binavkirin, hatine destgirtin. Bi kinahî jiyana van hevalan hatiye nivîsîn. Armanc ew bû ku tenê bîyografiya RÊBER APO were amadekirin. Lê hinek bûyer jî bi kinahî hatine destgirtin.

## PIRTÛKÊN HATINE BERHEVKIRIN

_Paraznameya Ji Dewleta Rahîbên Sûmeran Berbi Komara Demokratîk Ya Gelan.

_Paraznameya Parastina Gelekî.

_Paraznameya Atîna.

_Pênc Cîld Paraznameyên Şaristaniya Moderníteya Demokratîk.

_Şoreşa Civakî û Jiyana Nû.

_Evîna Kurd.

-Jina Azad Kî Ye, Çawa Jiyan Dike?

_Dîroka Partiyê (Pirtûka Heval Abbas).

_Dîroka partiyê (Pirtûka Waneya Dibistana Amadeyî).

_Belgefîlma Dîroka Ji Agir.

-Nirxandina Taybet (Nêrînên Hevala Amadekar).

_Hemû Wêne yên rastin. Li ser wan bi tu şêweyî nehatiye lîstin. Piraniya wêneyan ji dîmenên Dîroka ji agir û albûma wêneya ya Rêber APO hatine girtin.

**NÊRÎNEK HEVALTÎ**

Ji bo her mirovê ku vê pirtûkê bigire dest û bixwîne bi silav, rêz û hezkirina xwe, çend nêrînan dixwazim diyarî bikim.

Ji bo hemû zarokên Kurdîstanê pêwîstiyek vê xebatê hebû û hîn jî heye. Ev berhema hêja jî, hîn zêdetir dikare were dewlemendkirin û bihêzkirin. Ji ber em xwedî Rêberekî weke RÊBER APO ne bi rastî jî berhemek bi coş û kêfxweşî hat amadekirin. Her gotineke Rêberê me dibe romana jiyana her kesî. Ji ber vê xebateke bi dil û can bi şanazî û serbilindi hat destgirtin. Di berhevkirin, komkirina belgeyan û bicihkirina wan de dibe ku kêmasî, lewazî û xeletî derketibin. Di rewşeke wisa de bi awayeke lezgîn wê ev kêmahî werin derbas kirin. Ji niha ve ji bo xeletî û lewaziyan ez bexişandinê dixwazim. Di vê pirtûkê de navê kes yê amadekar derbas nebûna baştir dibû. Lê ji bo ku kêmahî û lewaziyan rakim ser xwe û wan bi şanazî derbas bikim nav destnîşan dikim.

**SILAV, RÊZ Û HEZKIRINÊN ŞOREŞGERÎ**
**04 NÎSAN 2013**
**Wargeha Penaberan A ŞEHÎD RUSTEM CÛDÎ**

## PÊŞGOTIN

“Her kes mirovê ku di hindirê xwe de veşartiye di kesayeta min de dibîne. Dibêje; “nûneriya parçeyekî min tu dikî.” Lê ew parçe veşartiye. Kesayeta ku xwe dide der û diyar dibe cuda ye. Mirovekî ku di aliyê dilê her kesî de maye heye. Ew jî ez im. Ev hest pir zêde heye. Lê belê veşartiye. Di cihekî biçûk nava dilê her kesî de ye. Weke kombûyîna hemû parçeyan hûn dikarin min bihizirin.

Navenda şaristaniyan û ya xwedavenda evînê Mezopotamya ye. Tu kes biqasî yên li ser van xakan jiyan dike, azad pênehesaye, azad ne afirandiye, azad heznekiriye û xweşikbûn ne afirandiye.

Silsileya Toros-Zaxrosan, quntar û asoyên wan cihê afirêneriya mirovahiyê ye. Weke welat Kurdîstan û weke Civak Kurd, ji hembêza vê xwezayê, ji wê serdema bêmirinî derketine.

Dema ku hebûn dibe mijara gotinê; hemû gelên ku rû bi rûyê têkçûyîna şeref û azadiya xwe dimînin neçarî şer dibin. Derveyî şer, ti rêbazên din ji bo azadî, şeref û parastina wan nabe bersiv. Ev dem ji bo Kurdan demek wisa ye.

Cara yekem dema min têgeha “Kurdîstan Bindeste” bikar anî dilê min û mejiyê min ricifîbû. Bi rastî jî min ev mijar gelek ecêb pêşwazî kiribû. Ev têgeh li ser min pir bandor kiribû.  Diviyabû min ev bûyer çareserbikira û ev bindestî ji hemû aliyan ve bidana derbaskirin. Ji xwe heya niha jî bandor dike. Hemû bûyer û Têkoşîna Azadiyê bi vê têgehê ve girêdayî pêş diketin.

Ez tevayî bîranînên zaroktiya xwe bibîr tînim. Hemû kevir, dar-ber, çûk, herî, marên welatê xwe bibîr tînim. Her yek ji wan hevalên min bûn. Her aveke wê, her çûkek wê, her şînahiyeke wê di bîra min de ye. Divê li ser xweşikiya welat were sekinandin. Ji bo welat deynê min ev e.

Pêwîste ev dem werin zanîn. Ji ber ev serpêhatıya jiyana her kesî ye. Kesê ku fêr nebe, nikare bibe mîlîtanekî azadiyê yê/a dijwar. Zanîna dîroka partiyê bitêgihiştina jiyana min ve ji nêz ve girêdayî ye.

**RÊBER ABDULLAH ÖCALAN**

# ZAYÎNA YEKEM

Bi îdeaya ku ez ê civakbûyîna xwe û ya dayika xwe bi xwe damezrînim destpêkir. Bi nerazîbûna li dijî gund û malbatê, bi çûyîna dibistana seretayî re dewam kir. Bi destpêkirina dibistana seretayî re gava yekemîn ya ji dil berbi dewletbûnê ve hat avêtin. Di vê demê de kesayet ji civaka komun, berbi civaka dewletparêz ve gaveke veguherînê diavêje. Ber bi bajarbûyînê ve dimeşe. Nirxên bajêr di ser nirxên komun ên bejahiya gund re têne hesibandin. Xwendina dibistana navîn, amadeyî, karmendî û heta refa dawî ya zanîngehê amadekariyên pêş ji bo zilamtiya dewletê ne. Di vî temenî de li cem her kesî bi awayekî hişk kesayeteke bajêr-dewletê ava dibe. Rewşa paşvemayînê û netewa bindest, dibe sedema nerazîbûna li dijî dewletê. Ya rastî, sempatîzaniya ji bo çepgiriyê, ji têgihiştina adîl, wekhevîxwaz û pêşdebirinê ya lêgerîna dewletê zêdetir tu wateyek wê nîne. Kesayet di vê demê de bigiranî ji tayên civakê yên kevneşopiyê tê qetandin. Civaka ezbet û çolter ya komun û dayikî bigiranî li înkarê hatiye qewimandin, li dewsa wê, kesayeteke marjînal ya jixweçûyî, rabir duya xwe înkar dike ava dibe. Biçûk dibîne, çavgirtî berbi sazûmaniya fermî ve baz dide. Ji mezinbûna bajar û dewletê re serî ditewîne, di nav de cih digire. Komkujiyeke kesayetê ya trajîk diqewime.

Kesayeteke dîn û şêt nizane bûye çi! Civaka xwe ya kevin bav û dayika xwe, gundê xwe, xizmên xwe, kal û pîrên xwe, zarok, jin, nijad û zuriyeta xwe û çîna xwe biçûk û hakîr dibîne. Li welatên hinekî pêşketî bûye mîna belayan. Bi modernîteyeke naveroka wê pûç li hemberî nirxên bingehîn ên civakî pir zêde xerîb ketiye. Ev kesayeta ku dibin serdestiyeke xurt ya sîstema kapîtalîst de mezin dibe, wexta nerazîbûneke sexte ya çepgiriyê dike jî lê dîsa marjînale. Durketina wê ya ji civakê her ku diçe kur dibe û dewam dike. Dibistan, li bajêr karkertî û karmendiya dewletê, ev kesayet ji dîrok û kevneşopiyê durxistiye û kiriye kesayeteke teneke. Her tiştê ji vê kesayeta xemsar, înkarker, bi mûçeyan ve hatiye girêdan û li pey fahîşetiya bajêr ketiye,

neçare li dijî nirxên kapîtalîzmê û civaka li pêş astenge îflas bike. Sosyalîzma pêkhatî Sosyal Demokrasî û Rizgariya Netewî veguherîneke rastîn ya civakî pêk neanîn. Ev yek ji nêz ve bi vê kesayetê ve têkildare. Di serdema me de, bingeha civakê yên her cûre jêderketin, bîrdoziyên totalîter ên faşîst û pratîkên wan xwe dispêrin avabûna vê kesayetê. Vê kesayetê bi şoreşa Fransayê re gav avêt, di salên 1990'î de balkêşiya xwe ya berê wenda kir û careke din biketina pêvajoyeke asayîbûnê biencam bû.

"RÊBERÊ me ABDULLAH OCALAN di 4'ê nîsana 1949 an de li navçeya Xelfetî, ya girêdayî Riha yê gundê AMARA (Omerlî) jidayik bûye. Gundê Amara gundê Kurda ye.

Navê bavê RÊBER'ê me OMER'e.

Navê Dayika RÊBER'ê me UWEYŞ'e.

Navên xwîşkên RÊBERÊ"me Fatma, Hawa, Eynê û Gulsum'e. Gulsum çûye ser dilovaniya xwe.

Navên Birayên RÊBERÊ me Mehmed û osman e. RÊBERTÎ salek – du salan ji Mehmed mezintir e.

Dayika RÊBERTÎ Pîrika wî û pîrika pîrika wî hemû zarokên xaltîkên hev in. Di navbera wan de nakokiya doza xwînê derdikeve. Ji bo vê nêzî 20 salan li gundê Cîbînê dimînin. Lê belê Bavê Omer ji gundê xwe dernakeve. Piştre hemû malbat jî vedigerin warê xwe.

**FATMA OCALAN:** Dema Serokatî jidayik dibe, dayika min wî dipêçe û çep werdigerîne. Em ji wê re dibêjin xêrbûn. Ango dayika min wisa nirx dabûyê. Ew pîroz kiribû. Em heft xwîşk û birane. RÊBERTÎ, Osman, Mehmed ez Fatma û Eynê. Gulsum jî heye. Lê Gulsum wefat kiriye. Ez ya pêncemîn im. Serokatî 4 salan ji min mezintir e.

Gundê me Gundê Kurdaye. Gundên derûdora me jî hemû Kurd in.

**MEHMED OCALAN:** RÊBER APO heya refa 5 an jî bi gundiyan re radibû û rûdinişt. Ango bi wan re jiyan dikir. Heya ku hêza wî têrê dikir bi gundiyan re dixebitî.

**FATMA OCALAN:** Ew jî weke me di xebitî. Berê me bidestan giya diçinî. Li bexçeyan me fistek kom dikirin. Li reza tirî kom dikirin. Wî jî bi me re kar dikir.

**HAWA KESER:** Destê wî pir sivik bû. Em li bexçeyan di xebitîn. Heywanek du heywanên me jî hebûn. Em sibê zû radibûn me dest bi karê xwe dikir. Dema me banîdikirê digot ''Min karê xwe kiriye û ez hatim e''.

**MEHMED OCALAN:** Ji me tevan jêhatîtir bû. Heya ku me gîhayek diçinî wî du bax gîha diçinî. Destê wî pir sivik bû. Ji me hemûyan zîrektir bû. Tenê salek du salan ji min mezintir bû.

**FATMA OCALAN:** Li binya gundê me çemek hebû. Dema em ji çinînê vedigeriyan ew diçû ber wî çemî û mar dikuştin. Navê wê derê Newala Bîrê bû.  Bêtirs bû. Ji maran qet neditirsiya. Dema ku mar nedidîtin jî ew ji kuna wan derdixistin û dikuştin. Rojê çar – pênc mar dikuştin.

**HAWA KESER:** Di biçûkaniya wî de em gelek hay jê hebûn. Bi carkê re wenda dibû. Em her tim li du wî bûn. Di havînê de me mêze dikir, çûye çend çûk anîne. Ew çûk serjênedikirin. Ew xwedî dikirin û piştre jî berdidan.

Dayika min jê re digot:

-“Tu naçî cem wan zarokan û bi wan re na lîz”. Wî jî digot:

-“Ezê herim, bi wan re jî bilîzim û bînim vir”.

**FATMA OCALAN:** Dema wî tiştên xwe bi hevalên xwe re parvedikir, dayika min hêrs dibû. Digot:

-“Tu çima zarokan li ser serê xwe kom dikî?”

Yek ji wan hevalên wî yên ku bi hevûdu re pir dilîstin Emîn bû. Çûkên wî jî hebûn. Wan bi hevûdu re dilîstin. Hevalê wî yê din jî Cuma bû. Jê re digotin Cumo. Cumo Serê Serok şkandibû. Rojekê dema dilîzin di navbera wan de pevçûnek derdikeve û keviran diavêjin hev. Kevirek tê li serê RÊBERTÎ dikeve û dişkê. Dema ku hat mal dayika min dît ku serê wî şkestiye. Jê re got;

-“Tu çima bi vî halî hatî mal. Here tu jî serê wî Cumoyî bişkîne û were.”

**HAMZA BÎNDAL:** Di navbera malbatên me de doza xwînê tinebû. Pirsgirêkek biçûk hatibû jiyankirin û malbatên me ji hev du xeyidîbûn.

**ELÎF BÎNDAL:** Ez di 15 saliya xwe de zewicîm. Li cem me adete. Piştî hefteyekê bûk tên mala bavê xwe. Ez jî hatibûm. Lê dema min Abdullah dît, ez çûm min pêre lîstok lîstin. Dayika min dema em dîtin keniya û got:

-“Were tiyê te hatiye te bibe. Bûk hatiye malê. Lê hîn lîstokan dilîze”.

**HAWA KESER:** Di wê demê de kesî zarokên xwe nedişandin dibistanê. Bavê min got:

-“Ez ê kurê xwe bişînim dibistanê”.

Me ew şand dibistana Gundê Cîbînê (Saylakkaya)

**HAWA KESER:** Dibistana seretayî nîv seatê durî me bû. Bipeya diçû û dihat. Carna dereng dima. Bavê min diçû pêşiya wî û dihatin. Ji bavê min re digot:

-“Bavo min li vir qeşa şkandiye, ez ê desmêj bigirim, nimêja xwe bikim û werim. Hîn di wê demê de dest bi nimêjê kiribû. Heya çû dibistana navîn jî, ji mizgeftê dernediket. Berf jî bihata, qiyamet jî rabûya wî nimêja xwe dikir. Carna dereng dima û dihat malê. Me jê re digot;

-“Tu çima dereng mayî”?

-Di got min nimêja xwe kir. Min jê re digot:

-“Abdullah tu çawa bi vê ava qeşayê desmêj digirî”? Di got:

-“Ez dikarim bigirim”.

**XIDIR AKTEPE:** Dema dibistanê navbera nîvro dida, zarokên gundên cîranên me dihatin malên me. Ew jî diçû mala Xaltîka Fatma. Rêzdarî û axaftina wî pir cûda bu. Xaltîka Fatma digot:

-“Her tim di dema nimêjê de Abdullah derdiket ser zinarekî û nimêja xwe dikir”.

**MERYEM BÎNDAL:** Di dibistanê de pir jîr bû. Gelek dixebitî. Li nava malan gelek şermok bû, zêde ne diaxifî. Di nava hevalên xwe de pir jîr bû. Her kesî ji zarokên xwe re digotin, di refê de li cem Abdullah rûnên da ku hûn jî jîr bibin.

**HAWA KESER:** Mamosteyên wî hebûn. Yek ji wan ji gundê Arahê bû. Wan ji me re behsa Abdullah dikirin. Ji bavê min re gotibûn:

-“Em bi kurê te nikarin, berî em wane bidinê ew waneyan dide me”.

**MEHMED OCALAN:** Mamosteyê ku dixwest Serok li dibistanê qeyd bike Fuat Tungay bû. Gundiyê me bû. Wî behs dikir, birastî jî pir nirxê wî zanibû. Ji bavê min re gotibû:

-“Abdullah pir rêzdare. Binêre kurê te pir jîr e. Serê wî pir baş dixebite. Lazime em kurê te bidin xwendin. Ji xwe wî ew li dibistanê qeyt kir”.

<u>Bi vî awayî navê RÊBERÊ me Abdullah Ocalan li dibistana navîn tê qeydkırin û ji gund derdike ve.</u>

**HAWA KESER:** Li Nîzîpê dibistana navîn hebû. Bavê min ew li wir qeydî dibistanê kir. Xwîşka min a mezin, pirîka mın û mala xalê min li Nîzîpê bûn.

**FATMA OCALAN:** Xwîşka min a mezin hebû li Nîzîpê. Wê jiyana xwe ji dest daye. Wê digot:

-“Ev tê û qet ji hindir dernakeve. Bişev û roj wextê xwe bi xwendinê re derbas dike”.

Dapîra min her tim pêre şer dikir. Dapîra min digot:

-“Abdullah ev çi şêwazê xwendinê ye? Ma tu çima qet dernakevî derve, ji bo ez jî derbikevim. Ez her tim li ber te dimînim”.

**HAWA KESER:** Bi bavê min re şer kiribû. Pir hêrs bibû. Li cem min li Nîzîpê dima. Ew, hevalê min û tiyê min diçûn dirûna gîhayan. Piştî du

rojan deh hezar girtibû. Digot: “ez ê van deh hezaran bidim bavê xwe. Min deh hezarên wî anîbûn. Ez ê van diravan lê vegerînim”.

**FATMA OCALAN:** Rewşa me ya malbatê nebaşbû. Çend salan ew jî bi me re hat Edenê, ji bo çinîna pembû. Heya ku di nava zeviyê de me beşa xwe diqedand, wî du caran li me zêdetir diqedand. Pir jîr bû.

**HAWA KESER:** Dema çû dibistana Kadastro ya Enqerê têkiliyên me qut nebûn. Carna di dema bêhndanê de dihat cem min. Lê kêm dihat.

“JI BELGEFÎLMA DÎROKA JI AGIR HATIYE GIRTIN”

## GULA DI NAVA ZINARAN DE

Çîroka jiyana min pir dewlemend e. Di her kêliyeke wê de dîrokek veşartiye. Ez ê hewil bidim van kêliyên biwate cardin bibîr bînim.

Hîn di bîra min de ye. Em li ber siha mizgeftê bûn. Çend hevalên min li derdora min bûn. Kalekî bitemen jî li ber mizgeftê rûniştibû. Min got û got. Kalê bitemen serê xwe zîvirand û got:

- Kurê min, em weke dara hişk in. Ma niha tu dikarî van darên hişk cardin şîn bikî?

Ev bîranîna min ya yekeme ku tê bîra min û hîn jî min jibîr nekiriye. Di sala 1994’ an de helbestvanek hatibû cem min. Gotineke min anî bîra min. Nivîskar got “GULA DI NAVA ZINARAN DE” gotineke te ya wisa hebû. Yanî ez gulek di nava zinaran de şîn bûyî me; an jî ez ê şînbûyîna di nava zinaran de bi serbixim.

Şînkirina dara hişk, bûyîna gula di nava zinaran de, gelek biwate ye.

Azadî di zarokatiyê de destpêdike. Ji berê ve min her tim dixwest ez bi hevalên xwe re bimeşim. Di lîstokên zaroktî de, di xebatên me yên zaroktî de tişta herî zêde min jê hezdikir, pêşandanên zarokan a giştî, pêşxistina meşa wan bû. Ji bo pêşxistina wan lîstokên asayî yên dihatin zanin binavê lîstikan min ji hezar avan av kom dikirin. Lê ji bo em bi hevû du re bin, min ev dikirin. Bi tenê ne lîstokên dihatin zanîn

bûn. Min gelek lîstok derdixistin. Bi şev û roj min hevalên xwe li ser piyan, di nava tevgerê de dihiştin. Di vê mijarê de min hinek navdarî jî kiribû. Navê min derketibû. Hemû gundiyan zarokên xwe vedişartin. Digotin;

-"Zarokên xwe radestî vî nekin".

Lê di wê demê de kesên wisa digotin pirbûn. Ez li dora malan weke nêçîrvanan digeriyam. Digotin;

-"Cardin hat, wê aqilê zarokên me ji serê wan derbixe".

Gelek bûn û hinekan ji wan, zarokên xwe kirin karmend. Lê ez ê cardin wan bigirim. Heger ez cardin herim gund ez ê wan zarokên ku ji min veşartibûn cardin bigirim û daynim pêşberî xwe. Ez ê cardin ji wan re bibêjim werin. Ez ê cardin wan li meydanekê kom bikim û lîstokan fêrî wan bikim.

Biqasî ku min dixwest, min bi zarokan re nelîst. Azadî tinebû. Ya ku min dixwest, ne şer bû. Lîstokên bi zarokan re bû. Lîstokên hêsan bûn.

Hemû lîstokên me, meşa berbi çiyayan ve bû, komkirina nergizan bû, komkirina giyayan, nêçîra çûkan bû. Hemû hewildanên me ji bo vê bû.

Ez li çiyayan pir dimam.

Min nebat kom dikirin, nêçîrvaniya çûkan dikir. Ya rastî pir zêde çûkên ku dihatin nêçîrkirin jî tinebûn. Lê min ewqasî kevir diavêtin… biqasî tê bîra min, min çend çûk li hewa lêdabûn. Wisa anîn xwar. Xefkên ku min danîbûn hebûn. Min gelek kevok digirtin. Ji xwe her carê çar – pênc kevok girtin bi serê xwe serkeftin bû. Êdî min bi xwe, ew dipijandin. Ji xwe bala zarokan gelek dikişandin. Min hevalên xwe di bin navê çûkan de heya ber avê dibirin. Ew çûkên min nêçîr kiribûn, her perçeyek dida zarokekê.

Dîmenek wê demê hîn di bîra min de ye.

Piştî nêçîra wan çûkan, min hemû di kirasê xwe de kom kiribûn. Bi çar çavan li dora xwe mêze dikir, ez hişyar bûm. Ji ber di bêrîka min de dewlemendiyeke pir mezin hebû. Dikaribûn min bigirtana. Min hişk bi

wan girtibûn. Wekî din jî min lingên xwe ji bo bazdanê vekiribûn. Hema yekê bidengek nizim jî bigotana were ez ê bifiriyama. Bêderfet bû. Ti kesî nikaribû min bigirtana. Di dilê min de ev derbas dibû.

-"Ne kesek ji vî gundî, ne malbatê, ti kesî nikaribû min bigirtana. Min ê ew kevok weke min dizanibû bipijandana".

Li pêşiya gundê me darek hebû. Me ji wê darê re digot dara tawî. Dareke pir mezin bû. Dibe temenê wê sedsal be. Di germahiya havînê de, ez her tim diçûm bin siha wê darê. Sê darên tawiyê yên ku min nasdikirin hebûn. Her sê dar jî heya niha ji bo min di asta pîroziyê de ne. Ez dibin siha dareke ji wan de bûm. Germa havînê giran li me dida. Wê demê digotin teknîk tê. Ji xwe wê demê dilopeke av ji bo me mucîze bû. Av tine bû. Heta hinek wêdetir, cihekî weke şkeftekê hebû. Min navê wê jibîrkiriye. Di binê wê de dilop dilop av kom dibû. Di germahiya havînê de, di wê şkeftê de satileke av hebû. Xwe gîhandina wê wisa, baldariyeke mezin bû. Min xwe dirêjî wê avê dikir. Bi kotek û hefbela di nava zinaran re min xwe digîhand wê avê. Ew av hîn jî di bîramin de ye, wisa bîranineke zelale. Hedefek mezin bû. Dema min ew teknîk jî dît li ser pênaseya welat min ev jî zêde kir. Li hember zuhabûyîna pir mezin dikaribû çi bihatana kirin? Ma gelo av li kîjan aliyê gundê me ye? Ew av çawa dikaribû bihatana nava van zeviyan? Ez li ser vana pir dihizirîm. Teknîka ku bihata dikaribû ew av derbixistana.

Wê demê av dixistin nava ceran. Em ji palehiyê dihatin. Wisa di bin germahiya havînê de li cihê ku me xwe diavêt erdê armanca me ya herî mezin piyanek ava wî cerî vexwarin bû. Piyana ku ez qaldikim jî tişteke wisa nîv zingargirtî bû. Av jî nêvî zêdetir toz bû. Lê cardin jî bi wê piyanê vexwarina wê avê hemû cîhan dibû ya me. Piştre jî em rûdiniştin û me savar dixwar, heya niha ekla wê di bîra min de ye. Min ew savara dayika xwe gelek dieciband. Bawerim heya niha ti kesî/ê savareke wisa xweş çênekiriye. An jî wê demê ji min re ewqasî xweş dihat.

Jiyan ewqas bû, piyanek av û savarek.

Li cem me Cirn hebûn. Kesên ku serê xwe nexe van cirnan û têra xwe avê venexwe, nizane wateya tênîbûyînê çiye. Nikare zêde wate bide axa zuha, zindîkirina vê axê. Cardin di nava xwîn û xwêdanê de ger paleyî neyê kirin, kes nikare wateya wê savara bi ekil jî fam bike.

## HEVALTIYA KEDÊ

Hevaltiyên min ên ku min dev ji wan bernedidan hebûn. Li gor min ew hevalên kedê yên baş bûn. Bi hev du re nêçîrvanî kirin, çûk nêçîrkirin, bi maran re mijûlbûyîn, derketina çiyan û çeman gelek xweşbûn. Di van mijaran de meşa min gelek bi wate bû. Tişta herî zêde min jê hezdikir ev bû.

Ez wan rêyên ku min gav bigav derbas kirine, hemû kesayetên derketine pêşberî xwe bibîr tînim. Hemû bûyeran bibîr tînim. Ji malbatê heya malbatên dijberî me, ji lîstokên hevalên min ên zaroktî heya lêgerên min ên nan û heya lêgerên min ên dibistanê. Ez vana hemûyan bibîrtînim. Gelek baldare.

## HEVALTIYA RAST

Her ku dem derbas dibû mijarên min ne dipejiradin zêde dibûn. Di vê derê de pirsgirêka hêzê derdiket holê. Min nikaribû bipejirandana. Lê belê ma min wekîdin dikaribû li hemberî hêzê çi bikira? Min ê xwe çawa biparasta, ev girîng bû. Ji bo vê, divê mirov bisebir be, xwe avabike, rêbazên jiyanê baş fêrbibe, hestên dijminahiyê baş nasbike. Min di temenê xwe yê biçûk de famkir ku dijminahiya bi malbata hevalê Hesen Bîndal re ne başe. Ji bo ez vê dijminahiyê derbas bikim bi hevalê Hesen re min bidizîka hevaltî kir. Ev hevaltî ji bo min gelek biwate bû. Li hember paşverotiya feodalîzmê têkiliyeke pêşketî bû. Min zarokê wê malbata dijminê me, baş didîtin. Yên herî zêde min di aliyên xwe de dikişandin ev zarok bûn. Ev hevaltiya min derveyî têkiliyên vê sedsalê bû. Di kesayeta min de bitemamî xwesteka têkiliya hevaltiyê ya rast hebû. Ev pêşketineke pir mezin bû. Biaştiyê dagirtî

bû. Di temenê gelek biçûk de min, ew têkiliyên dijminahî yên zirar didin civaka Kurdîstanê ferqkiribû û min ew ne dipejirandin. Li gor xwe min ew dijminahî çareser dikir.

## DAYIKA MIN EZ PERWERDE DIKIRIM

Belê ez 7 an jî 10 salî bûm. Dayika min çi digot min? Hûn di zanin dayik di mal de xanim axa ne. Ji bo zarokên 7 salî digot.

-"Tê wisa şer bikî".

Ji xwe min weke wê nekir. Çima min nekir? Ez dahf didam û digot;

-"Biçe li wan bide."

Carekê du caran wisa bi ser min de hat. Digot;

-"Tu bênamûs î, nikarî şer bikî".

Lê ez zarokekî biaqilbûm. Heke min weke dayika xwe kiribûna, wê zarokan jî li min bidana. Ji xwe li min didan. Ez jî dihatim cem dayika xwe û min gazincên xwe dikirin. Ez digiriyam û min digot;

-"Ev dera min şkestiye, ev dera min êşiya ye".

Piştre min mêzekir wisa nabe. Min jî xwe amade kir.

Pîrka min jî digot;

-"Hestên namûs ê yên vî zarokî bixeterin".

Min berî niha jî gotibû. Malbata hevalê Hesen Bîndal dijminê malbata me bûn. Ji ber ku ez jî zarokekî gelek cûda bûm, min xwest bi Hesen re hevaltiyeke bidizî pêşbixim. Dayika min carkê dît. Got;

-"Way ev zarok bênamûs e. Bi zarokê neyarê me re têkiliyên wî hene." Têkiliyeke pir veşartîbû. Piştre me ew dijminahî derbas kir.

Ma çima min ew têkiliya veşartî girte dest? Ji bo têkiliyên yekîtiyê min tekoşîn dikir. Hîn di heft saliya xwe de min ew rêgeza feodalî ya neyartîyê nedipejirand. Heke di wê demê de ev helwesta min pêş neketana, min ê nikaribûna ewqas eşîr, qebîle, mirovên cûrbecûr li gel hev kom bikirana.

Deriyekî me hebû, hîn li ber çavên min e. Ti derekî wî derî sexlem nemabû, ji ber şerê min û dayika min. Deka vê çareser bikin! Kesên dihatin li deriyê me mêze dikirin dikeniyan û digotin;

- “Ev çi deriye”?

Ew aliyên min jî hebûn. Balê bidinê ango hûn min çawa nas dikin bila nasbikin, kes bi min nikare.

Di temenê min ê piçûk de dayika min hêviyên xwe di kesayeta min de nedidît. Min jî hêviyên xwe di kesayeta dayika xwe de nedîtin. Nêzîkatiyeke me ya pir demdirêj ji hev dure çênebû. Her çiqas jiyana me ya bi hevûdu re kin jî bû, pir dijwar derbas bû. Wê li gor xwe ez nasdikirim. Min jî li gor xwe dixwest wate bidimê.

Ez zarok bûm. Min dixwest zarokan jî bi aliyê xwe ve bikişînim. Netenê ji bo kombûyînê, ji bo wan bandor bikim, min ev dikir. Ji bo hinekî fêrbûyîna A-B-C bû. Rêxistinên min ên yekem hinek binêçîrvaniya derûdor, bikomkirina nêrgizên mêrgan, bi komkirina hinek fêkiyên bax û bostanan ve hat destpêkirin. Hemû tiştên min berhevdikirin, yek bi yek li ser hevalên xwe belav dikir. Ango dema zarokek dihat derûdora min dizanibû bi min re tiştek heye. Belê min xwe dikir çavkaniya dewlemendiyan. Min cara yekem komên zarokan ên gund wisa avakirin.

Ez zarokekî biçûk bûm. Me şer kiribû. Yekî serê min şkandibû. Ji xwe dayika min gelek bi ser min de dihat. Digot;

-“Na tu yê neyî mal”.

Dayika min waneya yekem dida min. Piştî min tola xwe bigirtana, wê ez ê derbasî malê kiribûma. Bi wê halê xwe yê dayik qet dilê wê bi min nedişewitî. Ne digot;

- “Ev kurê min e. Ma hêza wî heye, an tine ye? Ma ev zarok tirsoneke an na? Ma destê wî dikare rabe an nikare?”

Ev pirs qet ne li xema wê bûn. Ez nabêjim sedî sed, lê belê li ser kesayeta min gelek bibandor bû.

Di zaroktiya xwe de, di hinek mijaran de, ez gelek jîr bûm. Gelek kesan digotin;

-“Xwedê zarokên kesî neke weke Ebdullah!”

Demeke dirêj ji bo min wisa digotin. Navê bavê min Omer bû. Digotin Omerê şewitî. Ji xwe bavê min bi rastî jî zilamekî pir sosret bû. Zilamê gund ê pir hejar bû. Ma kê ew nas dikir? Gelek belengaz bû. Lê pir sosrete. Zêde misilman bû. Bi ola xwe ve girêdayî bû. Dikarim bibêjim ku xwedî rêgez bû. Divê mafê zilam neyê înkar kirin. Tevî hemû lewaziyên wî, dikarim bibêjim ji bo hinek nirxên xwe yên manewî jiyan dikir.

Ango heke ez bibêjim;

-“Bavê min, qet li ser min bandor nekir, wê bibe nankorî”.

Ji hinek aliyan ve bimisogerî ez bandor kirim e. Bi rêgezan ve girêdayî bû, lê gelek bêhêz bû. Dizanibû ku bêhêz e.

## ŞERÊ JI BO NANÊ SÊLÊ

Ji bo nanekî sêlê min şerekî çawa dikir hîn di bîra min de ye. Piştî nanê cehî, nanê genim derketibû. Nanekî genimî girtin ji bo min lêgerek bû. Armanceke mezin bû. Ji bo wê min şervaniyeke mezin dikir. Armanc jî dayika min bû. Diviya bû min ji destê wê nan bigirtana an jî ji cihê ku vedişart derbixistana. Ev mafê min bû an jî ne mafê min bû, ev pirsgirêkeke dine. Lê min tekoşîna wê dikir. Dema min çalekiya xwe biser nedixist, ez derdiketim çiyan.

## DIBISTANA MIN A YEKEMÎN

Wisa tê famkirin ku dayika min dibistana min a hîndekariya yekemîne. Ev jin kesa di gund de, ya herî şerker û serhildêr bû. Heya niha tê bîra min û ez dikevim bin rûyê erdê. Min digot;

-“Xwezka dayikeke min wisa serhildêr nebûna”.

Min her tim ji bo xwe ev digot:

-“Di nava gund de ev jin çawa şerm nake û serî radike?”.

Bi halê xwe yê zaroktî ve, ez li ser van dihizirîm û ez baş dizanim ku min tektîkê xwe yê jiyanê yê mezin ji dayika xwe digirt. Li gel wê serhildêriya dayika min, di heman demê de lewaziyên wê jî hebûn. Min ev didît. Ji ber ku ewqasî qîr dikir, lê encameke erênî nedigirt. Min di xwest ez bidayika xwe bawer bikim, lê belê tiştek ji destê wê ne dihat. Bavê min jî wisa bû. Derdiket serê ban û çavê xwe digirt, devê xwe vedikir. Çalekiya wî ya herî mezin ev bû. Ne diyarbû ku çi digot. Li hemberî dijminê xwe çalekiya xwe ya herî mezin wisa pêş dixist. Di temenê biçûk de ev tevger hemû ji bo min vala dihatin. Wan xwe bêwate dikirin. Min hemû jiyan û çalekiyên xwe berovajî wana amade dikir. Ev rastiya Dê, Bav û Malbatê bû cihê perwerdehiya min a mezin. Piştre min tu carî rêya xwe şaş nekir. Rewşa bavê min a xerab hişt ku ez bibim pêşeng.

Di nava malbatê de, ez gelek bişens bûm. Ji taybetmendiyên malbatê jî dihat. Malbateke zêde nehatibû rêkûpêk kirin. Bav zêde nikaribû rêgezên xwe bida rûniştandin. Dayik weke dixwest nikaribû serwer bibûna. Xwîşk û birayên zêde nepêşketî hiştibû ku ez zû bi xwe bihesim û tevgera xwe bi xwe ava bikim. Pêşengtiya di nava malbatê de bi vê şêwaza dijwar min da meşandin. Di nava wê de bi hezaran bûyer hebûn. Bihezaran şer hebûn. Heta ji şerê me û Tirkiye ya niha jî zêdetir tundî hebû. Min wê demê ev da meşandin. Di wê demê de gelek gotinên ku dayika min ji min re digot, di wateya rûpelên Quranê de ne. şêwazê min ê xebatê didît. digot: “Ehmeq ma qey tu kes weke te dixebite?”. Wê dizanibû ez cûda me.

Di encama ketinên mezin de, girî layiqê xwe nabînim. Tiştên biçûk layiqê xwe nabînim. Her tim helwesta min ev e. Bavê min gotibû;

-“Heke ez bimirim, tu rondikên xwe nabarînî”. Ji ber wî dizanî ez li hemberî çi derdikevim. Ji bo tiştên biçûk û erzan ez rondikan nabarînim. Lê di aliyê din de dinya alem dizane ku ez çiqasî hestiyarim. Aliyê min ê hezkirinê, hestiyariyê, ji yê zanebûnê bihêztir e. Lê beramberî van ez xwe zane jî dikim. Ez ji nêz ve di xeta zanistê de

dimeşim. Ez şervanekî hestiyariyan ê mezin im. Ji ber ku şoreş di hestan de destpêdike. Di kesayeta min de tekoşîna hestan biawayeke bihêz destpêkir. Biqasî min kirêtiyên jiyanê û civakî nepejirandin, xweşikbûn jî afirandin. Li gor xwe min xeteke xweşikiyê ava kir û ew xeta xwe pêş xist. Di demên destpêkê de siyaset, zanist tine bû, tenê hest hebûn. Min ew jî pir baş pêşxistibûn.

## XWESTINA XWÎŞKA MIN

Ji bo xwîşka min rêya du rojan hatibûn. Xwîşka min ew qet nedîtibûn. Gotin "Em dixwazin". Çend telîs genim, çend qurûş dirav dan û keçik birin. Ez heya niha vê têkiliyê baş nabînim. Min tu carî baş nedît. Ma têkiliyeke wisa dibe? Zilam rêya çend rojan hatiye. Weke mezinê feodalan, weke xizmetkarê axayan, hat xwîşka min bir û çû. Ma çiqas heyf û mixabin bû. Di wê demê de jî cardin hêza min têrê nedikir ku ez pêşiya wan bigirim. Çû.

Cardin tê bîra min, di wê demê de keçeke biçûk û paqij bi zorê dabûn malekê. Wisa bi awayeke dijwar, bilêdan û heqaretan dabûn. Keçikê li hember zilam serî neditewand. Reviya. Tê bîra min, wê demê nedikaribû bixwenda û binivîsandana. Cara yekem hatibû ber serê min sekinî bû. Ji min re digot;

-"Ma tê xwendin û nivîsandinê fêrî min jî bikî?". Wisa dihat li rêzên nivîsê mêze dikir.

Heya niha di bîra min de ye. Lê belê min yek-du hevok nîşanî da yê. Wekî din hêza min tine bû.

Ez îro tola van bêhêziyan hemûyan radikim. Ez hîn li pey tolhildana wê demê me. Ev asteke civakî bû. Min digot, şûna wê wisa be, bila qet tine be. Îro di nava civaka ku min rêxistin kiriye de, ne asteke civakî a wisa heye; ne jî jineke wisa heye. Jin jî ne weke berê ye. Zilam jî ne weke berê ye. Êdî ne jina berê ne jî zilamê berê, di nava vê civaka min rêxistinkirî de tine ye. Jiber ku ew jin û zilamtî bi xwe ketinên herî

jin wenda dike. Wê wenda jî bike. Ew têkiliyên civakî, bi wê jinê re didin wendakirin. Ji xwe li gor min, jina ku van bendan pêk bîne dikare hebe. Jineke ku biawayeke şaş bi zilamekî ve hatibe girêdan, li gor min wê jinê wenda kiriye. Li gor min jineke ku bi zilam re jiyana şaş dimeşîne, li gor pîvanên azadiyê xwe birêxistin nekiriye, xwe bihêz nekiriye, wê jinê wenda kiriye. An jî ew jin hatiye tinekirin.

Weke kes ez bihêsanî heznakim. An jî mafê hezkirinê ji bo xwe nabînim. Mînak pir kesên ku ev yek maf nekirine, xwe mafdar nîşan didin. Weke ku hinek kes dibêjin, ez ne evîndarê gelê Kurd im. Li hemberî van kirêtiyên jiyana gelê Kurd, ez di nava êrîşeke mezin de me. Lê ev jî weke evîniyê dikare were dîtin. Lê ne di wateya evîniya her kesî de ye. Ez di evîniya xwe de çavreş im. Ji bo lewazî, kêmasî, nebesî, bêmafî ji holê rabin, ez dikevim nava tekoşîn, şer û pevçûneke mezin. Dema ku nemafê min be, nikarim ji kesî re bibêjim tu çawa yî? An jî bibêjim merheba. Wê hêzê bi xwe re nabînim. Ev pir girîng e. Hezkirinê deynin aliyekê, ez nikarim di ber vê hezkirinê re derbas bibim. Dibêjim mafê min ji bo vê tine ye. Lê piştî keda wê didim diyarkirin, hewildidim dibêjim êdî dikarim hez ji vî gelî bikim. Ev bi çi hat destxistin? Bi kedê, bişerê kedê yê biwate hate destxistin. Em carna di rex keçikan re, di rex xortan re derbas dibûn. Min ew famkirinên heskirinê dişiband heskirina qirdikê. Ya li ser civakê bibandor, ev şêwazê hezkirinê bû. Min lanet li wê hezkirinê anî, ez jê tirsiyam, paşde kişiyam. Ji wê reviyam.

Hevalên me yên zarokatiyê hebûn. Keçik jî hebûn. Min ne dikarî navê wan jî bigotana. Di nava gund de min ev nikaribû. Ji xwe her tim hinekan keçik digirtin û direvandin. Min ev bitirsnakî pêşwazî dikir. Ma zilamek çawa dikare biwêrekî keçekê birevîne û biçe. Heta dihatin keçik dixwestin. Min digot:

-“Ma çawa dikarin biwêrin keçekê bixwazin?”

Di vê mijarê de qet wêrekiya min tine bû. Bi rastî jî keçik revandin ji bo min, bûyereke pir mezin bû. Bûyereke ku min ti carî nikaribû

bikirana. Keçik xwestin jî di heman wateyê de, ji bo min pir zehmet dihat.

Di van mijaran de hinek ceribandinên dayika min çêbûn. Agahiya min tine bû. Min gotibû na. Ma wan çawa dikaribû binavê min keç bixwestana. Ne wisa keç xwestineke binav û deng bû. Me bihîst, wisa ji dur ve me bihîst. Piştre tu carî behsa wê nehate kirin. Ji ber ev mijar di nava Kurdîstanê de bi gelek pirsgirêkên bingehîn re têkildar e. Min didît hatine xwîşkên min xwestin e. Çend bizin, çend ker didan û xwîşkên min dibirin. Min wê demê ev rewş bihêrs pêşwazî kir. Ne rewşeke wisa xwezayî bû. Min her tim dixwest ez ji wê malbata lewaz, Kurdîniya lewaz, ji wê zoriyê dur bikevim.

Pejirandina zilamê Kurd ê ji rêzê gelekî bixeter e. Min ev pirs ji keçan pirsî.

- “Ma hûn çawa zilamekî wisa dipejirî nin? Heke min bi zincîran ve girêbidin jî ez xeteriyeke wisa napejirînim. Li gund jinek dabûn zilamekî. Min bi wî halê xwe yê zarok ev bihîstibû”. Digotin;

-“Ji bo ew jin her tim li mal bimîne, ew bi dara malê ve girêdabûn. Cardin digotin, tevî vê girêdanê jî wê jinê ev bend qetandine û reviya ye”. Min gelek bala xwe dayê û ji xwe re ev pirs dipirsîn!

-“Ma gelo çima reviya bû?”

Lê tevî vê jî biawayeke pir qirêj hemû jin tên girêdan. Di roja me de jî tên girêdan. Ma min ê ev malbat çawa bipejirandana?

## ÇALEKIYA FISTEQAN

Cardin rojekê ez çûm nava dehlên fistiqan. Xwediyê vê dehlê ji dur ve mirovê me bû. Min bidizîka fisteq kom dikirin. Zilam hat ez dîtim û gîhaşte min. Şemaqek li min da, hîn di bîramin de ye. Lê min wê demê jê re got:

-“Ka tu bisekine, ez ê di dema pêş de çi ji te bikim”.

Wisa li hember bûyera zorê û zextê nêzîkatiyên min ên tolhildanê pêşdiketin, ez gelek li ser dihizirîm.

## PÊŞENGTIYA BAVÊ MIN

Bav ji bo zarokên xwe pêşengin. Bavê min jî ji bo min wisa bû. Lê belê nikaribû bida meşandin. Di temenê biçûk de, destavêtina pêşengtiyê, ji ber neçariya bavê min bû. Min wê demê ev digot;

-"Xweska bavê min jî weke bavê her kesî bûna. Pêşengî ji me re bikirana. Ev valatî dagirtana".

Di rastiya xwe de baş bû ku baveke min ê wisa hebû. Heke newisa bûna, hîn di wî temenê xwe yê zarokatî de, ez nediketim lêgera pêşengtiyê. Min digot;

-"Ev bav nikare me rêvebibe, di rewşeke pir zor de ye. Pir belengaz e".

Birastî yê ku di nava hemû gundî de, bierka pêşengiyê radibû, ez bûm. Min waneyên xwe yên pêşengtiyê cara yekem di van deman de girtin.

Şêwazê şerê bavê min hebû. Şerekî bêwate û li hewa bû. Bi mirovekî re şer dikir. Di nava şer de ew kes çûbû ser serê bavê min. Lê bavê min biser xwîşka min de qîrdikir digot;

-"Wê kêrê bîne, ez ê wî bikujim".

Di bin wî kesî de,  wisa digot. Heke xwîşka min kêr bianiya jî bavê min nikaribû bidestan bigirtana. Ji ber destên wî hatibûn girtin. Rewşa binkeftî ya şer jiyan dikir. Ji min re digot;

-"Kêrê bîne Abdullah".

Belê dibe ku navê min jî gotibe. Min ji vê nêzîkatiyê gelek şerm kir û min ji xwe re got, ez ê ti carî wisa şer nekim. Ger çiqasî serkeftinên min yên pir mezin nebin jî ez neketim nava şerekî ku hêza min têrê neke.

## NASKIRINA BAJÊR

Dema cara yekem ez ber bi Bîrecîkê ve diçûm, min bidawa bavê xwe girtibû. Min her tişt bitirs didît. Min ji bo her tiştî dipirsî. Şerê min ê yekem car li hemberî bajêr dema cara yekem ez bi bavê xwe re ketim nava bajêr destpêkir. Weke ku bajêr çiyayekî mezin bû, bi ser min de dihat. Meşa li ser wan cadeyên bajarê Bîrecîkê, ji bo min weke meşa li hemberî dijminê hov bû. Wê demê ez wisa pêdihesiyam. Di wan kolanan de ez bi bavê xwe re digeriyam. Wê demê bavê min ji bo min hêzeke mezin bû.

Bavê min nekesekî xerab bû. Hêviyên wî yên mezin ji bo min hebûn. Bi min bawer dikir. Herî zêde min dilê wî bihêvî kiribû. Lê tevî vê, cardin min carnan li hemberî wî sehildêrî pêşdixistin. Ango min mînakên zarokê nebaş ê malbatê pêşkêş dikir. Bavê min bi rastî jî gelek hêvî ji min dikirin.

Carkê di bin sîha darê de dema rûniştiye ji kesên derdora xwe re gotibû;

-“Destê xwe nedin wî. Li ser eniya wî serkeftin nivisiye”.

Bawerim li jiyana min û hinek xebatên min ên hilberînê mêze kiribû û ev nirxandin kiribû. Ez zêde bi karan re mijûl nedibûm. Lê dema min karek dikir, bi rastî jî min baş û biencam dikir. Dibe ku herî zêde ev aliyê min ew bandor kiribe. Digot;

-“Tu biçî kuderê, tê biserbikevî. Li ser eniya te nîşaneya fetihkirinê heye”.

Ez pir hişyarbûm û bi rastî jî zarokekî biaqil bûm. Min bala xwe dida mirovan. Zanebûna mirovan ji bo min gelek girîng bû. Bi pileya xwe ya zanistî ve, bavê min hinek pîvan ji min re, wiha digot;

-“Pelekî kaxizê bixe bin balgeha xwe. Heke tu ferq bikî ku balgeha te bilind bûye, tu yê bizanibî ku tu zanistekî başî”.

Min ev axaftin ji bîr nekir. Ma pelekî kaxeza cixarê çiye? Heke mirov ev ferq kir, asta zanebûna mirov diyar dibe. Lê di roja me de,

hinek kes hene, dibin balgeha wan de ne pelê kaxezê qurmê daran bêkevinê pênahesin.

Di demên berê de zêde hêza min jî tine bû. Bavê min wê demê jî digot;

-"Tu kesê ku te guhdar bike tine ye".

Di vê wateyê de, heman neguhdarkirin berdewam dike. Belê di aliyekê de, di roja me de jî ev raste. Ez tenê me. Lê belê ez ji bavê xwe jî bihêztir im. Ew zilamê ku ev digot lewaz bû. Li gor min heya niha min ji vê leza xwe tiştek wenda nekiriye. Cardin yê ji hemûyan bihêztir ez im. Li gor bav û mezinan jî ez im.

Di gotin;

-"Xwedê kurê kesî neke weke wî".

## FELSEFEYA GUNDIYAN

Jiyana hemû gundiyan bi şer û pevçûnan ve derbas dibe. Lê belê di vî şêwazê jiyana şêniyên gund de serkeftin tine ye. Ev rewş li dijî şerê gelerî yê serkeftinê ye. Ji ber van sedeman pirsgirêkên hindirîn wan dixwin.

Di aliyê din de, gel ji bo tiştên herî biçûk şukur ji rebê xwe re dikin. Ev lewazbûneke din e. Ango ji bo xwe weke çarenûs dibînin. Di encama vî şerê kor de têgihîna çarenûsê derdikeve holê. Min ev jî dît, encamên wê fam kir û min xwest vê nêzîkatiyê derbas bikim.

Min di xwest ez nêzîkatiyên herî kêm, lewaz û kirêt ên gund têbigihim. Ji ber şêniyên gund li gor wan tevdigeriyan. Mînak; gundiyan, zarokên xwe ji zarokên paşayên herî payebilind, binirxtir didîtin. Lê min dizanibû ku ew zarok di nexweşikiyê de nimûneyek bû. Lê belê digotin;

-"Ka mêze bikin, çiqas xweşik e, çiqas delala cîhanê ye, çiqas xweşik e ku kes nikare dev jê berde".

Malbat hatibûn neçar hiştin. Tevî ev zarok gelek ji rêzê jî bûn, cardin wisa nêzîkî wan dibûn. Ji ber wekî din hêza wan a çareseriyê tinebû.

Ev bixwe bîrdoziyeke. Di rastiya xwe de gel ewqasî neçar û xizan hatiye hiştin ku ji bo wan hebûn dihat vê wateyê. Çend kulm an jî bûstek xaka wan heye. Yek- du bizinên wan hene. Kerekî wan heye. Yek-du kûçikên wan hene. Yek-du zarokên wan ên xwar û maro hene. Wan, ji welat, ji xweda, ji hemû nirxên din mezintir dibînin. Çavên wan wekî din ti tiştên din nabînin. Di nava Kurdan de wateya malbatê wiha hatiye têgihiştin.

**DENGÊ DEMANCÊ**

Cara yekem li pişta mizgefta gundê me dengê demancê hatibû. Min got:

-"Ma ev çi denge, balkêşbû. Dema mirov ji bo kuştinê hatin beramberî hevû du, min digot, ma ev çi dînatî ye. Ma mirov çawa dikarin wisa werin beramberî hevû du".

Min demeke dirêj wate ne dida van hewildanan. Ez matmayî kiribûm. Cara yekem li gundê me guleyek hatibû avêtin. An jî cara yekem min ev deng bihîstibû. Min digot;

-"Gelo ev ji bo çi wisa dikin? Di rastiyê de min li wir, ev tevger derveyî aqilan dît. Min digot pirsgirêk û nakokiyên di nava gundiyan de, divê wisa neyên çareser kirin".

Bigumaneke mezin, ez wisa dihizirîm. Ev nêzîkatiya min pir baş e. Dihizirim û dibêjim ti wateya vî şerê gundîtî tineye. Heta xeteriya vê dibînim û matmayî dibim. Ev şêwazê şer ti carî ji bo min biwate nehat. Hemû nakokî û pirsgirêkên ku min ber bi vî şerî ve bibe, min dixwest birêya hevaltiyê çareser bikim.

Belê li gor min mirov dikare bi keviran re jî şer bike. Lê belê di nava gundekî de şerê biçekan nabe. Ev, xaleke pir girîng e. Hem em wiha

heya dawiyê serhildêriyê dikin, hem jî tê şerê bidemancê xerîb bibînî. Dema zilam li pişta camiyê çek teqand min got;

-"Ev dînatiye, ma çawa dikare di nava gund de wê çekê biteqîne? Çareserî wisa çênabe".

Ev nirxandina min heya niha jî wiha ye. Ji ber ku divê nakokî tenê biçekan neyên çareserkirin. Hûn bala xwe bidinê, di wê demê de dixwazim şoreşê bidim çêkirin. Di wî şerî de sedî sed dizanim ku çek ne amura çareseriyê ye. Ez vê hizira xwe, heya niha jî diparêzim. Di nava gundeke wisa de divê çek nekevin rojevê.

Du hevalên min hebûn. Her du jî hîn di bîra min de ne. Min rojekê bihîst ku yekî kêr li yê din daye û ew kuştiye. Ez heya niha wî şerî û wê bûyera kuştinê jibîr nakim. Ji bo min gelek biêşbû. Ew bûyera kuştinê divê li gund nebûna. Di nava gund de çek teqandin û mirov kuştin şaş bû. Divê her du bûyer jî nehatana jiyan kirin.

Ev her du bûyer demeke dirêj bandor kirin, heya niha jî min ji bîr nekiriye.

Binazikiyeke mezin bi têkoşînê re girêdana min heye. Ev têkoşîn bipîvanên erênî dikare were berdewamkirin. Heke ev pîvan nebin, wê berê vê têkoşînê biçe di aliyên nebaş de û kes nikare pêşiya wê bigire. Mînak; di navbera şerê min û şerê gundîtiyê de hinek cûdahî hene. Her kes di nava gund de dikare şerekî bêpîvan bide. Ji xwe şerekî wisa hat dayîn. Yek kes hat kuştin, yek jî hat girtin. Her du jî hevtemenê min bûn. Kuştina mirovan wêrekiyeke pir mezin dixwaze. Bikaranîna çekan jî kareke awerteye. Lê cardin li hemberî wan kesan min rik girtiye. Di wê demê de her du hevalên min di encama şerê xwe de, jiyana xwe jidestdan. Min bi rêbazê xwe ev şerê ku dide wendakirin guherand. Min ev şerê gundîtî veguherand pêşketinên mezin û derbasî Kurdîstanê kir. Ev cudabûyîneke pir mezin e.

Hîn di heft saliya xwe de, min ev lîstoka civakî ya kevneşop xerabdikir. Di vir de ez çawa nêzîk dibim, divê baş were têgihiştin. Hîn

dema ez di nava şêniyên gund de bûm, min cewaziya xwe nîşanî civakê dikir.

## PALEYIYA DI ZEVIYAN DE

Di nava zeviyan de, xebatkirin girîng bû. Di zeviyan de, ez xebitîm. Paleyî ji bo me barekî gelek giran bû. Min digot, paleyî pêwîst e, ji bo wê min paleyî dikir. Lê beramberî vê min digot, mirov di hemû jiyana xwe de, nikare palehiyê bike. Dema ez çûbûm Cûkûrovayê, carek du caran çûbûm komkirina pembû. Min li wê derê jî jiyana xwe di nava xwîn û xwêdanê de derbas kir. Li wê derê ez gîhaştim encamên mezin. Ez têgihiştim ked çî ye, jiyan bikedê çawa tê avakirin? Lê cardin min digot, divê jiyana mirovan hemû bi vî karî ve neyê derbas kirin.

Min bi birayên xwe re jî şer dikir. Lê belê cardin birayên min bûn. Di hemû tevgerên wan de nexweşikî hebe jî cardin ew birayên min bûn. Em derdiketin paleyî yê. Min heya pileya dawiyê dixwest, em wekhevbin. Min digot;

-"Hûnê bixebitin".

Xwîşkek min hebû. Min gelek dixwest ew jî bixebite. Dibe ku wê demê zehmetî didît. Gelo min dixwest ez a xwe biserbixim? Dibe ku ji bo bixebitin bibandorbibim. Wê xwîşka min jî digot;

-"Belê hêza te tenê têra min dike".

Min dixwest di nava malbatê de, bihêzbim. Min ev jî diceriband, lê di aliyê erênî de diceriband.

Xeteriyeke wisa hebû ku birayê min di malê de bêked be. Ji xwe di encam de wisa jî bû. Di wê demê de ez hinekî bi ser de diçûm. Mafdariya min, di van salên dawiyê de derket holê. Wî zilamî nikaribû bitena xwe li kerê jî siwar bibe. Me du birayan bilingên wî digirtin û ew davêt ser pişta kerê. Me wisa ew dibir bajêr. Pir hêsan nexweş diket û xwe radestî berdestan dikir. Ji xwe min ev nêzîkatiyên wî nedipejirandin û min bi wî re şerekî mezin kir.

Min carna lîstok jî dilîstin. Lîstoka yek lingî, lîstoka aşik avêtinê, carna jî hinek gulaş bû. Min dixwest bi keçikan re jî lîstokan bilîzim. Heta min pir dixwest ez bi keçikekê re bilîzim. Ew keçik di demek pir zûde bibû bûk. Lê min nedizanî û piştî bibû bûk jî min jê re gotibû;

-"Ka were em bilîzin".

Ev bîranîn nayê bîra min, wê keçikê bixwe gotibû.

Bi keçikên gund re lîstokên min, weke ku min dixwest biencam nedibûn. Ji bo vê ez hêrs dibûm. Heke ev hêrs nebûna, min di lîstoka xwe ya azadiyê de cihê keçikan çênedikir. Ew nedikişandin nava lîstoka şerê azadiyê. Divê kes, li hemberî van rastiyan gelek bi pîvan be.

## DIVÊ MIROV ÎXANETÊ LI XEYALÊN XWE YÊN ZAROKATIYÊ NEKE

Nakokiyên mezinan di vê derbarê de hene. Di serî de îxanetê li xeyalên xwe yên zarokatiyê dikin. Lê min nedixwest ez îxanet bikim. Azadî wisa dest pêdike. Bêrîkirinên zarokatî, bêrîkirinên pîroz in. Bêrîkirinên aştiyane ne. Bi wan re girêdayî mayîn têkiliyeke rast dixwaze.

## MA GELO EV MAMOSTE ŞÊR IN AN PILIN

Mînak: Daristaneke biçûk ya darên fistik û zeytûnan hebû. Di wê demê de çûyîna me ya dibistanê di rojevê de bû. Ango rewşeke wisa hebû, dihat gotin ku em ê biçin dibistanê. Ber bi zivistanê ve em çûn dibistanê. Tam di wê demê de min destê xwe danî ser wê dara zeytûnê û ez ji xwe re dihizirîm. Min digot:

-"Ma gelo ev mamoste Şêr in an Piling in. Gelo dikarin çi bi min bikin".

Ez wisa ji xwe re dihizirim. Wê demê min rastiya mamosteyan wisa dizanî. Ma dikarin çi bi min bikin? Kîne ev? Hîn ez ne çûbûm dibistanê. Min tiştek nedizanî. Bi taybet jî min hîn zimanê tirkî nedizanî. Lê ez li ser van pirsan dihizirîm.

Li gel min hestên welatparêzî bihêz in. Ez dizanim çawa nêzî xweşikbûyîna xwezayê bibim. Biqasî vê zanebûnê bihêsanî jî jibîr nakim. Ez ti carî li mayîna wan xakan, xirbeyan, gundan aciz nebûm. Lê gundiyên me yên wê demê her tim direviyan. Ji xwe ti carî min ew reva wan nepejirand. Ez gelek hêrs dibûm, dema ev kes diketin nava jiyaneke hêsan. Ez dihizirîm ku ev tevger bi me didin wendakirin.

## NAV Û PAŞNAVÊ MIN

Dema mirov dest bidibistanê dike cara yekem nav û paşnavê mirov didin fêrkirin. Ez rabibûm ber texte. Mamoste ez rakiribûm û digot binivîse. Navê xwe û paşnavê xwe binivîse. Ew dem ji bo min ezmûneke pir mezin bû. Hîn di bîramin de ye. Min tîpên navê xwe di mejiya xwe de nexişandibû. Ji xwe nav û paşnavê min dirêj bû. Lê min hemû rast rêz kirin. Dema min qedand bawer dikim ku pileyeke pir baş girt. Bi vê ezmûna jiyanê ya mezin û encama baş a serkeftî cardin vegeriyam ser mêza xwe û rûniştim.

Rojên yekem ên destpêkirina dibistanê bûn. Pir zorbûn. Zehmetiyên ziman hebûn. Zehmetiyên jiberkirinê hebûn. Ji xwe di malbatê de min rehetiyeke jidil (cidî) nedîtibû. Nava gund bizehmetiyan dagirtî bû. Zehmetiyên dibistanê jî li ser zêde dibûn. Ango ez ji baranê direviyam diçûm ber teyrokê.

Derfetên we yên jiyanê hêsanin. Malbateke we ya li ser zarokên xwe bibandor heye. Dikare amadekariyên we yên dema dibistanê bike. Herî kêm dikare we biawayeke rêkûpêk rêbike dibistanê. Ji xwe ji bo van malbatan zarok ewlehiya jiyanê ne. Lê belê ti ewlehiya min a jiyanê tine bû. Dibe ku vê rewş sûd dabe min. Di wî temenê zarokatiyê de, hemû ewlehiya min ez bixwe bûm. Heke min wê demê pişta xwe bidana xalekî bihêz, bavekî bihêz, gumaneke mezin ez ê di xeta serokatiyê de pêşneketama. Ji vê tinebûnê, gavên yekem ên min di wateya serokatî de pêşdiketin.

## MAMOSTEYÊ YEKEM

Dibe ku mamoste gelek hişyarbin. Tiştek ji bîra wan neçe. Navê Mamosteyê min ê yekem hîn di bîramin de ye. Ji Çorûmê bû. Navê wî Mehmet Meydankaş bû. Bawerim min hinek hêk û mast jê re biribû. Netenê ji bo vê, di wan rojan de, min bala wî mamosteyî gelek kişandibû. Ez vexwendibûm mala xwe. Wisa min bi wî re xwarinek xwaribû. Ji bo min ew sofreyeke biwate bû. Ez birûmetdar kiribûm. Rûmetdar bibûm. Êdî ez bibûm xwendevanê wî mamosteyî yê ber çavan. Min ew rêzdarî her tim parast. Ji roja ku min xwe naskir, heya dawiyê ango heya niha her tim birêzdarî ez nêzî rastiya mamostetî bûm. Ti carî bêrêz nebûm. Ne jî ser xwe çûm. Her tim min dixwest bibim xwendevanekî biaqil. Dikarim bibêjim ev nêzîkatiya, min di wê demê de destpêkir. Mamostetî, xwendekarî, melatî, paleyî di wan salan de wisa destpêkir.

Çima kesayeta min zû bin nakeve? Di rêxistinkirin û amadekirina lîstokên zarokatiyê de û di şerê wê demê de, di demên destpêkirina dibistanê de, ez bin nediketim. Heya dibistana zankoyê, ez xwendevanekî pir başbûm. Gelek ji wan mamosteyên min, hîn jiyan dikin. Ji bo min pesnên wan, nêzîkatiyên wan ên taybet hebûn. Xwendevanên din, di nava hesûdiyê de dihiştin. Xwendevan di bin bandora min de dihiştin. Rêbertiyeke min a xwezayî hebû. Di dibistanê de, di fêrbûyîna A-B-C ê de, ez pir jidilbûm, rêzdarbûm, min girîngî nîşan dida.

Di dibistana seretayî de melayekî başbûm. Min xwe dayîbû mijarên olî. Heya asta melayê gund ez pêşketibûm. Min gelek nimêj dikir, ji xwe ez gelek hizirîbûm.

**MELATIYA MIN**

Komeke me ya biçûk a xwendekaran hebû. Hejmara wan dora deh kesan bûn. Ez dixebitim, wan bibim dibistanê. Dikarim bibêjim min ew pir baş perwerde kiribûn. Heta min bihemûyan nimêj dabû kirin. Em diçûn dibistanê. Di rê de BÎRÊN AVÊ (saylak) hebûn. Avên baranê di wan de komdibûn. Hemûyan bi wê avê destmêj digirtin, min melatiya wan dikir, li pey min rêz dibûn û nimêj dikirin. Min xwe bixwe jî dikir. Ew dem demekî rêxistinbûyînê ya girîng bû. Ma ne wisa ye? Min bixwe melatiya xwe dikir. Ango li gor gund ez kesekî bi olê xwe ve girêdayîbûm. Di temenê biçûk de bibûm mela. Ev erkekî ku zarokek zû bizû nikaribû bigirtana.

Min dixwest ev koma me ya dibistanê ji dibistanê hez bikin. Min A-B-C fêrî wan dikir. Bêyî ku ez tiştekî ji wan bixwazim an jî li bendî tiştekî bim min ev dikir. Dibe ku dayika min ji bo vê tevgera min digot tu ehmeqiya dikî. Digot;

-“Ma tu wisa dixebitî, ka yek kes jiwan weke te dike?”.

Ez tewanbar dikirim. Li gor kesayeta xwe dayika min mafdar bû. Digot;

-“Tu kes weke te naxebite”.

Dema ez diketim nava van karan, an jî diketim nava karên ku wê fam nedikir ji min re ev digot. Di aliyekê de hemû rastbû. Ez li gor xweseriya xwe dixebitîm. Heya niha jî wisa me. Kesek weke min tuneye. Jiyana şoreşgerî hinekî jî weke min dikare were biserxistin. Dayika min bi ser min de dihat. Digot;

-“Bêyî ku tu tiştekî bixwazî çima 10 – 15 zarokan perwerde dikî?”.

Min ew zarok dikirin xwedî dibistan û dikirin zilam. Dayika min wisa dinirxand. Digot:

-“Ma tu kes weke te dike?”

Ev jî rast bû. Birastî jî tu kesî weke min nedikir. Di wê demê de taybetmendiyeke min a ku xwe dabû der, perwerdekirina hevalên min bû. Di aliyê din de, jixwe ez zarokeke ku derveyî daxwaza xwe mezin

bûbûm. Ez êdî hêdî hêdî ber bi xortaniyê ve diçûm. Di wê demê de ev ferq kirin. Gotin;

-“Ev zarok nabe kesekî asayî”.

Hîn di wê demê de dayika min digot;

-“Tu nikarî malekê ava bikî. Ne kes keça xwe dide te, ne jî kar dide”.

Ez wisa rexne dikirim. Dibe ku ew jî rastbe. Ji ber çavkaniyên jiyanê yên bi min re ne li gor dayika min bûn. Li derûdora min zarok hebûn, piştre hemû reviyan ber bi sazûmaniya dewletê ve çûn. Ew zarokên ku min bixwe ew perwerde kiribûn û dibirin dibistanê çûn. Çavên wan her tim li pergala heyî bûn. Dixebitîn bibim mamost e, bibin xwedî malbat. Çavên xwe wisa berdabûn sazûmaniya dewletê.

Piştre di dibistanên olî de, di dibistanên asayî de, di saziyên bîrdozî de, di dezgehên polîtîk de her tim serê min di belayê de bû. Her tim ez di nava lêgerê de bûm û tişta min dixwest tine bû. Di rastiya xwe de ez pir girêdayî bûm. Lê belê tişta min dixwest, min nedidît. Tu kes biqasî min bi hevaltiya xwe re ne girêdayî ye. Tu kes biqasî min bi mamosteyê xwe re ne girêdayî ye. Hemû mamosteyan ez nas dikirim. Min her tim zanibû heskirina hemûyan ji bo xwe bigirim. Ji her derê mamosteyên min hebûn. Hevalên min jî wisa bûn. Kesên 20- 30 salan min nasdikin heya niha jî dostên min in. Tirk jî wisa ne. Hemû hevalên min ên dibistanê, gelek ji wana niha di nava sazûmaniya dewletê de erkdarin, min weke dostekî baş bibîrtînin. Tişta dixwazim bibêjim girêdana bi hevaltiyê re hesteke mezin e, ji bo min. Lê belê tevî van hewildanên min, cardin diviyabû hinek kêmasiyên jiyanê bihatana derbaskirin. Derbaskirina mamosteyê min bûyereke zor bû.

Rêbertiya hevalên xwe kirin gelek zor e. Biceribînin, çiqasî zor e, hûnê bixwe jî bibînin. Tevî her tiştî bêyî ku mirov wana bişikîne û xemgîn bike Rêbertîya hevalên xwe kirin gelek zor e. Ji ber derbaskirina wan, dibe ku wan bişkîne. Derbaskirina kesekî pir zor e. Lê dema ku di aliyê erênî de were derbaskirin wê gelek kêfxweş bibin.

Wê demê tu dibî mamosteyê, mamosteyê xwe. Tu yê bibî Rêberê hevalên xwe, ev ê wan kêfxweş bike.

## GUREŞA MIN Û HEVALÊ HESEN

Gundê hevalê min ê zarokatiyê, Hesen Bîndal hebû. Gundê Cîbinê. Şêniyên wî gundî heya niha jî me bixêr bibîr tînin. Ez rojekê vexwendibûm mala xwe. Ji bo min eleqedariyeke mezin raber dikirin. Wisa nêzîkatiyeke rêzdar û giran hebû ji bo min. Em niha di nava êrîşeke mezin de ne. Rêxistineke hilweşînê ya mezin in. Lê belê di rêzdariya xwe de jî em çi kêmasiyan nakin. Ez heya niha jî di navîna wan de cih digirim.
Tu kes nikare hêvî bike ku ez ê zû têk biçim, an jî vala derbikevim. Em ê hîn biaqilane tevbigerin. Kesê di heftsaliya xwe de dest bi vî karî kiribe, ma dikare bihêsanî dev jê berde?

Tê bîra min mamosteyê min ji bo bi kesekî re gulaşê bikim, ez rakiribûm ser piyan. Bawerim ê hemberî min Hesen Bîndal bû. Ez pir tirsok bûm. Min di dilê xwe de digot;

-"Ez nikarim bi vî kesî re gulaşê bikim. Ew ji min bihêztir bû. Ez di hunera gulaşê de lewaz bûm".

Lê belê ev hest hîn di bîra min de ye. Min digot;

-"Ma ez rabim, an ranebim. Dudîlî bûm".

Di vê mijarê de birojan, biheyvan dudilî mam. Dema rabûm jî me ji hevû du nebir, em weke hevû du man. Ji bo min her çiqasî rabûna gulaşê (gureş) zehmet jî bû, min bizor û bela encameke wek hevû du girt. Êdî min dilê xwe wisa amade kir. Wek hev du mayîn. Heke ez bibin nexim jî binketineke bingehîn nepejirînim.

Di hemû qadên jiyanê de wisa me. Di hîndekariyê de jî wisa me. Dema dixebitîm refê derbas bikim jî wisa bû. Her çiqasî famkirina min lewaz jî dima, min hewildida pileya herî baş bigirim. Lê herî kêm nekevim bin pileya 5 an. Ev şêwaza min bû. Pileyên min ên 3 û 4 pir kêm bûn. Biqasî hejmara tiliyên destan an hebûn an jî tinebûn. Di

hemû jiyana xwede, ez wisa bûm. Di meşa xwe de, di bazdana xwede, di mijûlbûna xwe de wisa bûm. Di dibistana navîn û amadeyî de gelek tevger, çalakî û pevçûnên wisa hebûn. Ger tu bisernexî nabe, bibin bikevî jî nabe, ev her du hest bi hevû du re dimeşiyan.

Heya ku ez xwe amade nekim nakevim nava karan. Ji bo bikaribim wî karî bikim, di serî de xwe amade dikim, bihesab nêzîk dibim. Ev taybetmendiyeke min e. Di rastiya xwe de, ez ne gulaşvanekî baş im. Lê belê bi destpêkirinê re hema wendakirin jî nebipîvan bû. Di hemû lîstokan de wisa me. Yên dikarim biser bixim, jixwe biencam dikim. Yên din jî hemû wekhev diman. Bawerim di kêm lîstokan de min wenda kiriye. Ev derûniyeke, taybetmendiyeke kesayetî ye.

Şêwazê min gelek baldar bû. Di nimêja yekem de, di dibistana seretayî de melayê gund digot;

-"Tu bi vê lezê biçî tê bifirî. Tê bibî Ewliya, bifirî".

Nimêja min a yekem bi melayê gund re ev hizirîn didan pêşxistin. A rastî, ez ji duayan zêde fam nakim. Lê herî kêm weke wan dişopînim. Şopandina min, mela wisa dayîbû fikirandin. Weke vê gelek ceribandinên min ên jiyanê hene. Derbasbûyîna hemûyan ji dil in. Bi watene û digihînin encamê.

## ÇALAKIYA MIN A KEVIRAN BI FIRDO RE

Ez şer weke hunerê bidest digirim. Temenê şerê min herî kêm biqasî temenê min e. Ango aqilane, bizanebûn û demdirêj e. Heya ku ez jiyan bikim leza vî şerî kêm nabe. Min pîlansaziya wê çêkiribû. Roj biroj di nava amadekariyên wê de bûm. Tu kes nikare leza vî şerî asteng bike. Vînek heye. Ev têgihîna min, amadekariya min e. Min berê di nava gundekî biçûk de, di nava komekê de ev dida meşandin. Ez niha di asta navnetewî de pêşdixim. Niha li cîhanê gelek şer sekinîne. Qaşo dibêjin hemû şer sekinîne. Şerê rizgariya netewî, şerê çînî, şerê olî li gor pergal dibêjin sekinîne. Tam di van deman de şerê min bênavber berdewam dike.

Çalekiya min a bikevir hebû, wey ma ew çi çalekî bû! Ji ber zarokan li min didan, gelek zor jî be min çalekiyek pêşxistibû. Çalekiyên min ên li hemberî Miho û Cimo bû. Ev çalekiyên min biqasî serhildêriya min a yekem girîng bûn. Min mêze kir, ev her du zarok pir zêde bi ser min de tên. Min wê demê ev her du çalekiyên xwe amade kirin.

Başe min ê ev çalakiyên xwe çawa çêbikirana? Cumo zarokeke nesekinî bû. Wisa tevlî hemû qirêjiyan dibû. Di şer de rêgez nasnedikirin. Ez jî zarokekî pir tirsok bûm. Bihêsanî tevlî şeran nedibûm. Lê Cimo ji bo min astengekî mezin bû. Min nikaribû ew îdare bikirana. Me jê re digot Firdo. Birastî jî Cimo zarokekî li dora xwe difiriya diçû û dihat.

Ji bo vê çalekiyê min amadekariyên xwe kiribûn. Ev çalekî dibe ku ji neçarî bû. Ji ber wan zarokan bela xwe ji min venedikirin. Min jî bir-yara çalekiya xwe da. Di çavdêriyê de bûm. Min carkê mêze kir Cimo li jêr e. Li ber çem dimeşe. Êdî em dijberê hevû du bûn. Hîn di bîra min de ye. Ez derketim jora çem. Li jora wî bicih bûm. Min dest bi-şopandina wî kir. Di wê demê de kiras hebûn. Fîstanên dirêj bûn. Min dawa kirasê xwe bikeviran dagirt. Hinek li wêdetira me cîranekî me hebû. Ne dostekî pir baş bû, lê dikaribû di dema tengaviyê de bi min re bibûna alîkar. Ango alîkarekî min jî hebû, di wî şerî de. Min dizanî sedî sed beşdarî şer nabe, lê dikare hinekî bibe alîkar, min bişopîne. Di vî şerê xwe de min amadekariyên xwe qedandibûn.

Amadekariyên pêwîst

1- Çepergirtina sexlem

2- Şopandina dijmin

3- Alîkariya derûdor a pêwîst (ku di nava şer de navê vê alîkariyê îttîfaq e.)

Ango rewşekî rêxistinî bû. Piştre min dest biavêtina kevir avêtina Cimo kir. Min berê jî gotibû, Cimo ne kesekî wisa hêsan bû. Fêr bûbû her tim li ser me de dihat. Hingî min kevir avêtin, êdî neçar ma ku xwe biparêze. Dema dest birevê kir, ez hîn zêde bi ser de çûm. Ji wê

quntarê heya ber mala wan, min da pey. Heta bawerim çû hindir û derî li ser xwe girt.

Pir seyr e, ya rastî ew serkeftina min a yekem û ya pir mezin bû. Bawerim dayika min ev rewş gelek baş nirxandibû. Ji ber nakokiyên me hebûn. Wê pir dixwest ez bersiv bidim. Ev çalekiya min wisa pêş ket û encamekî baş hat girtin. Birastî jî encameke baş bû. Ez mezin nakim. Ji ber Cimo jî kesekî weke min bibela bû. Heya wê demê, ez bêzar kiribûm. Bi wê çalekiya xwe hêdî min karê Cimo qedandibû. Çalekiyek gelek bibername, biînsîyatîf û pêşamadekarî bû.

Ji bo Miho jî heman çalekî pêşket. Miho jî ez gelek mijûl kiribûm. Serê min şkandibû. Heta dibe ku hîn şopa wê jî hebe. Ji bo tola xwe ji Miho bigirim, min amadekariya çalekiya xwe kir. Derketim ser ban. Wê Miho ji serê kolanê derbiketana. Wî ez nedidîtim. Ew ê ji serê rêkê derbikeve ez jî li aliyekî ban im. Cardin min kirasê xwe bikeviran dagirtibû. Biderketina Cimo, ji wê rêkê min dest biavêtina keviran kir. Miho birîndar bû. Ew jî bilezekî mezin çû xwe avêt hindirê malê. Min ew jî xist di nava tartiya malê de. Bi vî awayî karê Miho jî qediya bû.

Niha dema ez li van çalekiyan temaşe dikim, rêbazê min ê şer derdikeve holê. Di van çalekiyên xwe de dikarim vî rêbazê xwe bibînim. Xwe bernamekirin, însîyatîf û veşartin hebû. Êrîşa yekem di destê min de bû. Heya dawiyê ez wan dişopînim. Heke hûn bala xwe bidinê, hemû taybetmendiyên gêrîla di wan çalekiyên min de hene. Di wî temenê biçûk de mirov dikare behsa gelek şerê wisa bike.

Di nava şert û mercên gundan de, şerê malbatî û zarokan pir çêdibin. Ez ji lêdana wan şeran, şkandin, kuştianan û ji wan pevçûnan gelek bifikar bûm. Ev şer di demdirêjiya xwe de, derbeyên mezin li ser daxwazên mirov ên jiyanê didin. Heya niha bandora vê li ser hestên min heye. Heya ji dest hat mirov nemire, lê dema ku êdî mirov nikare îdare bike, weke di çîroka Cimo û Miho de, şer pêwîst e. Yek du çalekiyên bibernamekirî, dikare vê tevlîheviyê ji holê rake. Di wî temenê xwe yê biçûk de min rêbazê gêrîlatiya pir mezin nîşan da.

Demeke dirêj di nav parastinê de mabûm. Piştre biçalekiya xwe ya êrîşê min pêşiya pêşeroja xwe vekiribû.

Nakokiyên malbatî hebûn. Pîvanên malbatê yên her ku dem derbas dibû, xwe didan farzkirin û kevneşopiyên civakî hebûn. Li hemberî wan jî ez ketim nava berxwedan û serhildêriyên mezin. Şer, hêrs û serhildêriyên mezin bûn. Piştre, şerekî serhildêrî heya dirêjî gund dibû, hat berdewamkirin. Ev jî şerê hêrsê bû. Dema ez ji gund derketim, cara dawî biçavên tije rondik, min li gund mêze kir. Ji ber hêrsên min ev şer destpêkiribû. Seyre! Tu çima wisa şer dikî û çima wisa derdikevî, qut dibî? Ev bixwe nakokî ye. Hem tu li dijî wan şer dikî hem jî bi çavên rondik cardin vedigerî li gund mêze dikî. Ev jî taybetmendiyeke kesayetiya min e. Min got ku kesayetekî wisa bihestan dagirtî bûm.

Ez qut dibûm. Qutbûna ji civaka gund ber bi civaka bajêr ve çêdibû. Di her alî de ev şerekî civakî bû.

## XWE GIHANDINA ASTA HEVALTIYA RAST

Civakbûyîna çêkera gundan an jî civakbûyîna gundan gelek girtî ye. Di nava wê girtibûnê de min hinek rêyên vekirinê dîtibûn. Ev jî biserhildêriyan dihatin avakirin. Hîn di wê demê de bi hevtemenên xwe re, min têkiliyên bidizî çêdikirin. Ji ber ku têkilî qedexe bûn. Ew kes dijminê me bûn. Ez li dijî wan qedexeyan derdiketim û bidizîka min hevaltiya xwe berdewam dikir, heya ku ew qedexe ji holê radibûn. Di nava civaka gund de şkandina min a qedexeyan a yekemîn wisa bû. Min rêxistina xwe ya dizî ava dikir. Kesên dibûn hevalên min di nava wê rêxistinê de cihê xwe digirtin. Di pîvanên hevaltiya min de ew hestên dijminahiyê hatin şkandin.

Di heft saliya xwe de min xwe wisa perwerde kir. Dema ez diçûm cem wan, kesên derûdora me digotin;

-“Vaye cardin cîva hat”.

Ez di deh saliya xwe de li ber dayika xwe sekinîm û min pirsî!

-“Ma qey tu dayikî? Ma tu dizanî te di cîhaneke çawa de, ez bi kîjan pirsgirêkan re rû bi rû hiştime? “.

Ev pirs bixwe, hesab xwestinek bû. Min cardin rastiyên heyî berevajî dikirin. Ez li dijî wan derdiketim. Min ji dayika xwe re digot;

-“Tu nizanî ji zarokekî çi dixwazî?”. Min mirîşk û çîçûkên wê nîşan dida û jê dipirsî “ Ma tu biqasî vê, dikarî li min xwedî derbikevî?”.

Jiyaneke wisa dihat xwestin. Ez pir tevdigeriyam. Hevsengî jî hebû. Ji xwe rêkûpêkî piştre tê. Ez pir birêkûpêkbûm.

Mînak: Min bi maran, guran, çûkan re şer dikir. Heke ez ne birêkûpêk bûma, wê ez gezkiribûma û bi min ve bidana. Ez li ser wan zinaran hemûyan di beziyam, min dest diavêt hemû tiştan. Yek ji wana gez nekirin. Ev bi rêkûpêkî ya kesî ve girêdayî ye. Min bihêsanî xwe neda dest. Bi sekna min ve girêdayî ye. Tu kes ne li dijî min bû. Ango her kesî ez guhdar dikirim, ev jî hêz û rêkûpîkî bû. Ango tiştên herî bawer nedikirin, min ji wan re digot. Hemû ji kena diketin erdê. Li wê derê ya girîng min xwe dida guhdarkirin. Nizanim ew balkişandin bû an jî xweşikbûna axaftinê bû? Destpêkê wan çawa dixwest min ew dikir, piştre daxwazên xwe ji wan re digot. Xwestekên min jî şer bû. Têkoşîn bû. Yekîtiyeke mezin bû. Di encam de ev 40 sale ez vê têkoşîn û yekîtiya mezin nîşanê cîhanê dikim. Ji bo nîşandana vê di serî de wan çawa dixwest min wisa dikir. Mînak, di destpêkê de digotin;

-“Xwezka ev kurê me bûna, an jî kurê me jî weke wî bûna, bixebitiya, bixwendana”.

Wan ez diecibandim, lê min ew ne di ecibandin. Min dixwest ez wan bidim guhartin. Ji bo vê divê, di serî de ez guhdar bikirama. Ev jî rêbazeke têkoşînê ye. Li hemberî paşverotiya gund û feodaliyê, min wisa têkoşîneke dijwar kir.

## ŞERÊ BI BIRAYÊ MIN RE

Hîn baş tê bîra min. Li pişta gund perçeyek REZÊ me hebû. Min ew der weke dibistanekê bikar dianî. Min bipirtûkan dagirtibû. Li binê dara fistekê, behîfê û di bin mêwên tirî de çend cihên min hebûn. Min ew der rast dikirin û li wir xew dikir. Li wir dixwend. Min pir dixwend û di wî alî de xwe gelek diêşand.

Birayeke min ê navîn hebû. Nizanim ji bo çi me girt hevû du. Sedema wê çibû gelo? Bigûmaneke mezin di nava rez de kêmaniyeke wî derketibû. Hewlestên wî bêserûber, ji kedê re bêrêz, nêzîkatiyên wî yên bêwate ji bo kar hebûn. Min ev helwestên wî dîtibûn. Di vê navberê de min xwest wî biqewitînim. Destpêkê hinekî mijûl bûm. Piştre min ew da revandin. Dest birevê kir. Min dabû pey wî û ew şopand.

Bihêrs û qehreke mezin, min ew dabû ber keviran. Wê demê li ser zinaran danû dikelandin. Dê û bavê min hemû li wir bûn. Çû xwe avêt nava wan. Jixwe perestgeha wî malbat bû. Li hember wê êrîşa min a giran, encax dikaribû di nava malbatê de xwe biparastana. Heke min ew girtibûna, bigumaneke mezin min ê bikeviran ew pir biêşandana. Jixwe hinek birînên keviran jî girtibû. Min hinek din girtibûna dibe ku hin deverên wî xwîn bibûna. Heta bişkestana. Hêrseke ewqasî mezin hebû.

Ji xwe dema xwe sipart malbatê, hema bavê min parastina wî kir. Bi ser min de hat. Ji ber ku bavê min bû, bineçarî ez paşde vekişiyam. Berbi gund ve ez paşde vekişiyam. Hemû gund rabibû ser piyan. Şerekî pir giran ê bav û kur bû. Dema paşvekişînê, ne wisa bênakokî û hêsan bû. Bi azweriyeke mezin û biavêtina keviran a bênavber paşvedikişiyam. Wî jî êrîş dikir, hinek girantir êrîş dikir. Di nava gund de êdî kolan hebûn. Min dikaribûm derbasî nava kolanan bibûma. Ji xwe li hemberî babê min, şansê min ê serkeftinê jî zêde tinebû. Di ketina nava kolanên gund de, êdî nizanim ew jî westiya çawa bû, ji min geriya. Paşde çû. Wisa em weke hev man.

Ji mal û gund qutbûn, bişerekî mezin û rexneyên giran ji wir derketin serhildêriya min a yekem bû. Min wê demê ji bo xwe dehlek çêkiribû. Weke vê dehlikê, piştre min yek jî li Rojhilata Navîn çêkiribû. Dikarim bibêjim ku xebata akademiyê wê demê destpêkir. Dehlek xweşik bû. Min ew amade dikir. Ew zilam hatibû ku xera bike. Êdî min li hemberî wî şer destpêkir. Baş tê bîra min, ew şer ji bo hinek rastiyan bû. Li gor min jiyaneke rast hebû. Diviya bû ev jiyan bihatana parastin. Lê wî zilamî dixwest, wê jiyanê kirêt bike. Min şerê xwe wisa destpêkir.

Lê min ew şer bes nedît. Bihêrsekê ez çûm malê, hîn di bîramin de ye. Perçeyek çiqina bavê min hebû. Wisa çiqîn di nava paçekî de girê dida. Pir vedişart. Dîtina wê pir zor bû. Di vî alî de ez gelek lêkolînvan bûm. Piştî çend lêgeran min di binê keviran de dît. Min deh qurîş girtin. Li gor perê wê demê gelek bûn. Piştî min ew deh qurîş girtin, min bernama terikandina gund danî. Hêrsa min a wê demê, ez berbi terikandina gund ve birim.

## SERHILDÊRÎYA YEKEM
## DERKETINA JI GUND Û RÊWITIYA BAJÊR

Çima min gund terikand? Ez bawerim ji ber hêrsa min a li hemberî malbatê bû. Piştî wê hêrsê, ji xwe min nikaribû li malê bimînim. Heke ez nikaribim li mal bisekinim, pêwîstiya min bigund jî tinebû. Ango min nikaribûm li gund jî bisekinim. Ji ber van sedeman, rêwitiya dirêj a bajêr destpêkiribû.

Di wê demê de bajêrê ku hinekî min nas dikir, Nîzîp bû. Bîrecîk hebû, piştre Nîzîp bû. Tevgereke wisa ber bi bajêr ve destpêkir. Tam kelegerma havînê û nîva rojê bû. Hewa pir germ bû. Di wê germê de ji gund derketin û çûyîna bajêr bûyerek pir kêm dihat aqilê mirovan bû. Lê min ceriband. Bilez ez daketim jêra gund. Berbi çem ve çûm û piştre derbasî ser gir bûm.  Berî ku gund ji ber çavên min wenda bibe, cardin

ez li xwe zivirîm, bihêrseke mezin û biçavên rondik dagirtî, min li gund temaşekir û bihewaya xatir xwestinê ez çûm.

Gundekî cîran hebû. Derbasbûyîna wî gundî pirsgirêk bû. Kuçikên wî gundî hebûn. Bihizirin, di wê demê de hûn zarokekî tirsonekin, gelek feqîrokin. Wekî din jî wê çi were serê mirov, neyê serê mirov nediyar e. Min wê demê ji xwe re got;

-"Tê heya pileya dawiyê, xwe serkeftî bikî".

Ez bi vê hestê ve, ji wî gundî derbas bûm. Di aliyê din de jî min xwe ji kuçikan diparast.  Piştî min gundê yekem derbaskir, bilez derbasî ser cadê bûm. Heya gundê duyem, li benda wesayîtê mam. Min dizanibû ku ji bo wesayît biçe Xelfetiyê, wê di wir re derbas bibe. An jî wê wesayîta postayê bihatana. Bilez û hêrseke mezin ez gîhaştim gundê Karamezra. Dareke wî gundî hebû, ez li bin wê darê rûniştim. Wesayît hat, bawerim bi du qurîş û nîvan çûm Bîrecîkê. Di Germa bi şewat de min xwe avêt bin pir ê. Min ew jî bi ser xist. Tevî wî temenê biçûk, ez biserketibûm. Di wê demê de ez diçûm dibistanê, an na? Nizanim. Li gor wê demê û wî temenê biçûk siwarbûyîna wesayîtê gelek zor e. Dibe ku min dibistana seretayî qedandibû. Bi wê lezê min xwe avêt Nîzîpê. (Rêbertî refa 5 an qedandibû. *Hevala Amadekar*).

## DEH SALIYA MIN

Di halê min ê zaroktî yê deh salî de, hêrseke min a ku her tim bilind dibû hebû. Bihêrseke mezin wisa weke baranê rondik ji çavên min dibariyan. Lê min ew hestên xwe ber bi serhildêriyê ve birin. Min ji gundê xwe re got;

-"Bi xatirê te".

Mînak, bi wî halê xwe yê zaroktî ve, ji gund û civaka gund xatir xwestin bûyereke pir bişewat e. Lê carekedin û bişêweyên rast vegera wir hat çêkirin. Min heya niha ev ji kesî re ne gotiye. Ti rewşa min a ku min bigotana jî tinebû. Lê biawayeke cewherî wisa ye.

Qutbûna min ji çiyayên welatê min, ji kevir, av, çûk, perperîk, marmarok, mar û pazpazûkên welatê min bûyerek gelek girîng bû. Nikarim wan deran ji bîr bikim. Ev bi şêwazê min a ramyarî (siyasetê) ve girêdayî ye.

Biqasî ku min teslîmkarî nepejirand û li berxwe da, di aliyê civakî de ez hinekî hatim pejirandin û min astek girt. Îro di nava dost û nasên xwe de, hinek eleqedarî dibînim. Dijminê min bi xwe jî li hemberî min rêzdar e. Heke ez hîn eşkere biaxifim, rastî ev e. Min çi bikira, nikaribû xwe bi tu kesî bidana guhdarkirin. Ne bi dayik, bav, malbat û derûdora xwe re ne jî bi tu kesî re min nikaribû xwe bidana guhdarkirin. Min berî niha ev serpêhatiyên xwe gotin. Êdî di wê demê de ez ketim nava têkoşîneke pir mezin. Di aliyê têkiliyên civakî de diviyabû hinek taybetmendî bihatana zelalkirin. Di nava gundan de têkiliyên malbatan ên ji rêzê, mirovan dixin nava têkiliyên gelek bixeter û bê encam. Min berî niha jî behsa van kiribûn. Di nava van têkiliyan de, berdewamiya hemû paşverotî û dijminahiyan heye. Min ev hemû weke xeter dîtin û li dijî wan derketim. Ev dij derketin, tê çi wateyê? Tê wateya pêşketina têkiliyên civakî yên rast.

Li pêşiya pêşketinên civakî nakokiyên navûdeng ên Kurdan hebûn. Bûyer û şerên weke doza xwînê, şerê cîranan, şerê li ser kuçikan, keran, bûstek ax û her wiha hebûn. Min xeteriyên vê dîtin. Li hemberî van nêzîkatî û asta paşketî ya teng min hêrs girt. Ez ji van nêzîkatiyan ne rehet dibûm. Hîn di temenê biçûk de li hemberî van nêzîkatiyan bersivên min ên çareseriyê derdiketin holê. Ez li dijberî hemûyan sekinîm. Wan çi dixwest, min tam berûvajî wê dikir. Dijî wan sekinandin çawa bû?

## XWEBUYÎNA XWE

Min xwebûyîna xwe îspat kir. Min ev bi keda ewqas şehîdan ve avakir. Şehîd hêza yekemîn in. Ji bo wê gel jî bi wan ve girêdayî ye. Her

wiha bi min ve girêdayî ye. Ev hêz (zagon û gotin vê dibêjin) bi kesayeta min re yek bûye. Ev bûyera ku ez dibêjim a xwedayî ye.

Ji bo xeta azadiyê ya civakî pêşbikeve, min têkoşîneke mezin da. Li hemberî paşverotî, malbat û gunditiyê, min serê xwe netewand.

Ji rastiya civaka gundan derbasbûyîna civaka bajaran gelek zor û zehmet e. Mirov dide westandin. Cara yekem derbasbûyîna civaka bajêr, ji bo min gelek zor bû. Hem daketina bajarên biçûk, hem jî yên mezin ango Enqerê gelek zor bû. Ev jî pir girîng e. Ez ketim nava van bajaran lê belê min xwe wenda nekir. Tevî ku ez pir girtîbûm jî di nava pergala bajêr de ez neheliyam. Bimehan, bisalan ez li wir mam. Meraqa min a famkirin û têgihiştina bajaran hebû. Hewildanên min zêde bûn. Lê tevî van hewildanên min, ez di ber tuxîbên helandinê re jî derbas nebûm. Hevalên min di 2 -3 mehan de dadiketin nava bajêr û xwe didan jiyankirin. Min nikaribû ew bikirana. Ji xwe ew hevalên min li hemberî min, nejidil bûn. Belê zarokên bajêrî, biradeyeke mezin di nava henek û ne ji dilî (necitî)yê de ne.

Eleqedariya mamosteyên min cudatir bûn. Di aliyê pêşketina min de hêviyên wan hebûn. Lê belê li gor xizmên me, yên derûdora me ez kesekî lewaz bûm. Bigûmaneke mezin ez derveyî sazûmaniya wan a jiyanê derdiketim. Wan ev ji bo xwe bixeter didîtin. Li hemberî civakîbûyîna bûrjûva ev dibû xeteriyek. Li hember jiyana bûrjûva nerehetiyên min hebûn. Ez nediketim nav wan. Min hêza xwe wisa bikar nedianî. Min ew di cîhana xwe a hindirîn de mehkûm dikirin. Wan jî bi henekên xwe ve ez mehkûm dikirim. Li hember bandorên kemalîst û feodal jî bitevdîrbûm. Bêyî hesaban û bêzanebûn weke masî ez nediketim nava bûyeran.

Ji bo hevalên min çêbibin min gelek ked dida. Bi gelek mijarên bingehîn re mijûl dibûm. Di navbera lêkolînên ol û felsefê de pir caran çûyîn û hatinên min çêdibûn. Ez bi vê tevgera xwe ji kesayeta Kurd a kevneşop qut dibûm. Di wê demê de min ferq dikir ku li ser gelê Kurd

bêmafiyeke pir mezin hatiye kirin. Ev zanîn hemû bi vî şêwazê min ve girêdayî derdiket holê.

DEŞTA BARAQÊ

Di deşta Baraqê de şêwazeke min ê paleyîyê hebû. Ev deşta Baraqê gelek biberhem e. Li wir genim şîn dibe. Dirûna genim hêzeke mezin dixwaze. Kokê genim pir zehmet tê derxistin. Ez biçend kesên nas, bi komekê re çûbûm. Heqdesta wan rojan 5 qurûş bûn. A herî girîng jî sibê, nîvro û êvarî dew hebû. Min ev rojên germ bidew derbas kirin.

Êdî min nêrî ku nabe û ez jî êdî nikarim li berxwe bidim an jî genim nemabû, min amadekariya xwe ya vegera mala xwîşka xwe ya Nîzîpê kir.

Lê belê min 10 qurûşên xwe girtibû.

Vegerek biwate bû. Min cara yekem 10 qurûş ji bavê xwe girtibû, cara duyem, min bikeda xwe 10 qurûş girtibû, ev pir girîng bû. Piştre çi bû nizanim.

## DEMA DIBISTANA NAVÎN

Li bajarê Nîzîpê di dibistana navîn de gelek kesan tevzê xwe li min dikirin. Bihizirin ango, kesê ewqas serhildêriyên mezin kirine, li vir bûye kesê ku henek pê tên kirin. Dibe ku wê demê ez xwendekarê dibistanê yê herî hêjar bûm. Lê li gor mamosteyên xwe zarokê herî biaqil bûm. Ji ber di wan deman de hem mamosteyên min ên jin hem jî yên zilam gelek nirx didan min. Her tim zanînên min zêde dikirin. Li dibistanê di rêza pêş de bûm. Lê tevî vê, ez navenda tevz û henekên xwendekaran bûm. Bandorên bajêr ên neyênî hebûn. Ji bo bikaribim tola xwe rabikim, diviya bû min ev rewş vegerandana teqandineke mezin. Ji bo vê salên dirêj pêwîst bûn. Gelek ji wan xwendevanan zarokên sûbayan, axa û kesên diyar bûn. Hinek taybetmendiyên min ên Kurdînî hebûn. Bawerim tevgerên min jî zêde nebihêzbûn. An jî li gor wan tevgerên min cudatir bûn. Min nikaribû bibûma weke wan.

Eşkere bû ku min nikaribû bibûma zarokekî weke wan ê civakî. Ez ji bo xwe, weke xeterî didîtim. Bihenekan, bitevzan dixwestin vê rewşê derbas bikin an jî paşvebikişînin.

Bersiva min ji wan re çi bû? Min bi mamosteyên xwe re diyalog ango hevpeyvînên xwe bihêz dikir. Têkiliyên min bi mamosteyên min re başbûn. Min pir baş li pirtûkên xwe mêze dikirin û min ew pir dixwendin. Ez her tim berbi yekemînên refê diçûm. Ev bixwe encamên başbûn. Ev hemû biserê xwe şer bû. Şerekî pir biwate bû. Piştî bi mamosteyên xwe re min têkiliyên xwe bihêz kirin û ez bûm yekemînê refê, min tola xwe ji wan zarokên bûrjûwa rakiribû. Min ew bibin xistibûn. Biawayeke eşkere min hersê ref jî wisa derbaskirin. Li hemberî têkiliyên bûrjûwa yên sexte nerehetiyên min hebûn. Ew têkilî ji bo min hîn xetertir dihatin. Ji bo wê min xwe ji wan durdixist. Heke min xwe nêzîk bikirana wê ez tine bikirama. Ne weke rêbazê wan weke rêbazê xwe, min xwe pêş dixist. Di encam de ez biserketim.

Di dibistanên şevînî de mantiqê kemalîst serwer e. Di vî mantiqî de bersiva waneyên dîrok, bîrkarî, ziman a serkeftî heye. Li gor pîvanên asayî ev tên pejirandin. Heke bersivên ezmûnên van pirsan werin dayîn, wê xwendevan bikaribana biçûna dibistanên şevînî. Bihêsanî min ev ezmûn derbaskirin û ez çûm dibistanê. Pileya min a dibistana navîn nexerab bû.

## DEMA DIBISTANA AMADEYÎ YA TAPO KADASTRO YA ENQERÊ

(Rêbertî Di Navbera Salên 1969 -1970 yê De Dibistana Amadeyî Dixwîne û Di Sala 1969 An De Ji Dibistana Amadeyî ya Tapo Kadastro Mezûn Dibe. *hevala amadekar*)

Di encam de ez çûm dibistanê. Dibistana Tapo Kadastro li Enqerê bû. Di vê dibistanê de ev pêşketin di kesayeta min de derketin holê. Ji ber ez li nêzî dewletê bûm hem jî li paytexta Tirkiye bûm, min gelek

rastî dîtin. Min rastiyên civaka bûrjûwa dîtin. Heke ez neçûbûma wê dibistanê, min nikaribû ev alî bidîtana. Min ji xwe re digot:

-"Heke ez nehatama vir, min ev civak û ev dibistan jî nas nedikir. Di vî alî de min kesayeta xwe pêş xist".

Dema ez diçûm Enqerê, birasthatinî, li rex min mamosteyek hebû. Min xwe avêt vî mamosteyî û min alîkarî jê xwest. Navê vî mamosteyê min Îdrîs bû. Cara yekem dema ez çûbûm bajêr min bidestê bavê xwe girtibû. Vê carê jî min alîkarî ji wî mamosteyî xwestibû. Wê demê bajarê Enqerê biqasî çiyayekî li ber çavên min mezin dibû û bi ser min de dihat. Min peykerê Ataturk dît. Hema min ji wî mamosteyî re got

-"Ka mêze bike, mêze bike".

Her tişt ji bo min pir biyanî dihat. Nakokiyek mezin bû. Weke axatiya gundan li vir jî nakokî hebûn.

Li dibistana Tapo Kadastro mamosteyên min ên leşker jî hebûn. Diçûn dibistana herbê. Ez li ser destên xwe digirtim. Nizanim çima? Dibe ku wî mamosteyî bizanebûn wisa nêzîk dibû. An jî gelek ji min hez dikir.

Li Enqerê di dema dibistana Tapo Kadastro ya pîşeyî de, bawerim sala min a dawî bû, ez diçûm mizgefta Maltepeyê. Hema li ber dibistana me bû. Ew mizgefteke xweşik bû. Pir caran diçûm wir.

Wekî din min konferansên di derbarê têkoşîna komunîzmê de guhdar dikirin. Heta dikarim bibêjim diçûm ocaxên ulkucuyan. Lê belê zêde bi wan re nedibûm yek. Di nava hewayekî wisa de bûm. Roportaja Xûlûsî Turgut bi Berzaniyan re hebû. Min bidil û can ew dixwend. Di aliyê hizrî de eleqeya min ji pirtûkên olî re hebû. Dixebitîm ku Necîb Fazil Kisakurek bibaldarî bişopînim. Beşdarî yek-du konferansên wî jî bûm. Ez bawerim ev hemû, ji bo têgihiştina xetên sitûr ên wê demê têrê dikirin. Berpirsê komeleya komunîzmê hebû, bawerim Refîk Korkut bû. Teorîsyen bû. Heta wê demê Demîrel ji bo civînekê hatibû. Ez jî beşdarî wê civînê bibûm.

## ALFABEYA SOSYALÎZMÊ

Di demek wisa de carkê birasthatinî pirtûka Hûberman a alfabeya sosyalîzmê kete destê min. Min hewilda bixwînim. Ne wisa binîyet an jî bi bername bû. Tenê min got çend rûpelên wê bixwînim, naveroka wê mêze bikim. Min yek- du rûpel qulubandin. Min ji pirtûkên wisa jî hez nedikirin. Hevalekî min binavê Ezîz hebû. Her tim diçû konferans û guhdariya nîqaşan. Piştre dihat her tişt tevlîhev dikir. Binavê çepgiriyê dixebitî û diaxifî, lê ti tişt jî nedikir. Ji ber vê min ji wan axaftin û nirxandinan hez ne dikir. Di demek wisa de ew pirtûk ketibû destê min. Min çend rûpel xwendin û ez matmayî mam. Tenê ev gotin li ser zimanê min rijiyan erdê. Ol wenda kir, Marks biserket.

## OL WENDA KIR MARKS QEZENC KIR

Dirûşma guhartinê ev bû. Biawayeke hîn vekirîtir heke were şîrovekirin, bîrdoziya kevneşop a heyî, wendakir. Jiyana civakî ya nû qezenc dikir. Dikarim bibêjim di sala 1966 an de ez tam gîhaştim biryareke wisa. Tê bîramin. Xwe bixwe min ev axaftin digot. Ol Wenda Kir Marks Qezenc Kir

Piştre weke karmendê Kadastro ez firiyam Amedê ( bi balafirê). Ji Amedê bixwe, li Kurdîstanê mêze kirin wê hîn baştir bûna.

Weke karmendê dewletê min dikaribû jiyana sosyalîst hîn baştir li wir bi jiyana dewletê re beramber kiribûna. Ew derfet hebû. Ji ber ku berî niha me nedikarî di nava paleyîya ceh û geniman de çavên xwe vekirana. Lê bikar, bêrîka min hinekî pere dîtibûn, jiyana wan kesên bûrjûwa min hinekî nas kiribû, ev fêrbûn ez hinekî wêrek kiribûm. Di wê demê de kesên axa nêzîkatiyên xwe ji bo min raber dikirin. Ew kesên ku berî niha min nedikarî xwe nêzî wan bikim, niha bibûn demagog û me her roj hev didît. Ji xwe gelek axayên modern ango yên bûrjûwa jî derketibûn. Ev hemû çavderiyên min dewlemend dikirin.

Gundiyên bi axayan re girêdayî, gundiyên axa ji bo ku ez bibûm karmendê Kadastroyê, min ew didan xebitandin. Gelek ji wan digotin;

-“Di dema derketina nava zeviyan de xwîn ji difna me tê. Abdullah me pir zêde dide xebitandin”.

Birastî jî wisa bû. Min bela xwe ji wan venedikir. Di wê jiyana karmendiyê de jî, min xwîn ji cergên wan dianîn. Ev rêbazê xebatê tempoya min a kar nîşan dide.

## PERÇEYEK CAW

Dayik ji bo min mirova herî nêz bû. Biawayeke mafdar ji kurê xwe hinek tişt dixwestin. Kiribû rik. Digot;

-“Ma çima tu ji min re çend metre caw nakirî?”.

Min gotibû;

-“Ez nakirim. Heke tenê çavê te li perçeyek caw e û tu xebata min a girîng nabînî, ez jî ji te re caw nakirim”.

Wisa nelihevkirineke min a mezin hebû. Çi ma? Ji ber nedidît ku min çiqas karên mezin dikir. Di vî alî de tiştan naxwaze. Hemû hêviya xwe bi perçeyek caw ve girêdaye. Hemû hewildana min ji bo ez bibim zarokekî biaqil û biedeb bû. Ji hemû şêwazê jiyana min ev dihat famkirin. Ne ji ber ez dayika xwe ne dihizirîm. An jî ez ne kurekî ku ne layikê dayika xwe bûm. Ji ber wê wisa erzan dihizirî. Min jî helwest danî bû û caw nekirî.

# ZAYÎNA DUYEM

Ev dem biveqetîna ji civaka bûrjûwa û dewletê dest pêdike û biarmanca avakirina pergala xwe ya siyasî û civakê ya hemdem biceribandina damezrandina komeke bîrdozî û serbixwe dewam dike. Tevî ku civakbûyîna destpêkê bizarokan, biduayên olî û çûyîna dibistana seretayî destpêdike, civakbûyîna duyemîn bi xwendekarên zanîngehê re li ser hîmê çepgiriyê û bîrdozîya netewî pêş dikeve. Her çend li dijî şovenîzma neteweya serdest û nirxên kapîtalîzmê yên belav têkoşîn dikirin, hewildaneke lêgerînê ya ji nû ve li civaka xwe hebûn jî ekolên neteweyî û yên çepgir ên heyî divê hêzê de nebûn ku normên jiyana kapîtalîst li dawiyê bihêlin û bikaribin bigihîjin hedefa xwe ya rastîn. Ev pêvajoya ku em dikarin wê weke qonaxa yekemîn ya PKK bûyînê dest nîşan bikin, di cîhana bi bahoza salên 1970 an de mîna pêlekê ber bibayê ketibe, tevdigeriya. Biqasî ku ji cîhana kevneşop qetiyaye, ew çend bi nirxên cewherî yên kapîtalîzmê re jî nebûye yek.

Bilêgerînên teorîk û pratîk dixwazin welat û civakê ji nû ve keşif bikin. Ya bingeh çepgiriya li gelemperiya cîhanê ya mode tê şopandin. Civaka kevin ji nû ve tê tamijandin. Mîna ku bibêjin, “heke bibe mala xwedê ava”. Bi vî rengî li benda serketinê ne. Li gorî me êdî fikrek me jî heye. Kom ji aliyê hejmarê ve jî mezin dibe. Em xwe tiştekî cuda dihesibînin. Îhtîmaleke mezin heye, civak tam bike. Piştî ku mîna tortul ji qozayê derbikeve, me gav avêt derveyî welat, em di dema xwe de ne. Jixwe pişta me û xwîna me germe. Utopya ji bo bicih were hêvî dide. Piştî ku em xwe ji desteka komê digihînin, desteka girseyên gel, baweriya me zêdetir dibe. Me êdî hêza çekan nas kiriye. Koma gêrîla ya ji bo tevgereke Rizgariya Netewî ya hemdem hatiye perwerdekirin û biçek kirin. Hatine gîhandina baniyên asê yên welat. Êdî dor hatiye pêngava nû ya dîrokî.

Ev dema ku salên jiyana min ên di navbera 1972 -1984 an de zevt dike, beşên destpêkê, hêjaye ji gelek aliyan ve were nirxandin. Mirov dikare weke hişyarbûna pêngava gelê Kurd ê xizan ê vê serdemê,

binav bike. Mirov dikare weke serhildana destpêkê binav bike. Yan jî yekem guleya li çarenûsê hat xistin jî binav bike. Dîsa mirov dikare weke qîrîna namûs û rûmetê binirxîne. Dikare wek yekemîn çalakiya serketî ya hz. Dawût li dijî Golyat jî were biwatekirin. Dikare weke yekemîn gava wêrekiya ji bo ramana azad jî were hesibandin. Dikare weke pêngava qutbûna ji normên koletiyê bihezar salan jî were dîtin. Demek wisa ye. Biwateye. Hinekî şansê xwe jî heye. Mîna hilatina duyemîn hînekî jî ked û baweriyê dixwaze û mirov dikare weke demek xwe ji nû ve gîhandina paradîgmayê bibîne.

Di jiyana min de, beşa duyemîn a dema duyemîn di navbera 15 tebaxa 1984 an, heya 15'ê Tebaxa 1999 an de diqewime. Ev pêvajoya biqasî 15 salan digire nava xwe, weke qonaxa duyemîn a P.K.K' ê bûyînê ye. Bigiranî, bitekoşîna çekdarî derbas dibe. Pêvajoyeke dijware. Di dîroka rojhilata navîn de, mirov dikare bişibîne komên mîna Babek, Xarîcî, Karmatî û Hesen Sabah. Di beşa yekem de zêdetir Îsewîyet li pêşe. Lê di beşa duyemîn de Mûsewîyet û Muhammediyet bigiraniya xwe li pêşe. Ji bo koma muhacirîn a bizehmetî dimeşe, were gîhandin, erdên soza wan hatiye dayîn. Hewldan û qabîliyeteke mezin tê xwestin. Wezîfeya gîhandina hz. Musa bibîr dixîne. Çalakiyên şer jî hz. Muhammedê li Medîneyê bibîr tîne. Atmosfereke bawerî û îmanê ya ruhî heye. Xwe fedakirina ji bo vê yekê tam mumînwarî ye. Bawermendiye. Sosyalîzma zanist bihêza baweriyê tê meşandin. Şer tam çalekiya pîroz e. Her ku dem diçe nirxa mirov namîne. Lê armancê şûna mirovan digirt û dibû her tişt. Pir zehmete ku mirov bizanibe nexweşiyeke asayî ya îktîdarê heye. Kesayeta lewaz a bisalan li naverasta dewlet û bajar hatiye bombebarankirin qabîliyeta wê nîne ji derveyî îktîdarê. Yan jî ji meşa biser lingekî zêdetir nizane tu meşan bike. Kesayeta kapîtalîzmê bidijwarî, tenê hiştiye. Dema birêkûpêk bi malê xwe re were girêdan biberevajî, dikare bidijwarî bibe civakî. Bitaybetîyeke herî asayî, dikare bibaweriya çalakiya pîroz rabe û her tiştê xwe feda bike.

Ya bingehîn li şûna ku bibêje:

-“Jiyan nirxa herî pîroz e” berevajî, bibaweriyeke di asta fanatîzmê de dibêje:

-“Armanc her tişte”.

Bi vî awayî kesayeteke çavkor derdikeve pêş. Di vê cûreya doxmatîzmê de, bişêweyekî çarenûs û girêdana, bi hin pîvanan xwe re, rewşek din derxist holê.

Bêgûman meşên wisa li deverên hêsan nehatine kirin. Xwediyê pergalê hebûn. Li gorî pîvanên xwe wê pêdiviyên cîhana xwe bicih anîbûna. Ez dikarim 15 sibata sala 1999 ê weke rojekê ku cîhana kapîtalîst bihêza xwe ya bûye mîna ezraîl, bihezar dek û dolabî destê xwe xist qirika min, binirxînim. Di vê dema jiyana min de, mirov dikare behsa hin xeletiyên starejîk jî bike. Diviya bû min di sala 1982 an de, kadroyên bikaribin ji komên çekdar re yên pêşengiyê bikin, afirandiba û bi vî awayî şandibana welat. Heke Kemal Pîr û yên din, ne di sala 1980 an de, di sala 1982 an de bi komên mezin re, di ser Başûr û Rojhilatê Kurdîstanê re şandina wan a welat pêk hatiba, wê karibûna gavên hîn rast û berfireh avêtibûna.

## SALÊN 1970

(Di payiza sala 1970 an de derbasî zankoya huqûq a Stenbolê dibe. Di heman demê de Karmendiya xwe li Bakirkoyê berdewam dike.*hevala amadekar*)

Di salên 70 yî de min mûçeyeke baş digirt. Ji bo ez nehelim û xera nebim, min hemû ji bo şoreşê bikar dianî. Ez hatibûm Amed’ê, ji bo karmenidiyê bikim. Bedelê vê karmendiyê jî gelek bû. Di demek kin de, min dikarî dewlemend bibûma. Gelek kesên derûdora me ji me re digotin;

-“Begê min, an jî rêzdar”.

Li gor wan ez karmendê dewletê bûm. Têkiliyên gundiyan û dewletê, min baştir fam dikirin. Jixwe ti nîyeta min tine bû ku ez tenê

wisa bimînim. Ji bo ceribandinê min dixwest, ez zêdetir pêşbikevim û bilind bibim. Amêrê vê bilindbûnê dibistan bû. Min ew amêr diceriband. Ji bo vê ez ketim nava amadekariyên zankoyê.

Cara yekem dema min diravên zêde girtin, heya sibê min xwêdan da û xew nekir. Di encam de, min çareya xwe dît. Minê ji bo Kurdîstanê bikar bianîna. Jixwe em berbi şoreşê ve diçûn. Ev çûyîna min jî gelek cûda bû. Ji her kesî cudatir bû. Dema min deh hezar girt, derbasî Stenbolê bûm. Di civaka me de, gelek bûyer avakirina mirovan bandor dikin. Sekin û nêzîkatiyên qeydkirî, yên mulkiyetê, yên lewaz, lihevkirinên şaş vê avakirina mirovan bandordikin. Li şûna van bandoran, ez dibûm xwedî sekna rast, bivîn, xwedî nasname, wekhev, bimoral. Min xwe wisa bilêv dikir. Min digot;

-"Girêdan û azweriya rast ev e. Li gor vê diviyabû hêz û bandorên jiyanê bihatana raberkirin. Heya niha jî ez wisa me. Min xwe ji bo diravan nexapand. Ev neşerm e. Ya şerm bidiravan xerabûyîna kesayeta mirov e".

## PIŞTÎ DEMEK DIRÊJ DÎTINA BAVÊ MIN

Piştî demek dirêj min bavê xwe dît. Li hemberî min binkeftina xwe pejirandibû. Di sala 1970 an de navê min pir dihat gotin. Bavê min ji bo vê kêfxweş bibû. Cara yekem, di wê demê de, di radyoyan de daxwiyanî dihatin dayîn.

Ez dihatim mal. Min mêze kir, li ber deriye. Hem bifikar bû, hem jî gelek bicoş bû. Di got şiyar be. Navê te derketiye, her kes behsa te dike. Hinekî jî birûyekî tirş digot:

-"Te ez jî û xwe jî şewitandim".

Qasî bigurur bû, bawerim bi min bawer jî bû. Dıgot:

-"Tu dikarî fetih bikî". Heta digot;

-“Tu tenê yî. Komunîst jî tenê ne, lê yê wan Ecewîtê wan heye. Lê kesê bi Kurdiniyê re eleqedar dibin tenê ne. Tu kesê wan tine ye. şiyar be”.

Bîranîkeke wisa jî hebû. Bikinahî êdî min û bavê xwe lihev kir. Êdî bibû aliyê min û heya dawiyê bawer dikir. Di navberê de 15 sal derbas bibûn. Ez ne bicivaka gund, ne jî ya bajar re yek bibûm.

Bavê min di sala 1976 an de, jiyana xwe ji dest da. Ez li Enqerê bûm. Dema min bihîst ez xwînsar bûm. Nayê bîra min ku min rondik barandin. Kehaneta wî rast derketibû. Gotibû;

-“Dema ez bimirim, tu li pey min rondikan nabarînî”.

Bawerim wî ruhê demê xwendibû. Rastiya modernîteyê di anî ziman. Biqasî nakokiyên bi dayika min re, nakokîyên min bi bavê min re çênebibûn. Nakokiya min a herî girîng dema serhildêriya yekem a malbatê-gund bû. Berovajî nêzîkatiyên derûdor bavê min ji min bihêvî bû. Mizgîniya serkeftinê jî dayîbû. Piştî demek dirêj, min rastiya bavê xwe cardin nirxand. Weke hêmana kevneşopiya civakî ya durust bû. Ev hêman xerab nebibû. Min ferq kir, di van aliyan de xwe parastibû. Di aliyê kesî de, exlaqê wî yê olî bihêz hebû. Di rewşa ferdê malbatê yê bihêz de bû. Lê ji aliyê pergalê ve, ev kesayet bêhêz hatibû hiştin. Hêza xwe ya baviksalarî wenda kiribû. Aliyê dayiksalarî girantir bû. Hevsengiya di navbera her duyan de hiştibû ez derketineke cuda çêbikim. Îdeayên her duyan ên li ser min hema hema tine bûbûn. Dikarim bibêjim di nava malbatê de, biradeyeke girîng min derfeta azadiyê bidest xistibû. Dema ku modernîteya kapîtalîst ferq kirin û hîskirin, wan ez tenê hiştim, nizanim çawa hizirîbûn. Lê baweriya wan hebû. Ez ji malbateke durust, bêhêz, lê bi şerefa xwe ve girêdayî hatibûm. Divê ev biçûk nehatana dîtin.

## AMADEKARIYA ZANKOYA HUQÛQ A STENBOL

Di dawiya sala 197O an de min qeyda xwe li Zankoya Huqûqê ya Stenbolê çêkir, lê ez qet neçûm dibistanê. Li Bakurkoyê ez karmendê Kadastroyê bûm. Li Avcilarê, nêzî gundê Şambatya bû. Min karmendiye ke baş kir. Çavdêriya min li ser Bakirkoy, Atakoy çêdibû. Jiyana wêderê hinekî din pêşketî bû.

Di nava jiyana Stenbolê de, min tu carî xwe wenda nekir û jibîr nekir. Ez li wir jî tenê bûm. Min hewil dida bitena xwe çareseriyan ava bikim. Her çiqasî hestên min pêşketibin jî, lê jiyana Stenbolê li ser min bandoreke neyênî nekir. Jiber ez bihesab û bi amadekarî nêzî wê jiyanê dibûm. Di wan deman de, min pirtûka Mafê Qedera Xwe Tayînkirina Netewan di refa pirtûkxaneyan de dît. Cara yekem min li wir dest bi vê hizirandinê kir. Bawerim min dest bixwendi nê jî kiribû. Nêzî Yûrda Xwendevanan a Siteya Stenbolê pansiyonek hebû. Ez li wir dimam.

## AMADEKARIYA ZANKOYA ZANISTÊN SIYASÎ YA ENQERE

Li ser sûrên Amedê gelek geriyam û mam. Di wê demê de Otela Sûr Palas hebû. Ewder biryargeha min bû. Otela Lîceyiyan bû. Biqasî dizanim a Behcet Canturk bû. Piştre kirine Otela Demîr an jî tişteke wisa. Ango ev otel cihê çavkaniyên min a Kurdiniyê bû.

Daxwaza min a çûyîna zankoyê ne, ji bo ku ez bibim burokratekî dewletê payabilind bû. Ji bo ku ez hewaya siyasî ya Tirkiye baştir nas bikim bû. Di armanca min de zankoya Zanistên Siyasî hebû. Bi vê zankoyê dikaribûm hîn baştir têkiliyên siyasî derbixim holê. Lê demekê min got;

-“Heke ez nikaribim vê dibistanê qezenc bikim jî dibistana Huqûq jî dibe. Ji bo vê derbasî Stenbolê zankoya huqûq bûm”.

Lêgerên min zêde dibûn. Di dawiya sala 1971 an de min qeyda xwe li Fakulteya Zanistên Siyasî çêkir. Biamadekarî û xwendineke 15 rojan ketim ezmûnan. Di pileya rêza 20. de min qezenc kir û bûrs jî girt. Min

hindekî xwe bimîlîtaniya xwe dabû naskirin. Jiyana Enqerê, li gor civaka wê asta herî pêşketî dida diyarkirin. Ev dibistan jî cihê zarokên dewlemendan bû. Cardin biamadekariyeke dem kin, derbasî refa duyem bibûm. Kurê Koruturkê Serokwezîrê berê jî li vir dixwend. Zarokên subay û burokratan li vir dixwendin. Di 31 ê Adarê de çalekiya boykotê, me li darxist. Çalekiya berxwendaniyê bû. Di vê çalekiyê de min erka Rêbertiyê dilîst û gelek wêrek bûm. Bi vî awayî me însiyatîfa tevgera ciwanan, di Adara sala 1972 an de girtibû. Ji wê rojê, heya niha ev erka pêşengiyê berdewam dike. Di bûyerên 12 Adarê de, pêleke girtinê rabû. Her kes da berxwe. Li her dera Tirkiye belav bû.

## SEMÎNERA MIN A YEKEM

Di wan deman de, min cara yekem semîner didan. Mijara semînera min a yekem "Dîroka Civakan û Meseleya Kurdan" bû. Li gor dema xwe mijareke gelek wêrekî dixwest.Min ev semînera xwe da. Her kes matmayî mayîbûn. Guhdarvanan ez pir xeter dîtim. Digotin;

-"Ma ev ji ku derket?"

Min di semînera xwe de ev gotibûn;

-"Pêxemberê me gotiye "ya rabbî tu derfetê avakirina Dewleta Kurdan nedî wan. Heke tu vê derfetî bidî, wê Kurd li serê cîhanê bibin bela".

Di van gotinên xwe de, min behsa Dewletê kiribû. Tenê peyva dewletê bala her kesî kişandibû. Ji matmayînê devê her kesî birîn bibû. Min rexne jî kiribûn. Min digot;

-"Bîrdoziya olî di vê mijarê de bêmafiyê dike". Ji xwe di van axaftinên xwe de, li ser mijara netewan jî rawestiya bûm. Bidaxwazeke mezin, dixwestin ji min axaftinan fêr bibim. Di gotin;

-"Ma tu çi dixwazî?"

Lê wê demê hîn daxwazên min, tam zelal nebibûn. Min tenê xeta DDKO rexne dikir. Ji ber biawayeke kêm fermî jî be di nava wan de, dixebitîm.

Li stenbolê ji bo min demekî pir nû destpêkiribû. Di sala 1972 an de jî min semînerek dabû. Di wê semînerê de, min gelek axaftinên ku kesên serhildêr ên weke Berzaniyan û yên din biziman nekiribûn digotin. Bitena serê xwe, min ev nêrîn dianîn ziman. Di wana xwe de min digot;

-“Ma çima dewleteke Kurdan jî nebe? Min ev pirs dipirsî û bersivê wê dida”.

Tê bîra min, takimeke fermî rengê şîn li ser min bû. Kravat di sutûyê min de bû. Ji bo her kesî rûyekî nû bûm.

Di kongreya DDKO ya dawiyê de Hîkmet Kivilcimli axifîbû. Di axaftinên xwe de, peyva Zarokên Mezopotamyayê bikaranîbû. Berpirsên DEV-GENC ê diaxifîn. Piştî wan ez axifîm. Bawerim axaftina min bala gelek kesan kişandibû Axaftineke wêrek bû. Ji ber vê. Hema min girtin nava endamên rêveberiya xwe. Di pey vê de jî ev xebat ji aliyê dewletê ve hat qedexekirin û girtin.

## NÛNERTIYA ŞOREŞGERIYÊ MAHÎR ÇAYAN

Biranîneke stenbol a dawî hebû. Di 12 adarê de, ez jî çûbûm civîneke dev-gencê. Li saloneke Maçkayê dihat lidarxistin. Mahîr Çayan, Sînan Çemgil, Kazim Ozdoxru û Ramazan Aktolga ketin salonê.

Rûyên wan hîn di bîra min de ye. Bawerim wan di wê demê de li dijî Dev-Genca Mîhrî Bellî helwest girtibûn û bingehê THKP-C danîbûn. Di wê civînê de, Mahîr Çayan pir eşkere û wêrek axifî bû. Berî şehadeta wî bidemek kin bû. Cara yekem ji devê Mahîr Çayan pirsgirêka Kurd dihat ziman. Cardin behsa pirsgirêka Kemalîzmê kir. Gelek xweş axifî bû. Asta wî ya bandorkirina me pir zêde bû. Bawerim xwe ji bandora Kemalîzmê nû xelas dikir. Li ser mijarên rêxistinên şoreşgerî yên veşartî û eşkere jî çêbibû. Ji bo rêxistinên veşartî pêwîstiya şerê çekdarî anîbû ziman. Li ser rêxistinên heyî gelek rexneyên wî hebûn. Du caran axifî, her du jî hişk bûn. Heta biqasî tê bîra min, çek jî

teqiyan. Li gor min ew helwesteke heya dawiyê wêrek û pêwîst bû. Li Stenbolê bîranîna min a herî girîng bû.

## MAHÎR ÇAYAN KÎ YE?

Mahîr çayan li Samsûnê ji dayik bûye. Dibistana seretayî li Samsûnê ya navîn û amadeyî li Stenbol Heydarpaşayê xwendiye. Di sala 1963 an de Fakulteya Huqûq a Stenbol û piştî salekî fakulteya Zanistên Siyasî ya Enqereyê dixwîne. Di van salan de, di nava xebatên ciwanan de demekê cihê xwe digire. Di sala 1965 an de dibe serokê SBF ê Kuluba Hizir a Enqerê.

Di sala 1967 an de, demek kin derbasî Fransayê dibe. Tevgerên sosyalîst dişopîne. Di sala 1968 an li Îzmîrê çalekî tên lidarxistin. Ji van çalekiyan re, çalekiyên fîloya 6. tê gotin. Di vê çalekiyê de, tê binçavkirin. Piştî tê berdan di wan salan de, di nava nîqaşên THKP-C û TÎP'ê de cih digire. Piştre TÎP navê DEV-GENC digire. Ji rojnameyan re, nivîsên radîqal dinivîse. Di hemû civînan de, nirxandinên serbixwe dike. Taybetmendî û pêwîstiyên şerê çekdarî dinirxîne.

Bi hevalên xwe Münir Ramazan Aktolga û Yusuf Küpeli re xebatên THKP-C dimeşîne. Di nava vê xebatê de wekîdin Ertuğrul Kürkçü, İlhami Aras, Ulaş Bardakçi, Mustafa Kemal Kaçaroğlu û Hüseyin Cevahir jî hene. Modela Gêrîlatiya çiya pêşdixe. Di 22 Gulana 1971 an de konsolosê Îsraîlê Ephraim Elrom di revînin û tine dikin. Ji aliyê polîsan ve di malekê de tên dorpêçkirin. Piştî hewildanên demdirêj di 1 hezîranê de Huseyîn Cewahîr, jiyana xwe ji dest dide Mahîr Çayan bibirîndarî tê girtin û dikevin girtîgeha Stenbolê ya Maltepeyê. Di 29 ê Mijdara 1971 an de bi hevalên xwe

Ulaş Bardakçi, Ziya Yilmaz, Cîhan Alptekîn, Omer Ayna re, di tunelekê de fîrar dikin. Ulaş Bardakçi di 19 ê Sibatê de tê qetilkirin û hevalên wan jî hatine girtin. Mahîr çayan ji bo pêşiya dardakirinên din ên Denîz Gezmîş û hevalên wî bigire, derfetên çalakiyan dide avakirin. Li Stenbol û Enqerê deşîfre dibin. Êdî nikarin li wir bimînin. Bi hevalên

xwe Cihan Alptekin, Ömer Ayna û Ertuğrul Kürkçü re derbasî behra reş dibin.

Di 26 ê Adara 1972 an de ji bo ku Denîz Gezmîş, Yusuf Aslan, Huseyîn Înan bên berdan, teknîsyenên Emerîqî û Qenedayî ji baregeha NATO'yê direvînin. Di 28 Adarê de bi rehîneyan ve derbasî gundê Kizildereyê mala muxtarê gund dibin. Di 30 ê Adara 1972 an de mal tevahî ji aliyê leşkeran ve tê dorpêçkirin. Rehîneyên ku hatine girtin, xwediyê malê û tevî Mahîr Çayan hevalên wî Cihan Alptekin, Ömer Ayna, Saffet Alp, Sinan Kazim Özüdoğru, Hüdai Arikan, Ahmet Atasoy, Ertan Sarihan, Sabahattin Kurt û Nihat Yilmaz tên qetilkirin. Ertûgrûl Kurkçu tenê yek kesê ku bibirîndarî ji vê qetliyamê rizgar dibe. Ew jî tê girtin.

Cenazeyê Mahîr Çayan li Enqerê di goristana Karşiyaka ya bihejmara L/3 de ye.

Ruhê we şadbe, dilê we xweşbe, hevalên şoreşger doza we doza me ye.

## GIRTÎGEHA MAMAKÊ

Bi xwepêşandaneke amator ve, me xwest bersiv bidin çalekiya Kizildereyê. Di pey wê de 7'ê Nîsana 1972' an de hatim girtin. Heft heyvan di girtîgeha Mamakê de mam. Ji ber kêmbûna delîlan hatim berdan. Di zindanê de, min gelek encam derxistin. Girtîgeh çi ye? Jiyaneke çawa tê jiyankirin, çi dide mirovan? Divê bersivên çawa were dayîn, min hemû jiber dikirin. Wekî din jî gelek mîlîtan û kadroyên rêxistinên din hatibûn girtin. Min her tim bi wan re nîqaş dikir û hemû xebatên wan fêr dibûm. Wê girtîgehê ji bo min rista dibistanekê lîst. Ez pir xwînsar bûm. Di bin navê xwendevaniyê de min gelek xebatên din kirin û kes pê nehesiya. Piştre ez hatim berdan. Ji xwe tiştekî ku min bigirin, min nekiribû. Ew girtin bixwe bêmafî bû. Lê ez neketim nava hizrên kesî.

Dozgerê dadgehê yê binavê Bakî Tux dixwest heft – heşt salan ceza bide min. Lê jiber şahid tinebû neçar ma ez berdam.

Li cem min Doxan Firtina hebû. Şahidê wê demê yê zindi ye. Bavê wî albay bû. Dayika wî li ÎHD’ dê dixebitî. Dibe ku ev kes di dadgehê de bibû alîkar.

Dersên pir dijwar min ji wê girtîgehê derxistin. Dersa yekem careke din nehatina girtinbû. Ji bo vê bênavber xwe rêxistinikirinbû. Divê min hesabên xwe ji dewletê bixwestana. Em îro jî vî hesabî dixwazin. Şerê herî germ tê meşandin. Şerê taybet heye. Di wê demê de ez tenê bûm. Şerê min destpêkiribû. Niha em rêxistineke mezin in. Ji bo vê rêxistina mezin min wê demê bênavber kar dikir. Di serî de min rêxistina xwe avakir. Çend heval ji xwe re dîtin. Ev çend heval dîtin gelek û gelek zor bû. Ez biheyvan li dora xwe digeriyam. Ez bifindê li hevalên xwe digeriyam. Binenûkan derfetan ava dikim. Min digot;

-“Ji bo ez van mijaran parvebikim, divê ez hevalên xwe bibînim. Lê kesî zû bi zû guhdar nedikir”. Min digot;

-“Pirsgirêkên me evin”. Wan jî digotin; “Biçe derkeve çiyan”. Dema min digot;

-“Bitenê nabe tu jî bi min re were”.

Wê demê bêdeng dibûn û ditirsiyan. Her kes di nava çanda dewletî, kemalîst, feodal û hinekî jî bûrjûwa de mezin dibûn. Kesî ev zehmetî nedidan berçavan.

Mala xortekî ji Mûşê hebû. Navê wî Atîlla bû. Mala wî li jêra me bû. Piştî ji girtîgehê derketim, li wê malê mam. Hinek keçikên nesekinî dihatin wir. Nizanim dibe ku dewletê ew bizanebûn rêdikirin wir. Lê belê min qet xwe nêzîkî wan nedikir. Jiyaneke min a girtî hebû. Cara yekem xeta PKK ê ya niha min li wê derê zelal dikir. Pir seyr e. Ez her roj dihatim Anitkabirê (ser gora Ataturk) û diçûm. Min her roj ev der ziyaret dikir. Ez bawerim min nakokiyên xwe yên hindirîn hîn baştir li wir dîtin.

Min di navenda Kemalîzmê de li binya Anitkabîrê biryargeh ava kiribû.

Di destpêka sala 72’ an de hîn meyla min a komê zelal nebibû. Ez hizirîbûm lê min neda bû der. Lê belê gavên koma me ya girîng dihatin avêtin. Di sala 72 -73’ an de min xwe di aliyê hizirî de kûr dikir. Dixebitim, hevalê Fuat (Elî Haydar Kaytan), Hakî Karer, Kemal Pîr, Cemîl Bayik bibînim. Di wê demê de ev hevalên min ên herî nêz bûn.

## HEVNASKIRINA KOMA ME

**HEVAL FUAT:** Dema ez ketim Fakulteya Zanînên Siyasî ez bi 12’ê Adarê hesiyam. Hukûmetê ciwanên şoreşger kiribûn hedef. Di wê demê de hemû

pêşeng û şoreşgerên ciwan girtîbûn. Min di wê demê de Rêbertî nas kir. “Ji Belgefîlma Dîroka Ji Agir Hatiye Girtin”

**HEVAL CÛMA:** Min û hevalê Kemal Pîr me di zankoya zanistên siyasî fakulteya ziman û dîrok de hev naskir. Em her du di refa yekem de bûn. Di destpêka dibistanê de bi faşîstan re pevçûneke me çêbibû. Di wê demê de heval Kemal got: Hinek heval hene. Ez dixwazin hûn hevnasbikin.  Ew jî Kurdin. Min jî got Madem ku tu dixwazî, ez amademe wan nasbikim. Rêbertî li maleke EMEK ê dima. Maleke li qata jêr bû. Em çûn Rêbertî ne li mal bû. Hevalê Hakî Karer û birayê wî Bakî Karer hebû. Wekî din jî çend heval hebûn, min ew nas nedikirin. Em hinekî rûniştin Rêbertî hat. Heval Kemal got: Hevalê min ji te re behsa wî kiriye ev e. Em bihev dan naskirin.  Piştî me bi hev re xwarin xwar, Rêbertî got: Li ser mesela Kurdîstanê tu çi difikirî? Wê demê zêde zanîna me li ser Kurd û Kurdîstanê tinebû. Min got, em sosyalîst in. Şoreşê dikin. Dema em mafê xwe bigirin, wê Tirk jî mafê xwe bigirin. Piştî bersiva min Rêbertî keniya. Kenê Rêbertî bala min kişandibû.

Piştre nêzî 5 demjimêran li ser Kurd û Kurdîstanê axifî. Ev axaftin bandoreke mezin li ser min çêkir.

"Ji Belgefîlma Dîroka Ji Agir Hatiye Girtin"

**HEVAL ABBAS:** Min Rêbertî di Cotmeha sala 1973 an de nas kir. Li Bexçelîevlerê maleke wan hebû. Hevalê Hakî, Kemal wan hebûn. Ez û heval Cûma ji bo em pirtûkekê bigirin, em çûn mala hevalan. Li wir min Rêbertî nas kir. Bandorên 12'ê Adarê hinek kêm bibûn. Kesên dixwestin bibin şoreşger wusan di xebitîn. Em li der û dorê li pirtûkan digeriyan. Pirtûk pir kêm peyda dibûn. Hevalê Cûma ji min re gotibû: "Em dikarin ji vir pirtûkan bigirin". Dema em çûn Rêbertî jî li mal bû. Çarmêrkî rûniştibû, pirtûk dixwend. Mal bêdeng bû. Ji diliyek hebû. Her kesî dixwend. Me li wir hev naskir.

"Ji Belgefîlma Dîroka Ji Agir Hatiye Girtin"

**HEVAL KARASÛ:** Di sala 1973' an de li dibistanê nûnerên xwendekaran dihatin hilbijartin. Gelek ji wan, ji min pirsîbûn. Digotin "Tê dengê xwe bidî kê/î?"

Min got "Ez ê dengê xwe bidim şoreşgeran".

Digotin evkes dixwazin ciwana bixin nava serpêhatiyan. Yê ku pêşengiya vê dike APO ye, RIHAYÎ ye. KURDPERWERE. Piştî van axaftinan ez hêrs bûm û çûm cem Rêbertî. Min silav dayê û min got:

"Em şoreşger in. Bişoreşê, wê gelê Tirk û Kurd rizgar bibin. Niha ferqa Tirk û Kurdan ji ku derketiye"?

Dema ez wisa biheyecan axivîm Rêbertî ji rewşa min fêm kir û got:

"Em dixwazin şoreşgeran di şopa Mahîr û Denîzan de bimeşînin".

Min APO'yê Rihayî, ciwanê şoreşger, serokê ciwanan bi vî awahî nas kir. "Ji Belgefîlma Dîroka Ji Agir Hatiye girtin"

**SAKÎNE KARAKOÇAN:** Li Karakoçanê civînên gel dihatin lidarxistin. Hevalan banî min jî kiribûn. Lê min ne dizanî wê kî/ê civînê çêbike. Cara yekem di wê civînê de min Rêber APO dîtibû.

Rêbertî banî min kiribû. Lê min ne dizanî Rêbertî banî kiriye. Min hevalê Xeyrî û Kemal baş nasdikirin. Gelek bibandor bûn. Lê belê berpirsiyarê ku nû hatibû cûda bû. Dema em vegeriyan hevalê Delîl ji min pirsî û got:

" Êê, te ew naskir!?

Dema hevalê Delîl ji min re got "ew APO'ye, min pakêta di destê xwe de avêt û min got: Ez ê vegerim gel APO.

"Ji Belgefîlma Dîroka Ji Agir Hatiye Girtin"

**HEVAL SARA:** Rasthatineke pir xweşbû. Heval li maleke nêzî mala me diman. Civînek dihat lidarxistin. Heya nava bexçeyan xwendekar kom bibûn.  Xwendekaran mal kirê kiribûn. Heval jî diçûn û dihatin. Bandora jiyana van hevalan li taxê û li me hemûyan kiribû. Ji diliyeke wan a pir mezin hebû. Di wê navberê de min bi wan re têkilî danî. Di wê demê de min Rêber APO nas kir.

## ŞERT Û MERCÊN ENQERÊ

Di wê demê de hemû şert û mercên Enqerê ev ji min re digotin; - "Tu dikarî dest bi vê şoreşê bikî. Ceribandinên te, dikarin te bidin meşandin. Herî kêm tu dikarî di nava sempatîzanên koma sêyem de pêşengiyê bikî. Di encam de min ev gotin guhdar kirin û dest bitêkoşîna bêhempa kir".

Di dema girtinê de, dewletê xwestibû min bisezayeke giran, bidin sezakirin (ceza). Lê belê biser neketibûn. A rastî wê demê Bakî Tux bixebata min hesiya bû. Lê nikaribû tiştekî bike. Çalekiyên min heya astekê hatibûn. Serhildêriya li hemberî dewletê, li wir destpêdikir. Mîlîtanên jîr hatibûn şehîd xistin. Ên mayîn hatin helandin. Di asta dawî de, em hebûn. Ango di rêza sêyem de, em hebûn. Dewlet bi yên mezin re mijûl dibû, em ne didîtin. Min jî ew dem baş dinirxandin.

Di destpêka sala 73' an de min nirxandinên xwe yên dagiriyê pêşxistin. KURDÎSTAN BINDEST E.

## 20 SALIYA MIN

Êdî rêya min eşkere dibû. Hemû lêgerên min dibûn taybetmendiyên baweriya kesî û derî ji min re didan vekirin. Min pir caran bidizîka, di guhê hevalên xwe de ev gotin digot. Min pir bitedbîr û veşartî digot. Lê wan jî digotin, me zûde ev digotiye. Derew dikirin. Cara yekem me digot û hêdî hêdî axaftinên me cihê xwe digirtin. Li derûdora van axaftinên me, koma me jî ava dibû. Ev dema 20 saliya min tê bîra min.

Carna dema ez li ser giran bûm, min ji xwe dipirsî;

-"Ma ger niha leşker werin tu dikarî li berxwe bidî? Lê ez wê demê weke kevroşkan bûm. Tiştekî min tine bû. Leşker bihatana, min nedikarî tiştek bikirana. Min gelek pirs di serê xwe de dibirin û dianîn. Min digot ma tu dikarî şerê welatan bikî?".

Li nava zeviyan digeriyam. Dilê min weke yê kevroşkan di avêt. Min digot;

-"Di van deveran de tu çawa dikarî şer bikî? Lê bitena xwe şer nayê kirin. Divê hêza şer were rêxistinkirin. Ruhê mezin yê rêxistinkirinê hebe. Zehmetiyên pir mezin, werin derbas kirin".

Min gelek pirs ji xwe dikirin. Heya niha jî wan pirsan dipirsim û hîn jî min bersivên têr negirtine. Şer bivan pirsan destpêdike. Gelek tiştan dihizirim ji bo şer û ji bo gel. Ev pirs hemû li ser hevû du kom dibûn, li ser dilê min dihatin nexişandin û vedigeriyan zanebûna rêxistinê. Pîvana min a herî mezin yekîtî bû. Ji ber tu kes bitena xwe nikare serkeftinên mezin bike. Divê yekbûna mirovan hebûna.

Min xeteriya çekan dîtibû. Dijwariya çekan dîtibû. Bêvînkirina çekan jî dîtibû. Ji bo vê min dest bitêkoşîna çekdarî ya dijwar kir. Ango di nava bêderfetiyan de min ev kirin. Heya niha jî wisa me. Mirovekî xwedî çek, xwedî çeka azadiyê afirandin, ji bo min daxwaza herî mezin bû.

## CERIBANDINA ADYOD Ê

Piştî wê ceribandineke me Ya Komaleya Hîndekariya Bilind a Demokratîk a Enqerê ADYOD (Ankara Demokratik Yüksek Öğrenim Derneği) çêbû. Bi hemû aliyên xwe ev pêvajo di bin berpirsiyariya min de pêşdiket. Cardin bingehên dev-solê hatin avêtin. Di aliyê din de bingehê dev-yolê hatibû avêtin. Di van her du xebatan de para min jî heye. Ji ber min pêşengiya ciwanên zankoyê dikir. Hinekan ji wan astengî derdixistin, mîna Mustafa Yildirimturk wan. Bi wî re hinek têkiliyên min çêbûn. Hem nakokiyên me hebûn, hem jî me bi hevû du re kar dimeşand. Ne dixwestin em wan derbas bikin. Heya sala 1976' an jî kontrol di destê min de bû. Ji 72'an heya 76' an pêşengiya ciwanan min dikir. Rêbertiya min a pratîkî ji 72' an destpêdike. Ji wê rojê, heya niha min ji leza xwe tiştek wenda nekir. Di bihara 74' an de ez gelek binav û deng bibûm. Derketineke pêşengtî hebû. Zêdetirîn Stenbol bandor dikir. Kesî fam nedikir, ez ji bo Kurdan an jî ji bo Tirkan dikim. An jî ez çiqasî di nava xebata dev-yol, dev-sol de me. An jî ez di nava DDKO de me, an na. Min ew çavdêr dixapandin. Ji ber di wê demê de dewletê dixwest dest bavêje xebata me. Li hemberî dijwariya dewletê, ez hişyar bûm.

"Rêberti û hevalê Hakî Karer ji bo rêveberiya ADYOD hatibûn hilbijartin. Bi vî awayî li ser bingehê nûbûna ADYOD ê û nûbûna rêveberiyê di bihara 1974' an de li Enqereyê çalekiyên ciwanan ên şoreşger pêşdikevin".

Li ser binbgehên guftugoyên bîrdozî avakirina gurubê pêşdikeve. Rêxistina ADYOD ê ji bo pêşketina komê dibe bingehek mezin.

Di wê demê de gelek rêxistin derketin holê. Her rêxistinek kovar û belgeyên cûrbecûr derdixistin. Ev belge tenê têra perwerdeya kesî nedikir. A rastî xebateke pir ji rêzê dima.

Rêbertî ev rêbaza rêxistina pasîf, rexne kir û rêbazekî pir cûda da meşandin.

Piştî Rêbertî dibe berpirsê ADYOD ê demeke kin, şûnde dewlet bi ser wir de digire. Nêzî 150- 200 kesî digirin. Di encam de ADYOD'ê jî digirin.

Rêbertî rêbazê xwe yê rêxistinê biperwerdekirinên bingehîn derdixist holê. Her malek, her kombûyînek dibû bingehê rêxistinkirinan. Di sala 1974' an de di malan de komê xwe perwerde û birêxistin dikir. 2 malên hevalan hebûn.Yek li Yukariayrancak bû.Yek jî li Dîkmenê bû. Berpirsiyarên van malan yek hevalê Hakî Karer bû, yek jî Rêbertî bû.

Rêbertî li zindanê navnîşana mala hevalê Hakî û Kemal Pîr girtibû. Dema derdikeve diçe li wir dimîne. Hevalê Hakî ji bo wê demê wisa dibêje. "Roja destpêkê mêvan bû. Lê roja duduyan bu xwediyê malê û ferman dan me". Di wê demê de têkiliyên Rêbertîyê bi hevalê Xeyrî re jî hebûn." "Ji Pirtûka Waneya Dîroka Partiyê Hatiye Girtin"

## DEMA LI ENQERÊ

Ez li Enqerê tenê bûm. Li derûdora min gelek kesên xayîn û niyetxerab jî hebûn. Gelek belengaz û hêjar bûm. MÎTÊ wê demê ez nirxandibûm. Henekê xwe bi min kiribûn. Carna ez di konferans û civînan de diaxivîm. Ango axaftinên li ser masê bûn. Berpirsên MÎT' ê henekên xwe bi wan axaftinên min kiribûn. Gotibûn;

-"Kesê tenê li ser maseyan diaxive. Ka bila biçe Kurdîstanê biaxive em bibînin". Wan bi xwe ev gotibûn. Piştî nikaribûn tevgera me bibinbixin ev gotinên xwe di anîn bîra xwe. Digotin;

-"Dema mar biçûkbû me serî neperçiqand, niha em poşman bûyîne. Me ew biçûk dît. Wê demê tenê leşkerekî me serê potîna xwe rabikirana, dikaribû ew mar bikuştana. Lê belê me ew biçûk dît".

Bihizirin wê demê dijmin, dikaribû di kevçiyeke av de min bixeniqanda. Lê belê bawer nedikir ku ez ê bihêz bibim. Niha jî wisa ye. Kes bawer nake ku me rêxistineke çiqas mezin ava kiriye. Dibêjin dewletên din alî PKK ê dikin. Lê belê dijmin weke sala 72' an nêzîk

dibe. Cardin bawer nedikirin. Min tenê çavê xwe berdabû serkeftinê û ez biserketim.

Di wan demên min ên xortanî de gelek hizirandinên min çêdibûn. Min berî niha jî gotibû maliyên me ji bo min li keçikan geriya bûn. Ez li dijî wan derketibûm û carekedin ev mijar nehatibû nîqaş kirin. Gelek zora min çûbû. Ma çawa dikarin derkevin xwestina keçikan. Min digot;

-“Wê felaket were serê min û min xwe diparast”.

Ango min ev hewildana malbatê nepejirand. Piştre ez bi xwe derketim lêgera keçikan. Wê demê min xwe dît ku ez çiqas li pêşiya hotê (cenawar) mezin rawestiya me. Keçikên bûrjûwa hebûn. Gelek ji wan, ji bo me heyran jî bûn. Di dibistana Siyasal de gelek keçên sûbay û burokratan hebûn. Bawerim wan ez gelekî diecibandim jî. Ji ber min pêşengiya ciwanan dikir ez dihatim naskirin. Bi min re alîkar bûn. Lê belê nêzîkatiyeke zêde ji bo keçan, ji min re pirsgirêkek bû. Ez qet nêzî keçikan nedibûm. Başbû ku min xwe nexapandibû. Ji ber jin ji aliyê dewletê ve pir zêde dihatin bikaranîn. Heke min dev ji xwe berdana û xwe bixapandana, wê dîroka min jî xelet biçûna. Li derûdora min gelek nakokî hebûn.

1- Hevkariya dijmin a li derûdora min. Ev jî ji aliyê Kurdan ve dihat pêşxistin. Min dixwest vê nakokiyê çareser bikim.

2- Pirsgirêka kemalîzmê hebû.

3- Ev jî pirsgirêka jinê bû. Di navenda Enqerê de li qada MÎT’ê min dixwest van nakokiyan çareser bikim û kelha dijmin ji hindir de fetih bikim.

Li Amedê xorteke ciwan hebû. Kurê miftiyê Lîcê bû. Bawerim navê wî Farûk bû. Hîn di bîra min de ye. Ketibû belaya heskirina reş. Zilam piştre kêrek jî girtibû nava destên xwe. Ketibû pey keçeke ji Edenê. Hemû dibistana Siyasal ser û binê hevû du kiribû. Dibistan biserê me rakiribû. Ji ber hevalê wî nêz ez bûm, hêza xwe ya manewî ji min digirt. Her demê carekê diket nava heskirinên reş. Heya ez ji wê rezaletê rizgar bûm, ez diketim bin erdê. Bihizirin rewşenbîr e, kurê

miftiye, dikeve wê rewşê. Wê kesên din çawa bin? Ku di wê demê de gelek keçikên min jî diecibandin hebûn. Hîn di bîra min de ye. Wusan min ne dikarî navên wan bipirsim. Min ti carî ne dikarî bigotana;

-"Tu çawayî, tu çiqas xweşikî".

Heya niha jî ez nikarim bibêjim. Ev pirsgirêka şêwazekê ye. Ji ber wê demê ez van bibêjim, dizanim sedî sed ez ê wenda bikim. Piştre em derbasî naskirina bîrdoziyê bûn. Me civaknasî, siyaset lêkolîn kir.

## ÇIMA JIN DIHAT BIKARANÎN

Ez hîn di zaroktiya xwe de kesayetekî cuda bûm. Dema hevala min a keçik di zaroktiyê de zewicî bû jî hîn min ban dikirê, min digot;

-"Ka were em bilîzin".

Ez di vî alî de gelek girtîbûm. Lê di lêgerên xwe yên azadiyê de, min ev pêşketinên xwe pir baş destnîşan kirin.

Min li keçên gund mêze dikir. Min dît ku zilamekî bitemen diçe keçek pir ciwan ji bo xwe dibe.  Di wateya mînak de vana dibêjim. Di zaroktiyê de ew keçikên ji bo lîstokan amade bûn, hevalên zaroktiyê bûn. Lê min mêze dikir zilamekî şerek derxistiye. Ji bo aştiya wî şerî divê keçekê bibe. Ger ji xwe re nebe jî wê ji kurê xwe re bibe. Di encama şerê zilaman de keç diçû. Wê keçika hevala min, dixwest hinek tiştan ji min fêr bibe. Lê belê di wê demê de ti hêza min û zanina min a ku min bidana wê keçikê tinebû.

Li gor min ev bêmafiyên mezinin. Çima derveyî vîna keçekê, li ser wê şer tê kirin? Ev ne rêbazeke başbû. Ez hîn jî vî rêbazî biçûk dibînim. Têkiliya kolekirinê ye. Bi min re bihezaran bûyerên wisa hene. Hingî ev nêrîn û hizirîn kombûn û kombûn hatin berhevkirin di encama van kombûyîn û berhevkirinan de têgeha azadiyê derkete holê. Kirêtiyên têkiliyên zayendî hebûn. Li derûdora me, têkiliyên keç û xortan hebûn. Di demeke kin de zewacê heyî berbi pirsgirêkan ve diçûn. Kesên bêkar û bêwar bûn. Ji bo cihazê xwe ji bo nextekê hemû zilamtiya xwe û

hemû ciwantiya xwe dikaribûn bikirana qurban. Pirsgirêkên wisa ên derûdora me hebûn. Li ser van ez gelek hizirîm.

KOMA ME

Di avakirina PKK ê de bîrdoziya dewleta-netewe û tezên Stalîn ên Çareseriya Pirsgirêkên Netewî bandora xwe kiriye. Stalîn di Çareseriya Pirsgirêka Netewan de avakirina dewletê bidest digirt. Ev nêzîkatî hemû pergalên Sosyalîst ên wê demê û Tevgerên Rizgariya Netewî bandor kiribû. Ev nêzîkatî ji aliyê Lenîn ve hatibû pejirandin. Li gor wan Çareseriya Mafê Çarenûsa Netewan biavakirina dewletê dihat encamkirin. Ev bû sedem ku Partiyên Sosyalîst û Komunîst nezelaliya bîrdozî jiyan bikin. Di derketina PKK' ê de biarmanca çareseriya pirsgirêka Netewa Kurd ev nêrîn û modela çareseriyê hatibû dest girtin. Ango modela avakirina dewletê bû. Kûrbûna hizir li gor Sosyalîzma zanistîbû. Lê di nav de kêmahî û lewazî hebûn. Bîrdoziya dewleta netewe û civakbûyîna demokratîk bi hevû du re dihat destgirtin. Hem di nava hevû du de bûn, hem jî tevlîhev bûn. Hemû kêmasiyên modelên din jî girtibûn. Di dema sazkirina partiyê de em ne di wê hêzê de bûn ku di navbera bîrdoziya dewletî û civakîbûyîna demokratîk de cudabûnê bidin çêkirin. Mînakek ku em jê encam bigirin tine bû. Zanebûneke me ya kûr jî tine bû. Bigotina Kurdîstan Bindeste em ketibûn rê. Ev rast bû. Bi vê têgehê ve girêdayî teoriya Şerê Rizgariya Netewî Ya demdirêj hat armanckirin. Ev jî rast bû. Lê di encam de dewlet dihat armanckirin. Hinek mînak li Efrîqayê rojane dihatin dubarekirin. Piştî Şerê Rizgariya Netewî dewletên serbixwe û azad dihatin îlan kirin. Ev di rêya Çareseriya Pirsgirêka Netewa Kurd de jî îdeal bû. Bêyî ku li çareserî û modelên din werin mêzekirin ev bizêdetirîn vekirî dihat dîtin. Wekî din destûra ku ji ostayên mezin bîrdoziya Lenîn-Stalîn dihat girtin, tîmara bîrdozî û qalibên pratîkî pêşkêş dikir.

"Me di van salan de dirûşma KURDÎSTANA SOSYALÎST YA SERBIXWE Û AZAD pir zêde bikar dianî. Rastî bibêjim ku ev dirûşme pir

zêde dilê min germ nekiribû. Tişta ku herî zêde min germ dikir, bihêz dikir rabûna gel li ser piyan bû. Ev gel ji bo şerê xwe, ji bo mafê xwe rabibû ser piyan. Hemû derfetên heyî pêşkêş dikirin. Nirxên xwe yên herî hêja, keç û xortên xwe diyarî vê tekoşîna xwe dikirin. Ma li hemberî gelekî wusan mirov çawa germ nedibû? Mirov çawa bikelecan nedibû? Mirov çawa ji bo vî gelî rêz nedigirt? Tişta min kir ev bû. Ji bo vê sekna wan a bişeref û şerê Heqîqeta rast min jî biaqil û hêza xwe sûd dida. Min ew aqil û hêz bikar dianî. Tu ked û hewildan ji vê binirxtir nabe. Fedakarî û keda vî gelî, ez anîme serxwe. Weke ku ez ji nûve zindî bibûm. Min xwestibû ez vî gelî ji nû ve kifş bikim, beramberî vê gel ez ji nû ve afirandibûm”.

(Paraznameya Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk Pirtûka 5. Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Netewa Demokratîk)

Di pey van amadekariyan de koma me hat avakirin. Di navbera salên 1973 -1976 an de dema amadekariya koma biçûk hat dawîkirin. 1976-1978 dema yekbûna bi gel re hat pêşxisin. Ev her du dem biserkeftî dawî bibûn. Piştî amadekariya koma yekem û girsebûyînê em li ser çawabûna rêxistina xwe rawestiyan.

Wê bibûna tevger? An jî wê bibûna rêxistineke çalekiyên leşkerî? Me ev pirsa teknîkî bibersiva tevgerbûyînê encam kir. Di vê derbarê de mînaka Vîetnamê ya erênî hebû. Ji xwe çalekî jî pêş diketin. Ezmûnên Eniya Çepgirên Tirk ên artêşê hebûn. Li gor Yekîtiya Rizgariya Netewî çalekî dikaribûn bihatana pêşxistin. Ev dibû ceribandinek serkeftî û di nava Kurdîstanê de pêş diket.

Di 12 Îlûna sala 1971’ an de darbeya leşkerî pêşket. Komkujiya gelek rêxistinên rewşenbîr, ciwanên şoreşger û gelan çêbibû. Kadroyên pêşeng ên rêxistinan dihatin tinekirin. Pêşengê THKP-C Mahîr Çayan bi Huseyîn Cevahîr re li Maltepe li ber xwe dabûn. Piştre ji girtîgehê reviya bûn. Bi deh hevalên xwe ve li Kizildereyê hatibûn qetilkirin.

Min dardekirina Denîz Gezmîş û hevalên wî dîtibûn. Di heman demê de min agahiya şehadeta Îbrahîm Kaypakkaya û ya zindana Amedê bihîstibû. Ev bûyer bûn sedem ku ez li ser dîroka xwe ya berxwedanê û rayên xwe bimeşim.

Di destpêka sala 1975' an de li derûdora teza me ya "Kurdîstan Hatiye Dagirkirin"ê de koma me ava dibû. Ji xwe hîn dewlet bi min nehesiya bû. Hinek ferq kiribûn lê digotin ev çi Kurdînî û Tevgere? Zêde cîdî nedigirtin. Ji bo wê jî bi sermede nedihatin. Hêdî hêdî dixwestin me fam bikin û bigirin.

Di wê salê de dewletê hinek agahî girtibûn. Di dadgehkirina hevalê Xeyrî de ev pirsî bûn. Digotin

-"We artêşeke Kurdan ava kiriye. Navê wê çî ye? Armanca we çî ye?".

Wusan nêzî me dibûn. Beriya me binavê PKK ê rêxistinek hebû. Di bernameya wê rêxistinê de avakirina artêşa Kurdan hebû. Tenê ev nav di bernameyê de hebû. Ji ber endamên wê hatin girtin, ew jî têkçûn. Piştre dema me navê tevgera xwe kir PKK gotin van navê me diziye û di qeherîn. Lê me armanca xwe û bernameya xwe pêk anî. Wan dev jê berda bû. Di 75' an de dijmin ev agahî girtibû. A rastî em kêfxweş dibûn. Me digot ma çima artêşeke me jî tinebe. Lê di wê demê de ev derfetên me tine bû. Hemû fikara min ev bû. Min digot zextên dewletê zêde dibin. Mahîr Çayan, Denîz Gezmîş ewqas pêşengên baş bûn. Lê encax mehekê du mehan li ber xwe dan. Hatin girtin û qetilkirin. Min ê koma xwe çawa ji Enqereyê derbixistana, ez li ser wê dihizirîm. Min digot;

Piştî wan lehengên gel, wan pêşengên bihêz heke min artêşek avakiribûna wê di nava hefteyekê de têk biçûna. Mustafa Suphî tevgerek ava kiribû. Piştî mehek du mehan bizorê xwe gîhand heya cihekî, piştre di nava deryayê de hate qetilkirin. Tevgera wî di avê de hate fetisandin. Seyîd Riza di dema xwe de hewildabû, di sêdarê de hate dardakirin. A Mahîr Çayan li Kizildereyê hat qetilkirin. A Denîz

Gezmîş hat dardakirin. Artêşa me jî wê bihatana tinekirin. Mînakeke serhildanên Kurdan ku biser ketibû tinebû. Pêşiya vana hemûyan girtibûn. A me jî pir caran xwestin birêya jinê me bixin û pêşiya me bigirin.

## NAVBERA SALÊN 1075- 1976

"Di çileya 1976' an de li Dîkmenê civînek tê lidarxistin. Di vê civînê de rewşa komê, xebata li Enqereyê tê nirxandin. Di vê civînê de biryara gera Kurdîstanê tê girtin. Bi vê biryarê xeta siyasî, bîrdozî, Rêbertî jî derbasî Kurdîstanê dibe. Biawayeke xwezayî di kadroyan de nûbûnê dide çêkirin.

"Ji Pirtûka Dîroka Partiyê Ya heval ABBAS Hatiye Girtin".

## ŞEHADETA RÊHEVAL HAKÎ KARER

"Kom cara yekem di 1976' an de diçe Dîlokê. Hevalê Hakî di payîza sala 1976' an de diçe Dîlokê. Di civîna 1977' an ya li mala Pîlot hat lidarxistin de heval Hakî alîkarê Rêbertî hatibû hilbijartin. Wekîdin li Riha, Amed û Êlihê jî xebat dida meşandin.

Piştî civîna Dîlokê diqede, Rêbertî cardin vedigere Enqerê. Di navbera vê vegerê de çend roj derbas dibin, agahiya şehadeta hevalê Hakî Karer 18 ê gulana 1977' an digire. Piştî civînên li Kurdîstanê tên lidarxistin, dewlet jî vala na sekine. Di nava şopandineke mezin de ye. Di encama vê şopandinê de Hevalê Hakî tê qetilkirin.

## MERASÎMA CENAZEYÊ FEVZÎ ASLANSOY

Di sala 1976' an de li Surucê binavê Fevzî Aslansoyê ji hêzên rizgariya netewî yê Tirkan ji aliyê MHP' yîyan ve tê qetilkirin. Rêbertî Fevzî Aslansoy ji fakulteya Hacettepe yê dinase. Rêbertî xwedî li cenaze derdikeve. Merasîma cenaze vediguhere serhildanê. Ji bo naskirina tevgera Kurdîstanî ev serhildan gelek erênî bû. Di gelek bajarên weke Riha, Amed, Dîlok û Mereşê serhildan çêbûn. Rêbertî bi

xwe diçe ser cenaze. Belavokan amade dikin û rêdikin. Hevalê Xeyrî van belavokan dibe Sûrûcê. Di rê de tê girtin. Di encam de li Sûrûcê serhildaneke pir mezin pêş dikeve. Di vê serhildanê de cara yekem durûşma JI KURDÎSTANÊ RE AZADÎ tê gotin".

## ŞEHADETA AYDIN GUL Û MAHÎR CAN

Di destpêka sala 1977' an de li Dêrsimê xwendevanekî binavê Aydin Gul şehîd dikeve. Dîsa li Qersê xwendevanekî amadeyî binavê Mahîr Can tê qetilkirin. "Ji Pirtûka Waneya Dîroka Partiyê Hatiye Girtin"

## ŞOPANDINA DIJMIN

Di sala 1976' an de piştî ADYOD ê em hewil didin koma xwe cuda bikin. Pîlot tam di wê demê de ji bo venêrîna me bike û agahiyê bide dewletê dikeve nava tevgera me. Li gor rewşa heyî dijmin dibêje APO di hembêza me de ye. Di asteke ku dewlet di xwaze de me. Destwerdana dewletê pêşdikeve. Gelek Kurdên sîxur û hevkarên xwe dixin nava sîxuriyê û rêdikin nava tevgera me. Ew binavê sîxuriyê rêdikin. Ez jî bizanebûn wan digirim û dixwazim bi me re bimeşin. Uslubê min aynen wisa bû. Min digot:

-"Werin birehetiya xwe werin, hûn dikarin bixebitin".

Di şêwaza xwe rêxistinkirinê de modeleke pir nû û cûda hebû. Dixwazim bi van têkiliyên xwe wan ji sîxuriyê dur bixim û bidim qezenckirin. Tam di nava wan sîxuran de bingehê rêxistineke pir mezin davêjim. Ez dizanebûna xeteriya van sîxuran de bûm. Lê bi hemû hewildanên xwe ve hem dixwazim wan qezenc bikim, hem jî dixwazim xebata xwe biawayeke veşartî bimeşînim. Li cem Mahîr Çayan yuzbaşî Îlyas Aydin hebû. Serfermandarê alayê bû. Zilamê şerê taybet bû. Kesên bitaybet dihatin hilbijartin. Wan bizanebûn Mahîr Çayan û hevalên wî kişandibûn nava pevçûnê. Ew heval aciz kiribûn. Bizanebûn kişandibûn nava şer. Piştre jî hemû dan qetilkirin. Li ser me jî pîlangeriyeke wusan xwestin bimeşînin. Pîlot rêkiribûn nava me. Pîlot

rojane pîlansazî çêdikirin. Ji bo min pêşniyar dikir. Min jî ew mijûl dikir û nedihişt wan plansaziya pêk bîne. Lê tevî vê jî min di nava hemû xebatan de ew bikar dianî. Min dizanî ku çiqas pîlot nêzî me be, dijmin bi carkê re bi serme de nayê.

## SALÊN 1977 -1980

Ez tam 12 salan bimaddiyata dewletê meşiyam. Ango beramberî karê min dikir mûçê min jî dihat dayîn. Di sala 1977 û 80' yî de êdî ez ji sazûmaniya dewletê qut dibûm. Di vê dema qutbûnê de li derûdora min gelek hevalên min kom bibûn. Tam di sala 1977 û 78' an de dewletê hewil dida hemû rêxistinên şoreşger û yên Kurd tinebike. Biqasî tê bîra min di wê demê de yek berpisrê DDKO jî hatibû girtin. Birêyeke veşartî ji min re agahî şandibû. Digot;

-"Gelek pirsa wî dikin. Bila hişyar be. Dewlet dixwaze wî bigire".

Di zivistana sala 75 û 76' an de, me dest bi nivîsandina manîfestoyê kiribû. Bi hevalê Mihemed Xeyrî Durmûş re me amade dikir.

## CIVÎNÊN GERA KURDÎSTANÊ

Di sala 1977' an di 1' ê Sibatê de li mala vî zilamî me civînek lidarxist. Me pirsgirêkên nava Tevgerê û Kurdîstanê guftugo kirin. Me deriyê soba xwe vekirî hiştibû. Heke polîsan bisermede bigirtana, me yê kaxizên xwe biavêtana sobê û bigotana em sersalê pîroz dikin. Di wê civînê de me biryara gera li Kurdîstanê girtibû. Hinek erk hatibûn zelal kirin. Bidestpêkirina biharê re ez ê biçûma Agirî, Qers, Dêrsim, Elezîz, Amed, Riha û Dîlokê. Gera Kurdîstanê bû. Êdî piştî van çalekiyan min ev biryar dabû, êdî ez tine jî bikirama ji bo min ne xem bû. Birastî jî dijmin em dişopandin. Ji ber di vê demê de hevalê Hakî qetil kirin.

Ji xwe civîna me biagahdariya dewletê dihat çêkirin. Lê min dizanî di wê demê de min nagirin. Berî wê demê ez girtibûm. Ji ber tinebûna

delîlan ez berda bûm. Ji bo vê min jî ew kes pir zêde bikar dianîn. Piştre dijmin ev gotibû.

-“Me di sala 1978’ an de xetayên mezin kirin”. Fermandarê kolorduya şerê taybet Îsmaîl Selen ev gotibû.

-“Me li hember PKK ê her tim xeta kirin. Me ew biçûk dît”.

Lê ji bo xeta bikin min ew dixapandin. Ev jî birêbazê min ê tekoşînê ve girêdayî ye.

## GERA MIN A KURDÎSTANÊ

Gera me a Kurdîstanê di Gulana 1977’ an de bû. Civîna Karakoçanê di 1 ê Gulanê de bû. Me civîna xwe ya Dêrsimê jî li taxa Dax li qata jêrîn a maleke sê qat çêkiribû. Di wê demê de binavê Hesen Kuş ciwanek rehberê me bû. Di dawiya 1977’ an de hat şehîd xistin. Me sê ger ji bo herema Kutudere û Heyderan çêkiribûn. Li wê derê Kamer Ozkanê nebixêr hebû. Me xwest wî jî erkdar bikin. Em vala derxistin. Sîxurbû. Kontrayekî dewletê bû. Li wir hatibû bicihkirin. Kesekî osta bû. Derveyî wî Seyfî Cengîz hebû. Wî li Enqerê sîxurtî dikir. Kamer li Dersimê sîxurtî dikir. Kesê ku Îbrahîm Kaypakkaya vala derxistibû jî cardin ev bû.

Di bihara 1978’ an de li Elezîzê civîn çêbû. Ez çûbûm mala Aytekîn. Aytekîn hevalekî rêzdar ku divê were bîranîn bû. Mala xwe hemû ji me re vekiribû. Derveyî wê maleke me a du qat hebû. Em du hefteyan li wir man. Li vir pirsgirêka me ya bingehîn rêvebirina rêxistinê bû. Li Elezîzê komîteyên cûrbecûr hatibûn sazkirin. Me ji bo îlana van nîqaş dikirin. Me digot;

-“An em ê weke tevger, van komîteyan îlan bikin, an jî weke tevgera ciwanan îlan bikin. Nîqaşên me li ser vê bûn”.

Sala 1978’ saleke gelek girîng bû. Em diketin pêvajoyeke nû. Derbasî Amedê dibûm. Piştre diçûm Enqerê.

Di sala 1977' de diviya bû min li Enqerê dibistana xwe biqedandana. Komên çepgir ên din wisa bûn. Hinek di xebitîn, çend

kovar û belavok derdixistin, piştre diçûn dibistana xwe. Ji bo min jî ev hatibû amadekirin. Pir zêde dirav didan. Jin hebûn, wan bi xwe dişandin. Lê min tu carî li wan mêze nekir. Min xwe nêzî wan jî nekir. Apartman hebû. Ev derfet hemû dabûn. Ji bo wê digotin;

-"Ev di destê me de ye. Em kengî bixwazin dikarin wî bigirin".

Ez jî weke kurê paşa tevdigeriyam. Lê min ew didan mijûlkirin. Bizanebûn û pîlan tevdigeriyam. Kesekî din bûna wê xwe jibîr bikirana, biketa nava wan. Ji xwe rêbazê ku Uxur Mumcu da kuştin ev bû. Min birêbazê xwe dewlet bikar dianî. Têkiliyên dewletê hemû bikar dianî. Hem jî rêxistina xwe pêş dixist.

Dema hevalê Hakî şehîd ket, em ji Enqerê ketin rê. Birastî jî rêwitiya me hat reşkirin. Me digot;

-"Ji vir şûnde wê çawa be? Em ê çi bikin? Piştî gera me ya Kurdîstanê me hinek encam girtibûn. Me gotibû em dikarin li Kurdîstanê tovên bîrdozî bireşînin. Êdî wê li her derê Kurdîstanê dîroka me şîn bibe. Em ji xwe pir bawer bûn".

Herî dawî li Dîlokê bi Hakî re me civîna dawî lidarxist. Piştî wê civînê me digot êdî me karê xwe bibingeh kiriye. Li ser wê serkeftinê du-sê roj derbas bûn hevalê Hakî hat şehîd xistin. Ev bûyer netenê lêdana yek kesî bû. Pir berfireh bû.

Kesekî binavê Alaaddîn ew şehîd xistibû. Min ew zilam nas dikir. Beradayî bû. Rojekê hatibû Enqerê weke ji çiya nû hatibû. Hat zanîngeha Zanistên Siyasî. Bernameyên dizîyê saz dikir. Eleqeya wî bi Kurdîniyê re tinebû. Dixwest hêza ciwanan bigire nava destên xwe. Her roj vala vala digeriya. Dizek, bê exlaq bû. Wî bûyera hevalê Hakî pêkanîbû. Hevalê Kemal Pîr digot;

-"Em bi hevalên xwe yê kadro re biçin. Bi polîsan re bikevin şerekî giran".

Hinekî hestiyar bû. Piştre me mêze kir wisa nabe û me dev ji vê biryara xwe berda. Heke me wusan kiribûna wê ev bûyer bibûna çalekiya tundiyê ku bal bikişîne ser tevgerê. Me nikaribû êşa xwe bu

tundiyê derbas bikirana. Em neketin wê rewşê. Girêdana bi bîranîna şehîdan re ne hesan bû. Dixwestin em rêya xwe şaş bikin û pêşeroja xwe bişewitînin. Me jî wisa nekir. Gavên xwe bilez û bizanebûn avêtin.

Piştî şehadeta hevalê Hakî derbasî Dîlokê bûm. Min armanc kiribû, rêxistina Stêrka Sor têk bibim. Di nav de nêzî 17 heval hebûn. Min dixwest wan qezenc bikim. Di nava van de kesên ji dil û durust jî hebûn. Hinek ji wan piştre sezaya dardekirinê jî girtin. Wê demê ez çûm û min ew qezenc kirin. Yek du kesên serokên wan hebûn.  Me ew tecrîd kirin. Ên din jî qezenc kirin. Lê di mantiqê xwe de kadroyên PKK ê berdidan hevû du. Navendeke biguman didan avakirin. Cardin tê bîra min li malekê bikombûyîna 17 -18 kesî me civînek li darxist. Gelek ji wan sîxurbûn bûn. Radestî dijmin dibûn û îfade didan.

Ji ber me her tim ev nêzîkatiyên dewletê dişopandin, em neketin xefka wan. Nehatin provokasyonên wan. Di dema amadekariyên derketina derveyî welat de, bizanebûn ez pir baş nêzî van kesên sîxur dibûm. Heta ji bo dema ez derbasî civînên Kurdîstanê bûm di sala 1994 an de, di hinek rojnameyan de wusan nivîsandibûn. Digotin;

-"MÎT APO şandiye Kurdîstanê. Ev nêzîkatiyên hêzên dewletê ji hevû du re bûn. Ji ber ew ji hevû du aciz bûn, ji ber min hevû du tewanbar dikirin. Wan ez neşandibûm Kurdîstanê, lê têkiliyên me dibin venêrîna wan de bû.

Hukûmetê heya salên 1977 -78 -79' an bawer dikirin ku wê min bi rêya jin, dirav û dewletê re, di destê xwe de bigirin. Bi vê tambawer kiribû. Dewletê rojane agahî digirtin. Min dizanî van agahiyan digirin. Min jî agahiyên şaş dişandin. Xeletiya dîrokî ya herî mezin a hukûmetê ev bû. Heya niha jî wisa ye. Her tim biagahiyên şaş dixebite. Wê demê digotin;

-"Çûk di qefesê de ye. Em kengî bixwazin dikarin wî bigirin".

Ez bawerim dema ku MÎT niha vana dixwîne hem ji kena difetise hem jî hêrs dibe.

Pîlot agahî dide wan, dibê çûk di destê me de ye. Hûn kengî bixwazin dikarin bigirin.

Di bûyera 3'ê Hezîranê de sîxurtiya pîlot eşkere bû. Wî Hevalê Karasû dabû girtin. Hevalê Kemal hatibû girtin. Gelek çek li mal veşartibûn. Sezayê her çekekê 30 sal bûn. Diviya bû ez jî biçûma ser wî sozî. Bi hinek rasthatinan ez neçûbûm. Dema min rewşa Pîlot fam kir, ez ricifîm. Piyana çayê di destê min de bû, ket erdê. Bi ser lingê min de rijiya û çoka min şewitand. Ez gelek diricifîm. Min digot:

-"Êdî dawiya me hat".

Min agahî neda kesî û ji Enqerê derbasî Amedê bûm. Bibalafirê hatim Amedê. Amadekariyên îlana tevgerê hat kirin. Me manîfesto di tirmeha 1978' an de, di deh rojên destpêkê de nivîsand. Belavoka îlankirinê berbi zivistanî ve me amade kir. Me civîna xwe ya avakirina rêxistinê di dawiya meha Mijdarê de çêkir. Me got:

-"Em navê xwe bikin PKK".

## KONGREYA YEKEM A GUNDÊ FÎSÊ

Ji bo biranina hevalê Hakî bername hat amadekirin. Di dawiya Mijdara sala 1978' an de li Amedê, gundê Fîsê di asta kongreyê de çar rojan civîn hat lidarxistin. 22 kes beşdarî civîna me bibûn. Diviyabû 25 heval bûna. Lê heval Salih Kendal û du hevalên din ji ber amadekariya Hîlwanê dikirin, destûr xwestin û beşdar nebûn. Ji bo wê bi beşdariya 22 hevalan ve civîn hat lidar xistin. Binavê PKK hatina binavkirin û îlankirin divê civînê de bû biryar.

"Kongreya damezrandina PKK ê, li Amedê, navçeya Lîcê gundê Fîsê di 26 -27 Mijdara 1978' an de hat lidarxistin. Sibeha 26 an destpêkir, êvara 27' an qediya. Rêbertî di Gulana 78' an de ji Enqerê hat Amedê. Ji bo kongreyê berî wê belge hatibûn amadekirin. Divê 25 heval beşdarî vê civînê bibûna. Lê sê heval neamadebûn. Yek ji wan hevalê Mihemed Karasûngûr bû. Yek hevalê Salih Kendal bû. Yekî din jî hebû. Di wê demê de berxwedana Hîlwanê di rojên xwe yên xeter de bû.

Heval pêşniyar dikin ku beşdarî civînê nebin. Ji ber wê li Hîlwanê valatiyeke mezin derbiketana. Rêbertî destûra wan dipejirîne.

Di kongreyê de heft heval ji bo komîteya navendî tên hilbijartin. Ji xwe yek RÊBER APO ye. Kesê din heval Mihemed Karasûngûr e. Kesê binavê Şahîn donmez jî xwe pêşniyar dike. Di nava rêxistina PKK ê de kes xwe ji bo erkdariyê, pêşniyar nake. Ev nêzîkatiyeke exlaqî û têgihiştina tevgerê ye. Lê Şahîn xwe pêşniyar kiribû. Wekî din di vê komîtê de, Heval Cûma, Heval Xeyrî, Heval Mazlûm û Bakî hene. Piştî kongreyê komîteya navendî ya di kongreyê de hat hilbijartin, di nîsana 1979' an de li Amedê Taxa Ofîsê Apartmana Gunaydin de tê çêkirin. Di vê civînê de navê PKK (PARTIYA KARKERÊN KURDÎSTAN) tê dayîn. Di 30 Hezîrana 1979' an de tê îlankirin.

Di 30 yê Hezîrana 1979' an de li Sîweregê li hember Bucakê zilimkar çalekî tê pêşxistin. Heval biçalekî û helwestên xwe di nava gel de bandoreke erênî didin avakirin. Di wê çalekiyê de Celal Bucak nemir. Heval Salih Kendal ji lingê xwe birîndar bû. Pîştre Şehîd ketibû.

Di sala 23 çêlê 1978' an de dijmin qetliyama Mereşê çêkiribû. Ev ji bo Kurdîstanê gefxwarina yekem bû. Me rêxistin îlan kir. Wan piştî mehekê ev qetliyam kir. Ango wusan digotin.

-"Heke hûn gava xwe zêdetir bavêjin em ê we qetil bikin".

Di encam de li Meletî, Semsûr û hemû derên Kurdîstanê ev qetliyam pêk anîn. "Ji Nirxandinên Heval Abbas a Diroka Partıyê Hatiye Girtin ".

## BI RÊHEVAL FERHAT KURTAY RE

Di 7'ê Nîsanê de ez û hevalê Ferhad Kurtay çûn Mêrdîn Qoserê. Nêzî mehekê ez bi vî hevalî re li Qoserê gundê Xursê mam. Piştre dijmin pê hesiya bû û xistibûn bin êşkenceyên pir giran. Piştre hevalê Ferhad bi çalakiya xwe şewitandinê ve, di nava refên şehîdên azadiyê de cihê xwe yê herî pîroz girt.

Di 23'yê Mijdara 1979' an de bi heval M.Xeyrî Durmûş û hinek hevalên din re li malekê ne. Di wê malê de tên girtin. Di şeva 17 û 18'

ê Gulanê de li hember zilm, êşkence, bêmafî û hemû kiryarên hovanê li zindana Amedê di Qawîşa 33. de bi sê hevalên xwe re bedena xwe dide ber agir. Xwe dike rêhevalê Mazlûmê hemdem û agirê azadiya Kurdîstanê.

## RÊWITIYA BI HEVAL MEHMED KARASÛNGÛR RE

Piştre bi heval Mihemed Karasûngûr re derbasî Riha bûm. Bizor û zehmetiyeke mezin encax em mehekê li Rihayê man. Tu dera ku em biçinê tine bû.

Li her derê li me digeriyan. Komkujiyên gel dabûn destpêkirin. Me bi heval Karasûngûr û hinek hevalên din re pîlansazkirîbû ku li Sîweregê berxwedanê pêşbixin. Heta em li ser avakirina yekîneyeke gêrîla jî rawestiya bûn. Me rêvebirnameya wê amade kiribû. Çareya me ew bû. Her ku dem derbas dibû dijmin derûdora me teng dikir, me jî ji neçarî li berxwe dida.

Her ku dem derbas dibû çepera derdora me teng dibû. Em li Rihayê bûn. Cihekî me yê xewkirinê tinebû. Hinek hevalan digot;

-"Em li Dîlok an jî li Wanê malekê bigirin. Ji xwe em ji Amedê derketibûn. Li Rihayê encax me dikaribû çend rojan bimana".

Vê carê jî li cem min hevalê Mehmed karasûngûr hebû. Em 40 rojî li Rihayê man. Ev mayîna me, weke ya hz. Îbrahîm bû. Me laneta Nemrûdan heya hestiyên xwe jiyan kir. Di wê demê de şehîdê me yê sêyem heval Ethem Akcan bû. Halê wî yê dawî qet jibîra min naçe. Pîroziyên berê di anî bîra min. Hevaleke rast, jîr bû. Di karê xwe de serkeftî bû. Sembola xwe perwerdekirina rast bû. Nefesa xwe ya dawî jî bi vê rastiyê ve girêdayî da.

<u>"Ji Paraznameya Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Netewa Demokratîk Hatıye Gırtın"</u>

Min ji hevalê Mehmed Karasûngûr re gotibû;

-"Em dikarin di vê hefteyê de derbikevin. Li derveyî sînor mirovên hevalê Mehmed Karasûngûr hebûn. Min hevalek ji bo kifşê şandibû".

Pêvajoya 1973’an heya 1978’an dema amadekariya Têkoşîna Rizgariya Netewî bû. Êdî gavên partîbûnê dihatin pêşxistin. Di 1978-1980’ an de digihêje girtina nasnameya xwe.

## GIRTINA HEVAL MAZLÛM

“Di sala 1979’ an de Hevalê Mazlûm Doxan di xebata çapemeniyê de cihê xwe digire. Di meha Îlûnê de fermaneke berfireh a Rêbertiyê ji derveyî welat tê. Wê demê heval li Dîlokê ye. Diçe fermanê ji Sûrûcê digire. Divê wê bigihîne Mêrdînê. Bi Aysel Çurukkaya, Yildirim Merkît û şofor re diçe. Di rê de polîs wan disekinînin. Polîs dibêjin: We ev keçik revandiye. Ji bo wê wan disekinînin. Lê belê dema li wesayîtê baş digerin wê fermana Rêbertiyê dibînin. Di 1’ê Cotmeha 79’ an de hevalê Mazlûm tê girtin. Li hember zilim, êşkence û darbeyên dijmin, hevalê Mazlûm Doxan di 21’ê Adara 1982’ an de çalekiya xwe şewitandinê pêk tîne. Çalekiya hevalê Mazlûm, wan êrîş û nêzîkatiyên dijmin bi xwe jî dişewitîne.

“Nirxandinên Heval Abbas Li Ser Dîroka Partiyê”

## SALÊN 1979 -80

“Di navbera salên 1979-80’î de Rêbertî weke bersiva komkujiyên gel ku ji aliyê komara faşîst ve dihatin pêşxistin, dixwaze çalekiyan bide pêşxistin. Bi vê armancê kom derbasî welat dibin. Di Gulan û Hezîrana 80’î de kom derbasî welat dibin. Li gor pîlansaziyê, wê li sê qadên welat şerê gêrîla were destpêkirin. Komek diçe Rojavayê Kurdîsanê: Mereş, Semsûr, Meletî, Engîzek, Nûrhaqan. Berpirsê vê komê hevalê Mehmed Sewgat e.

Komek diçe Dêrsimê, berpirsê vê komê Hevalê Delîl Doxan e. Di pevçûnek li vir de şehîd dikeve.

Komek bi rêya Sêrt-Êlihê ve derbasî Botanê dibe. Berpirsê vê komê hevalê Kemal Pîr û Hevalê Egîd e’. “*Nırxandınek Taybet”*

## CARA SÊYEM GIRTINA HEVALÊ KEMAL PÎR

Di bihara 80’ î de hefteya sor tê îlankirin. Hevalê Kemal û Hevalê Egîd diçin Êlîhê. tirimbêla wan bilez diçe. Di rê de nokteya polîsan bilez derbas dikin. Ji bo neyên girtin her du heval xwe ji tirimbêlê diavêjin. Hevalê Egîd birîndar dibe lê xwe xelas dike. Hevalê Kemal ji ser heşê xwe diçe û di 8’ê Tebaxa 1980’ yan de cara sêyem tê gitin.

Hevalê Kemal ji Deryareş –Gumuşxaneyê bû. Li Enqerê fakulteya erdnîgarî ya ziman û dîrok xwendibû. Hevalê Cuma jî heman beş xwendiye. Hevalekî heya dawî fedakare. Li cem hevalê Kemal axaftina na tine bû. RÊBER APO jî li cem mala wan a xwendevanî maye. Ji xwe dijmin pê hesiyabû ku çûne derve perwerde dîtine, vegeriyane welat, cara yekem li Ordu-Ulubeyê hatibû girtin û ji wê girtîgehê reviya bû. Cara duyem ji girtîgeha Rihayê direve û diçe qada Rêber APO.

‘Ji Pirtûka Waneya Dîroka Partiyê Hatiye Girtin’

## DERKETINA JI RIHA

Di navîna sala 1979’ an de min ji Ethem Akcanê Sûrûcê re gotibû, tuxîp amade bike. Li Rihayê 40 rojan li benda rê mam. Berî wê di 5’ ê sibehê de bidengê surûdan ez şiyar bûm. Min fam kir ku hêzek dagirker bi ser me de tê. Di wê demê de, mala em lê diman qaşo biryargeha şer bû. Textek hişk bû û bataniyek li ser bû. Şehîdê me yê hêja M.Seîd û Ethem Akcan ev mal girtibûn. Me textekî darîn û hesîreke naylon anîbû. Maleke veşartî bû.

Belê faşîzm bi ser me de hat. Me jî xwe wusan parast. Mirovek çiqas di tengaviyê de be jî cardin dikare jiyana xwe pêş bixe. Me ew salên şer ên bêhempa bikelecaneke mezin ji bo xwe dikirin roman. NIHA ROMANA WÊ TÊ XWENDIN.

Tam weke rewşa Îbrahîm Xelîl bû. Min gelek pûtên modernîteyê û Şaristaniyê şkandibûn. Di van rojan de hemû Nemrûd rabibûn ser piyan. Lê ez li bajarê wan Nemrûdan bûm. Ev jî tiştekî seyîr bû. Ez li ser

şopên Îbrahîm ên ji Rihayê derketinê de bûm. Di pirtûka pîroz de navê Sûrûc SERÛC derbas dibe. Hema hema wek wan demên serhildanan dihat jiyankirin. Di vê navberê de ez derketim ser kelha Riha yê. Ji serî heya dawî li kelhê geriyam. Di efsaneya Îbrahîm de behsa manciniqa ku pê tê avêtinê dikirin. Ez di navbera her du sutûnên wê de demek dirêj sekinîm. Min li jêr temaşekir.

Piştî çend rojan Ethem got:

-“Ji bo derketinê şert û merc amade ne”.

Tişta digot amadekarî jî tenê em ê li tirimbêleke gund siwar bibûna! Em siwar bûn. Bi gundiyan re em li gundekî tuxîb peya bûn.

Heya niha ez dihizirim ku li wê tirimbêla modernîteyê siwarbûn çiqas rast bû? Ez gîhaştim vê encamê: Biamêrên modernîteyê karkirin, xwe radestî wan kirin, ji radestiya mejî û hizir xerabtir bû.

Ber êvarî gava duyem a amadekariya Ethem hebû. Kesek binavê Cehnî hebû. Ji me re got HAYDÎ û em şiyarkirin.

Derveyî mezinbûn û girîngiya armanca me ti tiştekî din nikaribû me li ser piyan bihiştana. Ger fedakariyên Ethem nebûna, ez li wir tine bûm. Mirov encax di van deman de wateya pêwîstiya civakîbûnê, rêxistinbûnê, kedê, naskirina têkiliyekê dibîne û fam dike. Kesên van deman jiyan dikin, dikarin mafê van têkiliyan bidin. Di PKK ê de herî zêde min ev rastî û ev heqîqet jiyan kir. Têkiliyeke biçûk carna ji şerê meydanan ê mezin bihatir bû. Beramberî hemû durustiyan, bedelên biêş ên pir giran hatin dayîn. Tê zanîn qebîleya Îbrahîm jî di rê de gelek zehmetiyan jiyan dike. Ya me jî di wateyekê de qebîleya hemdem bû. Zehmetiyên wê di heman rêyê de heta di heman mekanê de hatin jiyankirin. Derketina me di aliyeke xwe de dişibiya derketina Musa ji Misrê derketibû. Ji xwe heman qebîle bûn.

Ev xeta Heleb, Şam, Qûdus û Misir ji dema fîravûnên Misir û Sûmeran ve heya niha bihezaran cara bûne şahidê van çîrokan. Li gor min vê xetê dîroka mirovahiyê eşkere kiriye. Derketina min, derketina me ne rasthatinbû. Bikombûyîna hemû demên krîtîk pêk dihat. Yek ji

wan derketinên dîrokî ku di encama van zehmetiyan de dihat dubarekirin bû”. “Ji Paraznameya Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Netewa Demokratîk’

Belê di wê demê de bi zor û zehmetiyên mezin me hewilda ku em di rojhilata navîn de cihê xwe biguherin. Hêza me pir kêm bû. Ew hêz di nava wan zehmetiyan de hemabêje diheliya. Ev li ser dilê min û li ser temenê min zexteke çawa çêkir? Gelek giran bû. Min digot;

-“Ji destê min dîrok diçe, hêviyên min ên herî xweşik diçin, tu çend heyvan li berxwebidî jî têrê nake. Çareyekê bibîne. Ka biçe pişt wî sînorî. Li wir, li piştî wan çiyayan çi heye? Min ev pirs ji xwe kirin û bersiv dan”. Min hevalê Karasûngûr ji bo artêşê amade dikir. Çend rûpel perspektîf nivîsand û berê wî da Sîwerekê. Min got;

-“Heke hûn tengav bûn wêdetira we çiyane. Hûn dikarin derbas bibin. Bi rê ya gêrîla hûn dikarin ji wir derbikevin”.

Bihizirin çiqas amadekariyeke kêm bû.

Li gor wê demê ev çareyek bû. Şert û merc giran dibûn. Min bangî hevalê Ethem Akcan kir. Min got;

-“Ka biçe pişt wî tuxûbî mêze bike. Ka wê rêyek hebe an na? Ev di heman rojê de dibin. Roja din çû. Vegeriya û got rê heye. Min mêze kir. Li şûna em ê li Tirkiye biheliyana, çûyîna wê derê çareya baştir bû”.

Me di nava xwe de kar parvekiribûn. Hinek heval li Sîweregê hatin erkdarkirin. Ew gavek bû. Çalekiya Bûcak hat pîlansazkirin. Hinek hevalên din jî ji bo xebata rêxistinê hatin amadekirin. Min jî gotibû;

-“Dibe ku ez qenalekî derketina derve vebikim”.

Kesekî binavê Cehnî em di tuxûb re derbas kirin. Em di demeke wisa de derbasbûn ku hemû hêza ser tuxûb di xew de bûn. Di gundê ser tuxûb re em derbas dibûn. Bawerim ew gund bixwe sîxûrên qerekolê bûn. Ez ne birêbazeke şoreşgerî, birêbazeke qaçaxçiyan derbas dibûm. Heta min ji wan re gotibû ez qaçaxa çekan dikim. Zilamê me derbas dikir ji min dipirsî;

-“Tu çawayî? Tê çikarî bikî? Dibe ku ew kes hîn jiyan dikin. Wan ez qet nasnekiribûm. Bitevdîr bûm. Di dilê min de bahoz hebûn. Dilê min radibû. Lê min qet nedida ferq kirin. Heta tam di dema têl derbaskirinê de Cehnî got:;

-“Temam leşker hatin. Me ew amade kirine. Leşker hatin wan bi xwe ew têla sînor rakirin”.

Gotin; -“De zûbikin hemşeriyên min. Lez bikin. Bila fermandar nebîne. Me wisa bixwînsarî tuxûb derbas dikir”.

Li pêşiya min Mehmed Seîd hebû. Digot;

-“Tenê pêl dewsa lingê min bike. Me tenê wisa dikir û em diçûn. Ji ber qed mayinkirî bû. Ev mirov her roj di wir de derbasdibûn. Fêrbibûn. Lê belê ji bo min ew roj û derbaskirina tuxûb, di asta dîrokî de bû. Ez RÊBER bûm. Nav û dengê min derketibû. Lê belê di vê rê yê de ji şopa hevalê Seîd dernediketim. Her kesî rêya xwe dizanibû. Min jî wê demê mayin nasnedikirin. Ev rêbazê leşkerî bû. Me serhildanek kiribû. Diviya bû li gor rêgezên leşkerî em derketana. Ev bi xwe çareyek bû”. Cara yekem li mala mirovê hevalê Ethem Akcan li Kobaniyê em man.

## DI MEHA KANUNA 1979’ AN DE LI ROJHILATA NAVÎN BÛM

Di heyva çile rojên destpêka sala 1980’ an de li komeleyek Filîstînê bi zor û zehmetî me koma xwe anî cem hevû du. Buroya eniya demokratîk bû. Di wê demê de ev ji bo min destxistineke girîng bû. Bi rastî jî hevalên me nizanin, destkeftin çawa ne. Ji bo min pir girîng bû. Ji ber me serî hildabû. Kesên hatibûn dardakirin, şewitandin, girtin, kuştin û wendakirin hebûn. Me jî li vê derê ev derfet ji bo xwe ava dikir.

## ME HÊVIYÊN XWE Û SEBRA XWE MEZIN DIKIR

Ev destkeftin pir girîng bû. Navê min wê demê ELÎ bû. Kesî ne ez, ne jî rêxistin nas nedikirin. Tu derfetê me jî tinebûn. Me derfetên herî

biçûk ji bo xwe bikar dianîn. Ji bo em hinek hevalên xwe rêkin Beyrûdê birojan em disekinîn. Ji ber rêyên wê biberfê hatibûn girtin. Bizehmetiyên pir mezin me hevalên xwe derbasî wir kirin. Xortekî Filîstînî hebû. Wî camêrî bidestan îşaret da me û em derbas bûn. Me tenê bi îşaretan tevger dikir. Wateya van rojan pir hêja bû. Weke em di rojên tariyê de dimeşiyan û me rojên xwe yên xweş amade dikirin. Me hêvîdikir ku em ê rojeke din jî jiyan bikin. Bi vê hêviyê em ketibûn vê rêya zehmet. Me hêviyên xwe mezin dikirin. Ji bo em bigihêjin encamê, me sebra xwe mezin dikir.

Dema em hatin Beyrûdê, tenê çend têkiliyên me hebûn. Me xwe bi wan ve dabû girêdan. Hîn me ji xwe re cîh nedîtibû, ban çend hevalên welat jî kiribûn. Ev ji bo me çalakiyeke mezin bû. Bi rojan em xebitîn, me xwe gîhand vî alî, wî alî, wan kesan, filan kesan û cihê xwe çêkir. Bi rojan û biheyvan em nesekinîn. Hîn jî em nasekinin.

Di encam de hûn dizanin me li Lubnanê dewreyên xwe yên perwerdehiyê dest pêkirin. Hevalên pir baş û birûmet hebûn. Tê bîra min, kevneşopiyên şoreşgerên Filîstînê li wir gelek zindî bûn. Kesên ku bişoreşê bawer dikirin û dixwestin tiştan bidin me hebûn.

Di germa havînê de li wan çiyayên xweşik ên Lubnanê di pêşengiya hevalê Kemal Pîr de me dewreya xwe ya perwerdehiyê destpêkir. Hevalê Kemal fermana yekem da. Di bihara 1980’ an de, berpirsê yekem ê koma vegera welat hevalê Kemal bû. Piştre di 1981- 1982’ an de derbasî Lubnanê bûn.

Di sala 1980'an de dewreyên perwerdê hatin pêşxistin. Cih hatin girtin. Dikarim bibêjim ev sala min piranî li Lubnanê derbasbû. Li ser perwerdê hevalê Kemal disekinî. Hevalê Kemal ji girtîgehê reviya bû. Di pêşengiya hevalê Kemal de me komên xwe yên yekem bihejmarên 30- 35 kesî dişand welat. Hinekî rista xwe jî lîstibûn. Belê di van salan de me xebatên girîng dikirin.

Li hundir heval dibin êşkenceyên giran de bûn. Ew dem tên zanîn, îxanetek giran hebûn. Bisedan, bihezaran xistibûn bin bandora xwe.

Çend heval ji bo parastina rumeta xwe çalakî pêşdixistin. Li çiyayan hinek komên gêrîla hebûn, li berxwe didan. Weke tê zanîn di sala 1981' an de konferans hat lidarxistin.

## BERXWEDANÊN ZINDANAN

Wateya wê berxwedaniyê, ji bo pêşî li fetisandina mezin girtin bû. Pêvajo berbi demekî pir giran ve diçû. Êrîşên dijmin ji hemû astan hatibû derbaskirin. Li hemberî vana tenê tişta ku were kirin, encax çalekiyeke wisa bû. Ev çalekî dibe çalekiya biwate, di rojeke biwate de tê pêkanîn. Di roja nûvejînê de pêk tê. Di 21 ê Adarê de. Birastî jî ev çalekî ji bo Kurdan, di asta dîrokî de bû mîlada Kurdan. Pir baş tê zanîn ruhê berxwedaniya PKK' ê ji vê çalekiyê bingehê xwe digire. Bandora xwe li welat dike. Ev dibe berxwedana Şerê Rizgariya Netewî.

Dema ji dadgehê vedigerin zindanê, ev agahî li her derê belav dibe. Her wiha di germahiya Tirmeh û Tebaxê de, di nava wan dîwarên beton de berxwedaniya mirovahiyê destpêdike. Hevalê Kemal yekemîn şehîdê vê çalekiya vîna mirovahiyê ye. Piştre Hevalê Xeyrî, hevalê Akîf Yilmaz û Hevalê Elî Çîçek şehîd dikevin.

Piştî vê çalekiyê dijmin neçar dimîne, mafê parastinê dide girtiyan. Ji xwe armanca hevalê Xeyrî û Hevalê Kemal ew bû ku piştî van şehadetan zêde şehadet çênebin. Berî wê bername kiribûn.

Ew çalekî jî hat kirin. Hem zext hebûn, hem jî îxanet hebûn. Encax mirov bicanê xwe dikaribû rêxistin biparastana. Koma zindanan vê çalakiya xwe li dardixin û bi ser jî dikevin. Hevalê Mazlûm destpê dike, Kemal û Xeyrî jî berdewam dikin. Bi Ferhadan (Ferhad Kurtay) tê berdewamkirin. Lê bala xwe bidinê, ne tenê li hember êrîşên dijmin e. Li hemberî îxaneta hindirîn e jî. Di nameyên xwe de gotibûn:

-"Gav bi gav bi ser me de tên. Dixwazin me bikişînin nava xeta îxanetê. Derveyî vê çalekiya me tu bijarteyeke din tine ye". Wisa dibêjin û çalekiya xwe pêktînin.

“Hevalê Xeyrî di dadgeha bingehîn de mafê axaftinê digire û dibêje:- “Di 14’ê Tirmeha 1982’ an de em dikevin rojiya mirinê”.

Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk Pirtûkan 5. Ya Bi Navê Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Netewa Demokratîk)

## KONFERANSA YEKEM 15 - 07- 1981

Di dawiya sala 1981’ an de me konferansa xwe ya yekem pêk anî. Ji bo min ezmûneke girîng bû. Rapora polîtîk a ji bo wê min amadekiribû û pêşkêş kiribû, bi halê nivîskî hîn heye. Ji bo famkirina demê belgeyek baş e. Yek ji gavên komkirina rêxistinê ya ji dil e. Bîranîna wê, beşeke binirx a jiyana min e. Lê pirsgirêk ewqasî zêdebûn, diviyabû mirov weke matorê bîrdozî, rêxistin û çalekî biafirandana.

## KONGREYA DUYEM 20 -25 Ê TEBAXA 1982

Kongreya Duyem di 20- 25’ ê Tebaxa 1982’ an de hat lidarxistin. Di nava xakên Suriyê, nêzî tuxubên Urdunê, li wargeha binavê ENİYA GEL hat lidarxistin. Ev herêm dibin seroktiya Georg Habeş de bû. Bigiştî 60 delege beşdarbibûn. Di vê kongreyê de, biryara vegera welat hatibû girtin. Gelek heval derbasî welat bûn. Gelek heval jî ji bo perwerdê hatin kişandin. Lê biawayeke giştî biryara vegera welat hatibû girtin. Di wê salê de hemşeriyekî min binavê Ednan Zincîrkiran li rexê ava feradê hatibû girtin. Di wê kêliyê de yûzbaşiyek jî bi xwe re girtibû û xwe di zinaran de avêtibû. Ev bûyer weke êşa dil heya niha, di dilê min de ye. Agahiyên wusan, ewqasî zêde bûn. Min êşa hemûyan di kesayeta xwe de derdixist. Ji xwe Kongreya sêyem tam bû kongreya dadgehkirinê. Her kesî hevû du didarezand. Gelek heval piştî vê kongreyê derbasî welat bûn. Gelek jî hatin qada me ya perwerdê.

## GÊRÎLAYA YEKEM A JIN RÊHEVAL BESÊ ANÛŞ

Di têkoşîna azadiya gelê Kurd de, Gêrîlaya yekem a jin Rêhevala Besê Anûş e. Rêhevala Besê kevneşopiya berxwedana Besêyan a 1938' an di kesayeta xwe de zindî kiribû. Rêhevala Besê di sala 1961' an de li gundê Esmapûrû girêdayî Pazarcik Elbîstanê ji dayik bûye. Zaroktiya xwe li Pazarcikê derbas dike. Di wê demê de derfeta xwendina dibistanê ya keçikan pir kêmbû. Hevala Besê heya dibistana navîn refa yek dixwîne. Di temenê biçûk de, tê zewicandin. Di wan salên ciwantiya Rêhevala Besê de, li Tirkiyê û cihanê rewşa siyasî weke bahozan dimeşe. Di sala 1970' an de li herêma Pazarcikê nakokî û nîqaşên Elewî û sunî, çepgir, rastgir, Kurd ûTirk pir zêde tên meşandin. Di wan salan de bandorên van nakokiyan li ser Rêhevala Besê dibe. Di sala 1978' an de têkiliya xwe bi Rêxistina Azadiya Gelê Kurd Partiya Karkerên Kurdîstanê PKK' ê re dide çêkirin. Di wan salên Rêxistinkirina PKK' ê de Rêhevala Besê mal bimal di gundan de gel birêxistin dike. Biawayeke çalak beşdarî xebatê dibe. Di demek kin de, weke kesayeteke mînak a jina Kurd di nava herêmê de tê naskirin, heskirin û guhdarkirin. Bibandorbûyîna Rêhevala Besê, di demek kin de herêm tê vekirin. Di dema darbeya 12'ê Îlûnê de ji aliyê dijmin ve kifş dibe, derdikeve Çiyan. Di jiyana çiyayan de, Rêhevala Besê Anûş cardin birêkûpêk, zanebûn û kelecan tevdigere. Bitaybetî di aliyê parastin û ewlehiya Jiyana Gêrîla de bi baldarî tevdigere. Yek ji fermandara yekem a Rêhevalên Jin bû Rêhevala Besê Anûş. Di xeyalên Rêhevala Besê Anûş a piştî Şoreşê de perwerdekirina Jinên Kurd hebû. Di bihara sala 1981' an de li gundê Musolar a Pazarcikê bi dijmin re dikeve nava pevçûnekê û di nava karwanên şehîdên azadiyê de cihê xwe yê birûmet digire. Tu her bijî û tê her bijî Rêhevala Besê Anûş.

*"NirxandinekeTaybet"*

## RÊHEVAL EZÎME (MÎHRÎBAN SARAN)

Yek ji endama arteşa jin a herî birûmet Rêhevala Ezîme Mîhrîban Saran bû. Rêhevala Ezîma ji Vartoyê bû. Dibistana Mamosteyî ya Wanê qedandibû. Li Mûşê mamosteyî ya dibistana seretayî kiribû. Di temenê xwe yê ciwantî de, bi tevgerên çepê Tirka re têkilî datîne. Di salên destpêkê de PKK ê nasdike û biryara tevlîbûna xwe dide. Hevala Ezîma ji şehadeta hevala Ezîma Demîrtaş bandordibe û nave wê digire. Di darbeya 12'ê Îlûnê de kifş dibe û derbasî qada Lubnanê dibe. Bi 20 hevalên jin re perwerde dibîne. Di perwerdeyên leşkerî û siyasî de, gelek pêş dikeve. Hevala Ezîme beşdarî kongreya PKK' ê ya duyem dibe. Piştî kongreyê derbasî welat dibe. Li qada Botanê di nava komên gêrîla de cih digire û bi tevahiya hêza xwe, bi lêgerên xwe yên azadiyê ve girêdayî dimîne. Di nava van salan de erka rêveberiyê kiriye, ji aliyê hevalên xwe ve bihezkirin û rêzdarî cihê xwe girtiye. Yek ji fermandara yekem a artêşbûyîna jin e. Cardin derbasî qada Rêbertiyê dibe, perwerdê dibîne, di sala 1991' ê de derbasî Heftenînê dibe. Di şerê Başûr ê 92' an de parastina eniya Batûfayê hevala Ezîme dike. Di sala 1994' an de li Besta û Herekolê operasyona dijmin derdikeve. Di wê operasyonê de şer û pevçûnên giran tên jiyankirin. Di encama avêtina hawanan de Rêhevala Ezîme tevlî karwanê şehîdan dibe.

## RÛPELÊN DÎROKÊ YÊN ZÊRÎN

Sala 1982' an sala veger û pingava şoreşgerî bû. Di nava vê salê de, dahûrînên girîng hatin nivîsandin. Pirtûka "Pirsgirêkên Kesayetê" hat nivîsandin. Pirtûka "Li Kurdîstanê Rista Zorê" hat amadekirin. Di vê pirtûkê de ji bo sedemên zorê werin fam kirin û pêwîstiya van sedeman were fam kirin, weke ku min ji sed rubaran av komdikir.

Pirtûka li ser rêxistinê hat amadekirin. Di vê pirtûkê de wateya rêxistinê û girîngiya wê hatiye bidestgirtin. "Rapora Polîtîk" hatibû

amadekirin. Di vê de jî nirxandinên 12' Îlûnê hatibûn destgirtin. Cardin xebata pirtûka "Pirsgirêkên Pêşketinan Û Erkên Me"

hatibû destgirtin. Me ev pirtûk li hemberî provokasyona sala 1983' an amade kiribû. Di wê demê de me nêzîkatiyên kesê xwe dikir pirsgirêk û li ser rêxistinê dida zextkirin didît. Me ev biberfirehî dinirxandin.

## KONGREYA SÊYEM A PKK' Ê 25'Ê MIJDARA 1983

Me amadekariyên xwe yên kongreya 3. dikir. Cara yekem me pêwîstiya dahûrînên kesayetê didît. Bi taybet jî dahûrînên taybetmendî û kesayeta jin pêwîstiyeke cîdî bû. Bisalan ez bi wan pirsgirêkan re mijûl dibûm. Diviyabû rewşa Fatma bihata zelalkirin.

Amadekarî hebûn. Em ê biçûna Colemêrgê. Têzanîn wê demê gelek kes bûn asteng. Ji bo wê gavê nedin avêtin, berpirsê TKP'ê şandin nav Kurdîstanê, heya Mêrdînê. Navê wî şoreş bû? Qaşo wê PKK'ê bidana sekinandin. Kurdên İraqê bikardianîn. Wê demê bi KDP' ê re bi Samî Ebdurrahman re têkiliyên me hebûn. Me dixwest yekîtiyê bikarbînin. Ango ketina me ya Colemêrgê wisa nehêsan bû. Bêyî lîstok û provokasyona dijmin nebû.

Tê zanîn, deh heval di çemê Hêzil de şehîd ketin. Rêberê wan kesekî KDP' yî bû. Kesekî komploger bû. Hevalên din li Îranê hatin şehîd xistin. Di serî de hevalê Hemîd, hevalê Karasûngûr li wir hatin şehîd xistin. Heya 82' an ne hiştin li wan deran gav werin avêtin. Dema koma me derbasî Lolanê bû, li ser komê serwerî çêkirin. Xwestin li gor xwe komê bikarbînin. Li hemberî wan şerekî bênavber hat dayîn.

## DILÊ MIN BÛBÛ ÇEND PARÇE

Pêngava 15'ê Tebaxa 1984' an li gor min divê di bihara 1982' an de bihata destpêkirin. Derfetên me ji bo wê destdayî bûn. Darbeya yekem a li gêrîla hat dayîn, ev bû. Gelek kifşên vala, bêserûber hatin pêşxistin. Divê ew rewş were zelalkirin. A rastî me xwest di destpêka

1980’an de bi koma hevalê Kemal Pîr re têkoşîna xwe destpêbikin. Ev lêgerek derveyî hêzên Başûr bû. Yekser derbasî heya çiyayên Dêrsimê dibû. Kemal Pîr biawayeke bêsud û rasthatinî hatibû girtin. Ger ne-hatibûna girtin wê rêbazê fermandariya PKK’ ê ya dema yekem pir cuda bibûna. Ji xwe li ser hev du girtina Heval Mezlûm Doxan, M. Xeyrî Durmûş çêbû. Girtinên qet nepêwîst û nedicih de bûn. Bihesanî dikaribûn bihatana astengkirin. Ji bo me wendahiyên mezin bûn. Dilê me bibû çend perçe.

Di sala 1983- 84- 85’ an de provokasyonên heyî dixwestin encam bigirin. Wan digotin em nahêlin derbasî Colemêrgê bibin. Ev hewildana tinekirina rêxistina me, di sala 1982’ an de, êdî derdikeve holê. Ji bo em teqtîkên xwe derbasî welat nekin, hemû astengî derdixistin. Di wê demê de, Kenan Evren di civîneke Sarikamişê de ji sûbayên xwe re gotibû:

-“Ew pêl cesedê min jî bikin, nikarin welat parçe bikin”.

Hêzên Başûrî jî ev gotin ji bo xwe wisa bikar di anîn.

-“Ew pêl cesedên me jî bikin, em nahêlin ji Başûrê Kurdîstanê derbasî Bakûrê Kurdîstanê bibin”.

Bi vê soza xwe re girêdayî man. Gelek kes dan kuştin. Dan revandin. Dan runişkandin. Ên ku man bi zor û bela di nava berxwedaniya weke zindanên Amedê de man. Dijmin her tim bi van hestên îxanetkar ên KDP’ ê lîst. Di nava şerê Başûr de, bisedan kes hatin kuştin, wendahiyên ne di cih de hatin jiyankirin. Hemû ji ber vê hişmendiya kor a netewperestiya wan e.

## MESÛT BERZANÎ HATIBÛ DÎTINA MIN

Di bihara sala 1985’ an de Mesûd Berzanî hatibû vir. Me 5- 6 caran hevû du dît. Ji xwe min armanca wî famkiribû.

Digot:

-“Eman ha eman”.

Nerehetiya xwe di aliyê me de, pir baş eşkere dikir. Li gor wan, ew ji me biaqiltir bûn. Digot:

-"Eman ha eman, bi ser qerekolan de negirin. Leşkeran nekujin. Eman ha eman".

Gelek tevdîr girtibûn.

Di destpêka kongreya 3. de li hemberî van nêzîkatiyan hat rawestîn. Piştî van êrîşan, wan wendakiribû. Gelek ji wan reviyan, heliyan.

Me di nava xwe de taybetmendiyên mîlîtaniyê hîn baştir da pêşxistin. Ji xwe di destpêka sala 83' an de civîna navendê ya pir girîng hat çêkirin. Di wê civînê de li ser gelek lewaziyan hat rawestandin. Ew lewazî hatin mehkûmkirin. Me hem nirxandina demê dikir, fikarên xwe di anîn ziman, hem jî rexneyên xwe pêşdixistin. Di 84' an de jî me biryara serkeftina mezin da.

Her çiqasî weke daxwazên me nebe jî, me biryara gava 15'ê Tebaxê dayîbû. Tam di wê demê de, dijmin jî ji bo me soz dabû. Biryardayibûn an di 24 demjimêran de, an jî di 72 demjimêran de ku me tine bikin. Me roj dihesibandin. Yek roj- du roj-sê roj…Heya em gîhaştin sala 1985' an. Berî em derbasî 85' an bibin, gelek bûyerên neyênî hatin jiyankirin. Li ser koma ku hevalê Sabrî Ok têde bû komplo hat pêşxistin. Nêvî ji wan hatin şehîd xistin. Nêviyê wan bibirîndarî ketin dest.

Em di sala 1985' an li Rojhilata Navîn bûn. Lî Lûbnanê bûn. Hevalê Egîd li wir bû. Me bi hevû du re guftugo dikir. Bitaybet li ser serkeftina dema pêş me guftugo dikir. Di meha Kanûnê de, me ev xebat dida meşandin. Ji welat agahî dihatin. Agahiya şehadetên hevalên Sasonê hatibû.

Me gelek hevalên xwe yên hêja, di vê salê de wendakirin. Bi rastî jî di du-sê salan de, me gelek heval amade kiribûn. Nîvê van hevalan neman. Ew heval birastî jî mîlîtan û şervanên rêsxistinê yên cewherî û bihêz bûn.

Zivistana di navbera salên 1985 û 1986’ an de ji bo me cardin zivistaneke pir zehmet bû. Me di got:

-“Ma em ê vê zivistanê jî bikaribin derbasbikin an na? Em çawa dikarin tevgera xwe pêşbixin?”.

Fikarên me zêde bûn. Me got em kongreya xwe li darbixin. Me hinek heval ji qada welat kişandin. Koma hevalê Egîd hatibû. Gelek dixebitîn. Ew bi xwe jî pir baş bû. Di xebitî. Di hemû zivistanê de li welat mayîbû. Li hemberî cerdevanan hinek çalekî jî li darxistibûn. Berî sal bidawî bibe, me amadekariya vegera welat kir. Rast û rast li ser Îranê hinek komên me derbasî welat dibûn. Di heman demê de, encamên kongreyê jî li wir, ji hevalan re veduguhestin.

Me dixwest di encama kongreyê de kombûnê bidin çêkirin. Di wê demê de fermaneke me hebû. Ez ne şaşbim li ser “Fermandar Kî ye? Taybetmendiyên Fermandar Çine?” bû. Me hemû barê pêşxistina tevgerê dida ser milê fermandaran. Di vê salê de, min bixwe dest avêtibû tektîkên şer û rêxistinê. Di biharê de me komên mezin rêkirin. Çalekiyên Mêrdînê çêdibûn. Ne çalekiyên me dixwestin. Lê belê fermandariya rewşa awerte li hemberî vê tengavbibû.

Sala 1987’an ji bo me sala berxwedanê bû. Me dixwest komên xwe yên gêrîla di Dêrsim, Serhed û derên din de bicih bikin.

Şehîd Egîd dixwest hinek tiştan baştir bike û pêşbixe. Piştî şehadeta wî koma wî, bixwe bibelavbûyînê re rûbirû mayîbû. Me ev rewş hemû di kongreya 3. de guftugo kirin.

## HATINA MEHMED ALÎ BÎRAND 1988

Di Sibata 2013’ an de Rojnamevan Mehmed Alî Bîrand jiyana xwe ji dest da. Li gor ku di bernameyek TV’ ya qenal D de nirxandiye dibêje: “Ez pir bimeraq û biheyecan çûyîbûm gel APO. Berî ku ez biçim, min ji Serok Wezîr ê demê Mesût Yilmaz re gotibû, heke ez venegerim an jî PKK’ ê min bigire, bila hukûmet li min xwedîderbikeve. Lê belê Mesût Yilmaz got ku:

-Ka tu biçe, ger tu venegerî em ê temaşe bikin.

Mesût Yilmaz bersivek bigûman dayibû min. Ji ber vê, dema ez çûm rex APO, li gel meraqa min tirsek jî hebû. Min digot: “ez ê di navbera xwe û APO de mesafeyekê bihêlim. Pir fermî bim”. Lê dema ku APO ez dîtim û silav da min, ez kişandim bi aliyê xwe de, ez bigermahî hembêz kirim, rûyê min maçkir. Piştre merasîmeke leşkerî çêkir û ez bi gêrîla dam naskirin.”

Sala 1988’ an de me hinek komên din şandin welat. Dijmin ev sal ji bo me kiribû sala dawî. Turgut Özal dixwest hinek encamên baş bigire. Di wê salê de Mehmet Elî Bîrand hatibû qada me digot; “hûn çiqasî li berxwe bidin temenê we heya 88’ a ye. Ma piştre hûnê bikaribin çalekiyên xwe yên leşkerî berdewam bikin?”

Ez ji xwe bawer bûm. Min bersiv didan.

Parêzer Huseyîn Yildirim hebû. Hatina wî cem me gelek seyr bû. Weke bi min ve pir girêdayî ye. Dihat hemberî min her tim diricifî, digot:

-“Serokê min her ku te dibînim dilê min di sekine. Ma tu van rewşan çawa dinirxînî?”.

Çend kes bi xwe re anîbûn. Wan jî digotin “li gor agahiyên me ji cihên sexlem girtine hûnê îsal tine bibin. Dema min digot:

-“We ji kuderê bihistiye”.

Bi navê dewletê diaxivîn û gef–şantaj dikirin. Piştre parêzer Huseyîn Yildirim digot:

-“Min ji serokwezîrê Avusturyayê destûr girtiye. Were li Ewrûpa bimîne”.

Di sala 1989’ an de me pêşketinên mezin bi dest xistin. 500 gêrîla hatibûn perwerde kirin. Komên li welat dihatin zêdekirin hebûn. Derfet hatibûn avakirin. Rêyên çûyîn-hatina welat dihatin bikaranîn. Kapasîteya çalakiyan zêde bibû. Gêrîla di Cizîrê de bûn. Rêxistin li Botanê bi nav û deng bibû. Gel jî rêxistin di pejirand.

**PEYAMA OZAL**

Sala 1993’ an saleke awerte bû. Ji bo Tirkiyê sala darbeyan bû. (Di wê salê de Adnan kahvecî, Turgut Ozal, Eşref Bîtlîs, Bûyerên Sêwas – Madimak, Bahtiyar Aydin, 33 Leşker hebûn). Ji bo çareseriya pirsgirêka Kurdan rêyên çareseriyê dihatin vekirin.

Turgut Ozal li şûna ku Kurdîstanê wenda bike bi girêdanên federalîst di bin banê dewletê de mayîndebûyîna biratiya gelan û hevpariya jiyanê de qanih bibû. Di vê derbarê de bi Celal Talabanî re di

nava têkiliyeke mezin de bû. Bi vê armancê ve girêdayî pêşnîyara hevdîtina bi min re kiribû. Bi rastî jî gaveke dîrokî bû. Fermandarê Giştî yê Leşkerî Eşref Bîtlîs bi Turgut Ozal re di nava vê plansaziyê de cih girtibû.

Di destpêka sala 1993’ an de em dikaribûn ber bi çareseriyê ve biçûna. Turgut Ozal ji ber ku ev rastî dît; rêya lihevkirinê hilbijart.

(16 Adara 1993’ an de Rêber Apo piştî hevdîtina bi Talabanî re û girtina peyamên Turgut Ozal di raya giştî de agirbesta yekem ya yek alî ragihand. Ev agirbest 2 mehan (16 Adar heya 25 ê Gulanê) dewam kir. Ev agirbesta 16 Adara 1993’ an, li Lubnan bajarokê Berlîas hatiye çêkirin. “Nırxandinek Taybet”.

Di destpêka sala 1990’ an û 91’ ê de 1Çileyê de me kongre bi dawî kiribû. Wê demê em bi ser Zaxo-Dihokê de çûbûna, me dikaribû bigirtana. Serhildanên Adarê destpêkirin. Lê amadekariyên me kêm bûn. Ji ber vê çend mehên destpêkê wendahiyên me çêbûn. Min hinek tevdîr girtibûn. Gelek hêzên gêrîla derbasî hundirê welat û metropolan kiribûn. Di vê watê yê de me sala 92’ an bi kombûneke baş pêşwazî kir. Her çiqasî zivistaneke sar û giran derbas bûbe jî tevî van şert û mercan em bi hevalan re bûn. Hukûmeta demê ANAP’ê sonda tinekirina me dabû. Hevkarên xayîn li ser kar bûn. Ji xwe trafîqek mezin ya Berzanî-Telabanî ji bo Enqerê hebû. Ji bo wan, ev hewildan encam didan. Van hêzan ev peyam didan me “ an tê vê

gêrîlatiyê berdî an jî em ê bi Tirkiye re êrîşî we bikin û we tine bikin". Di destpêka sala 92' an de ev peyam ji me re anîn. Me bersiva vê peyamê da û got:

-"Gêrîlayên me her tiştên Kurdîstanê ne. Bingeha hemû pêşketina ne. Divê em Başûr jî tevlî vê mijarê bikin".

Li ser vî bingehî me îttîfaq pêşniyar kir. Lê wan plansaziyên Enqerê hilbijartin. Weke tê zanîn di êrîşên sala 92' an de hêzên Başûr jî cihên xwe girtin. Enqera ji bo van hêzan digot;

-"Başe; li Enqerê ji bo we cih heye. Lê divê em bi hev du re li Ewrûpa PKK' ê tine bikin. Li Bakûrê Kurdîstanê Têkoşîna Rizgariya Netewî terorîst îlan bikin. PKK e terorîste".

Ew jî çûn, ev bi ziman kirin û Gotin:

-"Têkoşîna Rizgariya Netewî terorîst e. PKK' e terorîst e. Tirkiye demokrat e. Demîrel-Înonu demokrat in. Ozal demokratekî baş e. Me li hev du kiriye. Em ê bi hev du re PKK' ê têkbibin".

Dibin serweriya Emerîqayê de ev pêvajo hat amadekirin.

Li dijî van êrîş û hewildanên tinekirinê, me dahûrînên bihêz pêşxistin. Di Kampa Akademiya Mehsûm Korkmaz de nêzî 2500 mirov hatin perwerde kirin. Li beramberî hemû xebatan bi perwerde û zanekirina hevalan re eleqedar dibûm. Ev xebateke giring bû. Çima? Ji ber ku; me bêhna dîrokê baş girtibû. Me hemû derfetên xwe ji bo bersivdayîna wan dabû xebitandin.

Me nêzî du hezar heval ji vê derê şandibûn kampên Heftenîn, Çelê, Xakûrkê.

Di wê demê de Ozal hat kuştin. Hukûmeta Çîller hat ser kar. Digotin:

-"Kêmî salekê em ê wan bi qedînin. Ji xwe kesên li der dorên ozal jî dihatin kuştin. Ahmed Cem Ersever, Paşayê Bedlîsê, Bextiyar Aydin hatin tasfin kirin.

Di dawiya sala 93' an de me derdora KT(komara tirkî yê) yê dorpêç kiribûn.

Kef bi ser devê Doxan Gureş diket. Ji bo rastiyan berevajî bike her tişt digot. Ji bo wan deman tinekirin dirêj bibû. Me jî soza xwe dabû. Me gotibû;

-"An em ê bi ser bixin, an em ê bi ser bixin".

Me wê demê kom mezin perwerde dikir. Bawer im 500 kes hebûn. Armanca me ew bû ku hemû derbasî welat bibin. Di dawiya Çile de em ber bi serkeftinê ve diçûn. Tam em di nava vê hewayê de bûn agahiyeke hat, got: "qezayek çêbûye!"

Dijmin di sala 1984' an de, di rojnameya Hurriyet de ev destnîşan kiribû. "me deh caran ceribandinên suîkastê kir. Lê yek ji wan bi serneket."

Yek li pişt me sekinî bû. Çeka kelaşnîkof di dest de bû. Lê ne dikarîbû bi teqîne, ne jî nefes bikişîne. Min ew dem weha derbas kirin.

Gladyoya hundir û derve ji ber ev rêbaz, ji bo xwe tinekirin didîtin Ozal dan kuştin.

(Ozal bi awayeke plansazî ji aliyê hêzên dij-demokratîk ve hat jehrî kirin û kuştin. Ev kuştina serokkomarê dewleta Tirkiyê piştî 20 salî şûnve ji aliyê hukûmetê ve rewşa jehrîkirinê hatiye eşkerekirin. Nırxandıneke Taybet )

## ŞEHADETA RÊHEVALA BÊRÎVAN (BINEVŞ EGAL)

Hevala Bêrîvan (Binevş Agal) di destpêka salê de şehîd ketıbû. Bêrîvan; keçeke Êzîdî bû. Dema hatibû cem me xwendevana dibistana seretayî bû. Ji bo xizmeta zarokên xwîşka xwe bike hatibû Ewrûpayê. Me jî, ew kişand qada xwe. Gelek bandor bibû. Ya rastî me xwest em heskirinê nîşanî wê bidin. Me xwest em jiyanê di kesayeta wê de hişyar bikin. Dema gîhaşt Cûdî nameyek ji me re şandibû. Behsa xweşikiya çiya û azweriya gel kiribû. Ket nava gel. Biqasî ku nêzî çiyan bû, ewqas jî nêzî gel û nêzî çeka xwe bû. Bi gelê Cizîrê xwe da heskirin. Gelek da heskirin. Gel ew girt. Di hişyarbûyîna gelê Cizîrê de bandora

vê hevalê ya mezin heye. Divê ev hevalên wisa pir baş werin nirxandin. Weke dihat xwestin li dijmin dan.

Sersala 1990'î de li qampê bûm. Min dahûrîn dikirin. Hevala Bêrîvan şehîd ketibû. Dijmin li hemberî me sîxwurî pêşdixist. Di wê demê de Ozal afûya(lêborîna) giştî derxistibû. Li hemberî me jî amadekariyên tinekirinê hebûn.

## JIYANA RÊHEVALA BÊRÎVAN (BINEVŞ EGAL)

Hevala Bêrîvan ji Êlihê, navçeya Beşîrî ji gundekî Êzidiyan bû. Ji malbateke hejar bû. Ji bo li zarokên xwîşka xwe binêre derbasî Ewrûpa dibe. Li Ewrûpayê têkoşîna azadiyê nas dike û tevlî dibe. Berî derbasî welat bibe li Ewrûpayê beşdarî xebata gel dibe. Li hemberî tinekirinê têkoşîneke bê hempa dide meşandin. Di meşan de cihê xwe digire. Xwedî hêza propaxandayê ya mezin û bibandor bû. Di sala 84 'an de di navbera Hanovver û Bonn ê de meşeke li dijberî tinekirinê ya 350 km tê birêxistinkirin. Hevala Bêrîvan bi xwe pêşengiya vê meşê dike. Belavokan belav dike. Piştre derbasî welat dibe. Di rêxistinkirina gelê Ezîdî de risteke girîng dilîze. Di sêyemîn kongreya PKK' ê de hevala Bêrîvan jî cîh digire. Derbasî qada Rêbertî dibe piştî perwerdeya xwe ya vir derbasî Mereş û Elbîstanê dibe. Piştre derbasî Cizîra Botan a nav û deng dibe. Di nava xebatên gel de cih digire. Bi tevlîbûn, xebat, û hevaltiya xwe dilê gelê Botanê fetih dike. Gelê Botanê rêzdariyeke mezin ji bo Rêhevala Bêrîvan digire. Hevala Bêrîvan cara yekem di herêma Botanê de mîlîsên jin perwerde dıke. Komeke jin ên mîlîs ava kiriye. Ev çalekiya hevala Bêrîvan bi serê xwe qedexeyeke mezin a civaka paşvero şkandiye.

Di hemû xebatên xwe de bi bername, plansazî, tedbîr û rêxistinkirîye. Ji bo xwe çend nasnavan bikartîne. Bi van navan dijmin şaş dike. Ji ber van tevdîrên wê yên kesî dijmin demek dirêj nikaribû wê bigire. Dijmin ji ber nikaribû wê bigire bi ser gelê herêmê de çûye. Gel bi darê zorê kirine sîxurên xwe. Di encam de Hevala Bêrîvan ango

hevala Binevş Egal di malekê de tê dorpêçkirin. Banga teslîmbûnê jê re tê kirin. Lê hevala Bêrîvan her tim tevdîrên xwe digirtin. Çeka wê her tim li cem wê bû. Di encama van bangkirina de Hevala Bêrîvan bi teqandina guleyan bersiv dide. Heya fîşeka xwe ya dawî li berxwe dide û şer dike. Piştre bi lehengî şehîd dikeve.

Piştî şehadeta Heval Bêrîvan gelê herêmê li cenazeyê wê xwedî derdikeve. Di dema girtina cenaze de bi dijmin re têkoşîneke pir dijwar tê jiyankirin. Kesê ku bêbextî û îxanet li Hevala Bêrîvan kiriye bi rêya mikurhatina zarokek biçûk hatiye dîtin. Ew kes hatiye sezakirin. Gelê Cizîra Botan ê welatparêz serhildaneke mezin pêş dixin. Salvegera şehadeta Hevala Bêrîvan a di sibata 1989’ an de ji aliyê gelê herêmê ve her tim tê bibîranîn. Di her malekê de, herî kêm yek Bêrîvan hatiye zêdekirin.

“Ji Pirtûka ‘Jina Azad Kiye, Çawa Jiyan Dike’ Hatiye Girtin”

## KURTEÇÎROKA ME Û VEGERA WELAT

Komên yekem ketibûn rê. Li Lolan û Xakûrkê baregeh û kampên leşkeri dihatin avakirin. Diviyabû şerê gêrîla bihata destpêkirin. Axînên ku ji zindana Amedê dihatin em berbi tevgerkirinê ve dibirin. Tam di vê demê de xebateke bi navê “Di Kurdîstanê De Rola Zorê” gelek berfireh hat amadekirin. Vê carê alîkarê min yê nivîsê Heval Duran Kalkan (heval Abbas) bû. Ji bo dem û koman wê bibûna xebateke baş. Me bi misogerî dixwest em ji bo rojiya mirinê ya Kemal Pîr bibûna bersiv.

Di 84’ an de me nêzî 300 gêrîla bi ked û hewildana ku nayê bawerkirin amade kiribû û şandibû welat. Di nav wan de yek heval derneket û ev pirs nekir. Ma bi vê hejmarê em ê çawa artêşa gêrîla li çiyan ava bikin? Çawa li çiyan bicih bibin? Kom weke nîv goçberan, li gund û derve bûn. Weke çûkên goçber dema tengav dibûn xwe didan aliyên çiyayan. Wisa wêrekî, fedakarî hebû. Lê belê kêm bû. Şert û

merc gelek giranbûn. Lê belê ceribandinên me zêde dibûn. Me bi temamî xwe bi karê xwe re dabû girêdan. Ez bi çêkera hevalan bawer bûm. Lê belê tenê bawerî jî têrê nedikir.

QADA PERWERDÊ Û QADA ŞERÊ ÇEKDARÎ

Bi sebreke mezin em derbasî sala 83' an dibûn. Di wê demê de min pirtûka "Pirsgirêkên Me Yên Pêşketinê û Erkên Me" amade kiribû. Ew pirtûk dihat çapkirin û derxistin. Zivistana 1982 -83' an de me amadekariyên xwe yên vegera welat dikirin. Me hinek heval şandibûn welat lê belê gava dihat xwestin nedihat avêtin.

Ji xwe berxwedana hevalê Mazlûm û Kemal – Xeyrî li dijî ixanetê bû. Kemal bi xwe gotibû, şehîd Ferhad gotibû, ji bo sekinandina vê îxanetê derveyî xwe şewitandinê ti rêyeke me nemaye. Mazlûm dibêje 'Di newrozê de derveyî vî agirî ti çareseriya me ya din nemaye'.

Hevalên din jî dibêjin derveyî rojiya mirinê çareya me nemaye. Rewşa zindanan wisa ye. Bala xwe bidinê li derve di sala 82' an de hîn me çiyan bikar ne anîne.

Belê çîroka me wisa bû.

## ME AGAHIYA 15' Ê TEBAXÊ JI RADYOYAN GUHDAR DIKIR

Me agahiya 15'ê Tebaxê ji radyoyan guhdar kir. Agahî bi derengî hatibû. Heya me ew agahî girt demjimêr û roj derbas nedibûn. Encam girîng bûn. Cara yekem çalekiyeke leşkerî dihat plansazkirin û pêkanîn. Pêşketinên ku derî ji gelek bûyeran re dida vekirin bû. Em gelek bi ser vê erkê de çûn. Ji bo her qadan me kom amadekirin. Berdest(yedek) amade kirin. Sala 1985' an dikaribû bibûna sala pêngaveke mezintir. Bi taybetî herêma Dêrsim û Tolhildan dikaribû biketana nava tevgerê. Amed, Serhed, Xerzan ketibûn tevgerê. Tevgera me ya Semsûrê hebû. Lê belê heval Sebrî Ok di navîna zivistanê de bi awayeke bêsud hat girtin. Koma hevalê Hecî (Sabrî Gozupek) û hevalê Xidir li Bozovayê hatibûn şehîd xistin. Ji ber wê pêngava me ya Semsûrê pêk nehat. Ev wendahiyên êşên wan giran bûn. Cardin koma hevalê Selîm di rêya

Ereban de wendahî dabûn. Tevî vê heya dawiyê li wê qadê man. Li van qadan hebûna xwe parastin. Komên Serhedê li çiyayê Agirîyê tevdigeriyan. Ciwanekî hemşehrî Mehmet Erturk li vir şehîd ketibû. Me agahiya şehadetên egîdên agiriyê digirtin. Ji bo vê gava 1985' an nehat avêtin. Lê tine jî nebûn.

## ÇALEKIYA DIHÊ(ERÛH)

"Fermandarê yekîneya propaxandaya çekdarî yê çalekiya Dihê (Eruh)Hevalê Egîd bû. Alîkarên wî hevalê Erdal û hevalê Mûstafa bû. Mûstafa hevalekî ji Ceylanpinarê bû. Fermandarê koma Çataxê jî Terzî Cemal bû. Me alîkarê wî jî diyar kiribûn. Diviyabû Ebûbekîr agahî ji gurubê re bibirana. Wê ji bo Koma hevalê Egîd re Selhedîn Çelîk û hevalê Mehmed Sevgat agahî bibirana. Ji xwe hevalê Mehmed Sevgat jî wê beşdarî çalekiyê bibûna. Ew çûn. Me jî koma Şemzînan birêxistin kir. Hem li wê derê hem jî li Hergûş wargehekî Zaxrosê me civînên xwe çêkirin. Koma hevalê Egîd ew li Çiyayê Çiravê dîtibûn, ew li wir agahdar kiribûn. Ji wir derbasî Gebarê bûn. Kifşa derû dor destpêkirin, vesaziya yekîneyê kirin. Bi zor pêre gîhaştin. Koma Şemzînanê amade bû. Koma Çataxê gotibûn em ne gîhaştine. Terzî Cemal li wir bû. Divê yekîne bihatana amadekirin lê belê Terzî Cemal ne gîhaştibû wan. Di rastiya xwe de Dihê durtir bû. Çatax nêzik bû lê wan nexwestibûn bigihêjin cihê xwe. Her wiha çalekiya Çataxê çênebû. Di dema ku hatibû diyarkirin de çalekiyên Şemzînan û Dihê hatibû çêkirin. Di dema çalekiya Dihê de leşker derketibûn der û dorê ji bo operasyonê, bi ser leşkerê qereqolê de hatibû girtin. Di wê çalekiyê de 60 çek ketibûn dest de. Cihê qewît (Depoya erzak) kete destên hevalan. Bi ser cihê wezaretê de hatibû girtin. Di mizgeftan de belavok hatin xwendin û hatin belavkirin. Ew çek anîn heya Çiyayê Besta yê. Çalakvanên Şemzînanê li avahiyên leşker û polîsan dayibûn.

Gelek leşker hatibûn kuştin û birîndarkirin. Pevçûnên pir dijwar hatin jiyankirin. Piştî vê çalekiyê dijmin derket der û dorê. Li

hemberî Gêrîla Operasyona yekem bi navê Operasyona Rojê ji aliyê dijmin ve hat lidarxistin. Di vê operasyonê de biryar dayibûn di 24 demjimêr an jî 72 demjimêran de, me tine bikin.

Di encama van çalekiyan de me armancên xwe bi piranî pêk anîbûn. Her du komên me bi tendurustî vekişiyabûn".

"Ji Pirtûka Heval Abbas A Dîroka Partıyê Hatiye Girtin"

## MAHSÛM KORKMAZ RÊHEVAL EGÎD

"Rêheval Egîd bi xwe ji Batmanê ango ji Elihê bû. Di dema dibistana Amadeyî de beşdarî nava refê gêrîla bûye. Ciwanekî çalak bû. Piştre beşdarî nava têkoşîna Sîweregê bibû. Di wê demê de bi armanca perwerdeyên leşkerî kom derdiketin derveyî welat. Di koma yekem de hevalê Egîd cihê xwe girtibû. Ji xwe li Êlihê berpirsê xebatên leşkerî hevalê Egîd bû. Li Sîweregê heya wê demê bibû xwediyê meriyeteke çalak. Di nava çalakiya Sîweregê de cihê xwe girtibû. Di sala 1980' î de bi armanca ku li Herêma Sêrt-Botan ê de xebatên gêrîla birêxistinbikin bi hevalê Kemal Pîr re vegeriyan welat. Di rê de dikevin kemîna dijmin. Ew û hevalê Kemal xwe ji tirimbêlê davêjin. Hevalê Kemal ji ber ji ser heşê xwe diçe, dijmin wî digire. Lê hevalê Egîd ji milê xwe birîndar dibe û xwe xelas dike. Di wê demê de hestiyê milê hevalê Egîd dişke. Demekê tê dermankirin. Piştre derdikeve derveyî welat, beşdarî konferansa yekemîn dibe. Piştre rêveberiya perwerdê ya giştî tê plansazî kirin. Hevalê Egîd di nava wê rêveberiya perwerdê de cihê xwe digire. Beşdarî perwerdeyên bîrdozî û siyasî dibe. Hevalê Egîd ji xwe werzîşvanekî baş bû. Xwe fêrî şerê nêz ê jûdo kiribû. Di wan mijaran de perwerde dida. Bejin kin, hinek dagirtîbû. Refleksên wî pir bihêz bûn. Dema dijmin narincok (bomba) diavêtin wan, hevalê Egîd bi wan refleksên xwe yên bihêz ew narincok cardin diavêt aliyê dijmin. Sûdeke

mezin dida perwerdê. Perwerdeyên derveyî welat dirêj kir. Di wê demê de Rêbertî bi çend hevalan re hevalê Egîd jî amade kir û ji bo li Başûr û Rojavayê Îranê bi xebitin ew şandin wir. Li wir ji xwe hevalê Mehmed Karasûngûr hebû. Bi armanca ku bi hevalê Mehmed Karasûngûr re bibin alîkar di sala 81’ an de ev kom derbasî welat bû. Di van herêman de amadekariyên gêrîla dan destpêkirin. Ev komên vedigeriyan welat ji aliyê hevalê Egîd ve dihatin pêşwazîkirin. 25’ê Gulana 83’ an de cara yekem li aliyê Xabûrê operasyoneke dersînor hat çêkirin. Di dema vê operasyonê de heya Xerzanê çû. Hemû herem venêrîn kirin.

Di sala 84’ an de li Çiyayê Reş civîna Awerte çêdibe. Di wê civînê de hevalê Ebas, hevalê Egîd jî amade dibe. Bernameya demê tê derxistin. Ji bo çalekiya Qilebanê (Uludere) plansazî tên derxistin. Hevalê Egîd di pêşxistina beşê leşkerî ya wê çalekiyê de cih digire. Piştre di navîna sala 84’ an de dibe fermandarê yekîneya propaxandaya çekdarî ya 14’ Tirmehê. Bi vê yekîneyê çalekiya Dihê saz dikin. Taxima hevalê Egîd di wê herêmê de sê çalekiyên mezin çêdikin. Di dawiya sala 84’ an de derbasî qada RÊBER APO dibe. Di meha Nîsana 85’ an de vedigere Herêma Botanê. Di wê demê de gelek wendahiyên gêrîla hatin jiyankirin. Ji yekîneya hevalê Egîd wendahî çênebûn. Di dawiya civîna havînê de li Botanê çalekî hatin destpêkirin. Sekna hevalê Egîd a fermandar hebû. Xwediyê zanebûneke girîng bû. Rêber APO piştî şehadeta rêheval Egîd di axaftineke xwe de gotibû;

-“Çavên me li hevalê Egîd digere, hevalekî weke şekir bû, li her derê em li wî digerin. Rêheval Egîd Şehîd ket, lê bi bîranîna heval ve girêdayî em ê artêşa Egîdan, artêşa gêrîla damezrînin”.

Du aliyên kesayeta rêheval EGÎD hebû. Yekemîn; girêdana bi Rêbertî, zelaliya rêheval di xetê de, pêşxistina xeta têkoşînê, li hember nêzîkatiyên derveyî xetê têkoşîna bi biryar dayîn, biqasî ku rexne dikir di meriyetê de jî xwedî sekna rast bû. Rêheval EGÎD tenê rexne nedikir, di

heman demê de di meriyetê de jî xwedî sekna dijberî nêzîkatiyên şaş bû. Ev kesayeta rêheval EGÎD îro jî di rojeva me de ye û îro jî ji bo me pêwîste.

Duyemîn; biryarbûna di gêrîlatiyê de bû. Rêheval EGÎD di gêrîlatiyê de zelal bû. Bi bawer bû. Ji gelê Kurdîstanê bawer dikir. Ji gundiyên Kurd bawer dikir. Ji çiyayên Kurdîstanê hez dikir. Rêheval Egîd ji Kurdîstanê hez dikir. Meskenê xwe li vir ava kiribû. Cardin girêdayî gêrîla bû. Di şer de bi ruhê serkeftinê, êrîş û fetihkirinê dagirtî bû.

Dema xwe vala derbas nedikir. Dixwend, lêkolîn dikir û li ser wan guftûgo dikir. Kesayetekî wî ya aram hebû. Tu kes ne dişkand û ne diêşand. Çalak û xwedî refleksên bihêz bû. Li ser pêkanîna xeta RÊBER tî de gelek dihizirî û pêk dianî. Rêheval Egîd xeta leşkerî da pêşxistin. Rêheval Egîd amadekariya pingava 15' Tebaxê kir, ew di jiyanê de pêk anî. 'Ji Giştînameyên Biryargeha Navendî Ya Hpg ê Hatiye Girtin'

## NÊZÎKATIYA JI BO ŞEHÎDAN

Ez wisa bawer dikim ku milîtanên me yên birûmet zêde di zanebûna wê de nebin jî xwe di riya jiyana pîroz de balkêş feda kirin. Baweriya xwe bi wê roja ku şeref, rûmet û hezkirin dê çêbibe anîn, radestî pergala kirêt û koledar nebûn. Dema em di vê mijarê de rojên destpêkê tînin bîra xwe, em ewlene ku dê, ev yek wiha be. Gêrîlayên me yên ciwan, hezar caran jiyana ku pergala sexte ferz kiriye, lanet lê anîne. Ev dozeke mezin e û girêdana zanebûna wan bi vê armancê ve misoger e. Em ê bi bîranînên şehîdan ve girêdayî bin. Jixwe ev tevger jî weke pêwîstiyeke bi girêdaniya wan ve tê pêşxistin. Em bawer dikin ku hûn bi temamî li ser vî bingehî, bi hêviyan ve barkirîne. Ji ber ku ev hêvî, jiyana pîroz pêkan dike, em ji bo wê dijîn û şer dikin. Ev mirov bi şehîdên xwe ve, bi şervanên xwe ve, dibe ku piştî sedan salan jî yê şer bikin, bi wî rengî karekî herî pîroz dikin, wiha jî dê wate bidin ku riya herî rast girtine, gelek astengî derbaskirine. Weke di hemû dozên girîng ên di dîrokê de hatine dîtin û weke di jiyana milîtanan de hatiye

peyitandin, ez ewle me dê mezinbûnekê pêkbînin û bi ser bixin. Ez ewle me ku hûn di mînaka me de kesayeteke herî pîroz ava bikin.

Hinek kes dibêjin, em mirovên şehîdan e. Dibêjim ew şehîdên me ne. Heke hûn di van helwestan de ne sexte bin, jidilbin, hûnê hinek weke şêwazê me bikin. Di kesayeta xwe de, şehîdan bidin jiyan kirin. Li pêşiya wendakirina kesayeta şehîdan bisekinin. Şehîdan rast bidin jiyan kirin. An tê rast jiyan bikî, an jî tê jiyan nekî. Bi vê rêgezê ve girêdayî bin. Heke hûn wisa bin, dikarin bibin şopdar an jî xwediyê şehîdan.

Dema ez zarok bûm, min ev mirin xerab didîtin. Wisa bi wate nedidîtin. Piştre min ev dît; mirin dibe amêra dîtina hêjariya kesên jiyan dikin. Mirovên ji bo miriyên xwe digrîn, di rastiyê de ji bo xwe digrîn. Di kesên mirî de xwe dibînin. Mirina xwe dibînin. Derveyî vê, ew giriyê ji bo mirinê zêde nayê famkirin. Xwe ewqasî lewaz dihêlin. Xwe ewqasî dişibînin mirî. Di mirina yek kesî de qiyametan radikin. Demek jiyanê ya wisa pir xwezayî bigirî fetisandin ji min re zêde bi wate nehat. Niha ji bo şehîdan zêde girî çênabe. Niha şehîd dibin hêza jiyanê û wêrektiyê. Ev ji bo mirina xerab bersivek e.

Şehadeta hevalê Mazlûm vê rastiyê bilêv dike. Ev pir girîng e. Wisa derdikeve holê ku ew jî wisa nêzîk dibe. Wî hevalî bîrdoziya me baş dizanî. Rêxistina me bi ruhê wê naskiribû. Bi rastî jî kesayetekî bi gorkem bû.

## HÊVIYA GEL AVAKIRIN

Divê li hember tevlîheviya Rojhilata Navîn sekna me ya mîlîtan û têkoşîna me ya azadiyê hêvî bidana gelê herêmê. Divê bersiva me ji bo axîn û nalîna zindanan hebûna. Divê rêyên derbaskirina Ewrûpayê bi-hatana vekirin. Divê li welat ew xeletiyên heyî ne hatana dubare kirin. Çalekiyên pêwîst bihatana destpêkirin. Ji bo van xebatan hemûyan tenê yek kes bi min re dibû alîkar, ew jî hevalê Ethem Akcan bû.

Me pêşengê berxwedana Hîlwan û Sîweregê, hevalê Mehmed Karasûngûr di navbeynkariyeke bê wate de şehîd dabû. Me komek gelek hêja jî wenda kir. Dibe ku van hevalan karîbûna şêwazê gêrîla gelek bidana guhartin. Her ku agahiyên şehadeta hevalê Mazlûm Doxan, Kemal Pîr, M. Xeyrî Durmûş, Akîf Yilmaz û Alî Çîçek ji zindanan dihatin, em bi ser dil û mejîyên xwe de diçûn. Derveyî wê me ti rêyên din nedidîtin. Ev roj, rojên berxwedaniya li hemberî êşan bû.

Di sala 1986' an de agahiya herî bi êş a ji bo tevgerê, agahiya rêheval şehîd Mehsûm Korkmaz bû. Di nava vê agahiyê de, heman xeterî li pêşiya me jî hebûn. Weke li dora min xelekek hatibû avakirin. Hêrs bibûm. Tiştên qewimîne, min nikaribû di dilê xwe û mejiyê xwe de bicih bikirana. Wendahiyên gelek erzan hatibûn dayîn. Ji ber vê êşê beşdarî kongreya sêyem a sala 1986' an nebûn.

Piştî sala 1986' an xebat bi perwerdehiyên kûr hatin meşandin. Wargehên me yên li Bekayê hatibûn valakirin, me derbasî Lubnan, Şam û Helebê kiribûn. Gelek malên wir, me veguhartibûn wargehên perwerdê.

Di destpêka sala 1993'yan heya 1998' an dahûrînên pir kûr hatin pêşxistin. Her salê nêzî hezar heval dihatin perwerdekirin. Di vî alî de lez û berdewamiya şoreşê hat pêşxistin.

Di navbera salên 1970 -1980' an de armanca min avakirina rêxistina pêşeng, avakirina tevgerê bû. Min ev bi serxistibû.

Piştî sala 1980' î çi dibe bila bibe, avakirina Rêxistina Mîlîtanên Şerê Têkoşîna Çekdarî Û Rêxistina Gel bû. Di Rojhilata Navîn de ji xwe min ev armanca xwe pêk anî bû.

Di wê demê de, beramberî artêşbûyîna gelê Kurd artêşbûyîna jinên Kurd jî dihat avakırın.

Bi hemû mirovên ku di nava helwesta dîtina me de bûn di hatin rex me re hevdîtin dihatin çêkirin.  Me di kesayet û rêxistina xwe de hêviyên gel ava dikirin.

## NIRXANDINÊN ME YÊN SALA 1990- 1995

Di navbera salên 1990 û 1995' an de dubareyên bê wate bûn. Zexta dijmin û lewaziyên welat, em ber bi vê dubareyê ve biribûn. Ev sal ji bo nasnameya gelê Kurd û têkoşîna azadiyê gelek girîng bûn. Min dixwest van derfetan heya dawiyê bikar bînim. Ji bo veqetînê min xwe amade kiribû. Lê hevalên qadên din, dost û gelê me ne amade bûn.

Di wê demê de nirxandınên me ji bo şehîdan çêdibe.

## ÇALAKIYA HEVALA ZÎLAN
## ÇALAKIYEKE ŞERÊ ME YÊ HERÎ PÎROZ Û BI ENCAM E!

Hevala Zîlan bi reng û şêweyeke manîfestoyî name û gotin li du xwe hiştin. Ez bawer dikim ku ne hedê me ye, em hinek tişt lê zêde bikin. Lê, bersivdana nameya wê bi taybetî ji aliyê min ve berpirsiyariyeke manewî ye. Ji derî wê jî; ev peyam ji aliyê bîrdozî, polîtîk, rêxistinî û leşkerî ve berpirsiyariyeke mezin û girîng dide ser milê gel, partî û yê min. Çalakiya hevala Zîlan, ne wiha çalakiyeke întixarî ya ji rêzê ye. Ev çalakiyeke dîrokî, hemdemî, bi cesaret, bi plan û rêxistinî ye. Ev fedakariyeke mezin e. Ev tê wê wateyê ku gerîlayeke bi serê xwe dikare çalakiyeke ew qas mezin pêk bîne ku biqasî çalakiyeke hêz û bargeheke gêrîla mezin û berfireh e. Pêwîst e ku em vê çalakiya hanê wek êrîşeke piralî, pêşketî û mezin bibînin û binirxînin.

Ez bi eşkere dibêjim ku şehîdên din jî xelekek ji vê zincîrê ne, lê çalakiya hevala Zîlan lûtkeya vê têkoşînê ye. Lidarxistina çalakiyê ji aliyê jinê ve him pêdiviyeke xweristî ye û him jî, divê mirov ji aliyê rastiya jinê ve li ser bifikire. Lê, ez dixwazim destnîşan bikim ku ev metoda çalakiyê bêtir bi jinê ve girêdayî ye. Ji ber ku ew bêtir birik e, tijî ye û xwediyê daxwaza jiyaneke azad e. Yek jê jî pir balkêş e, nêzikî jiyaneke azad û serbixwe dibe û dibe xwediyê wê. Di rastî û bingehê xwe de ew dixwaze di vî warî de bibe sembolek.

Jina ku bi hezaran sala hatiye xistin, ji rastiya wê hatiye durxistin, ji bo li dijî wê were derketin ji Îştaran heta Zîlanan hatiye, ango divê ber bi bilindbûnê ve were veguhertin. Ev jî dibe bihara rastî ya gelên Rojhilata Navîn.

Xeta serkeftinê di Zîlanan de nûneriya xwe dîtiye û rê li ber teqandina azadiya jinan a mezin, qehremaniya milîtaniya vê vekiriye. Zîlan ji bo me sembol e, bîranîna wê emr e. Em ê pêwîstiyên wê di her demê de û di her derê de bi cih bînin. Ev nêzikatiyeke cidî ye. Aliyên vê xetê yên bîrdozî, polîtîk, rêxistinî balkêş in. Di rastiyê de Zîlan bi çalakiya xwe tenê dijminê pêşberî xwe, emperyalîzm û her şêweyê paşverûtiyê mehkûm nekir, hîn zêdetir zexta li ser jinê dihate kirin, girêdana bi wan fikarên jiyana erzan a biqasî serê derziyê, ya azweriya jiyana azad a mezin tune dikir û li hember wan astengên pêşiya biçalakîbûna mezin serhildana mezin bû, ev bixwe di wesiyeta xwe de aniye ziman. Jiyana bi azadiya mezin, awayê biçalakiya mezin di hevokên dawî de ne, hûn vê dizanin, ev ji bo me ferman in. Jiyana herî bi rûmet jiyana di vê çarçoveyê de ye. Divê heta dawiyê li vê xwedî bê derketin. Yên li nirxên xwe yên herî bilind xwedî dernekevin, wan bijiyan nekin tu carî îflah nabin.

Bang û nameyên hevala Zîlan her yek manîfestoyeke û divê em daxwazên wê bi cî bînin. Di dîrokê de qiblegeh, mabetên pîroz û di nav wan de Xweda an jî xwedawendên pîroz hene. Nifşên li du wan di rojên diyar de diçin serlêdan û pîrozbahiya wan mabetan û xwe dispêrin wan. Ji wan re secde dibin, lava dikin. Dibêjin:

"Me efû bikin!" Ev hevalên me hevalên wiha ne. Weke ku hûn jî diçin hizûra mabedan, herin hizûra wan û bikevin secdê. Ji wan efû bixwazin, xwe pak bikin. Hêz ji wan bigirin!

## HEVALÊN MIN YÊN HUNERMEND

Xebata min a Lubnanê di wateyekê de xebata çiyayan bû.

Ez hîn bi aram bûm. Derfetên tevgerê û mercên tendurustiyê hîn destdayî bûn. Li Sûriyê em bi malekî û erebeyekê ve hatibûn kîlîtkirin. Perwerdeyên me di asta dahûrînên kesî de derbas dibûn. Ji yên Lûbnanê baştir bûn. Hîn kûr û bi encam bûn. Yek bi yek bi endamên perwerdê re eleqedariya pêwîst nedihat kirin. Min ew her tim weke kêmahî hesiband. Ji bo min gelek endamên hêja di wan perwerdeyan de hebûn. Min dixwest temenê xwe bi wan re derbas bikim. Lê xebatê ez ewqasî belav dikirim ku weke dilê min dixwest bi wan re eleqedar nebûn. Min firsenda vê nedît. Beşeke mezin şehîd ketin. Di dilê min de biqasî çiyayan cihê wan heye. Di bin vê rastiyê de tişteke din heye. Di kesayeta min de ev taybetmendî pir serwer e. Ez ji bilindiya tekoşîna şoreşgerî bawerim. Ev tekoşîna giştiye. Ji bo vê têkiliyên kesî di asta duyem de digirim dest. Nêzîkatiya kollektîvîst adeta hatibû halê ne-xweşiyê. Min têkiliyên kesî di rêza têkiliyên taybet de dinirxandin. Ji ber vê min ev têkiliyên taybet biçûk didîtin. Ji ber van sedeman ji bo bêrîkirinên wan mirovên mezin re nebûm bersiv. Ev jî her tim êşek di dilê min de ye. Lê cardin di hemû perwerdeyên giştî de, di çûyîn-hatinan de min dîyalog pêşdixistin. Ziyaretên gel jî weke min dixwest nikaribû bikim. Carna di rojên pîrozbahiyan yên giştî de ji bo axaftineke giştî beşdar dibûm ew jî kêm diman. Ji ber van sedeman min her tim têkiliyên fermî, têkiliyên bêhna îktîdarê ji wan dihatin pir sar pêşwazî kirin. Weke ku ez ji gel qut dikirim. Gelek gurubên dostan dihatin. Eleqedariya têr nedihat kirin. Ev jî encama xwe ji wan têkiliyên îktîdarê digirt.

Me bi gelek dostên hunermend re li vir hev naskir û li beramberî hev du îlham girtin. Bi eleqedarî û zanîna van dostan min famkir ku huner îfadeya rastiyê ye. Ji bo min kesê di rêza yekem de dihat Aram Tîgran bû. Li vê qadê me hev naskiribû. Ev hevnaskirineke dîrokî û mezin bû. Ji bo min hunera wî Kurd –Kurdîstana dihat ziman bû.

Stirana wî ya yekem hîn di dema dibistana amadeyî de bi rasthatineke re min guhdar kiribû. Min ew deng ti carî jibîr nekir. Min got; divê ew rastiya ku ev deng biziman dike bi gengazî were jiyanîkirin. Hem jî bi awayeke azad were jiyanîkirin. Min qet hêvî nedikir ku ev ê bibe hevdîtina dawiyê. Min veqetîneke bi vî rengî qet nedixwest. Çêkirina konserên Amedê ji bo wî kêfxweşî bû. Wî em di şopandin, me jî ew. Ew dengê dawudî yê bêdengiya mirinê ye. Sultanê rastiya dengê me ya azadiyê ye. Wê her tim bi me re jiyan bike.

## TEKOŞÎNA MIN LI HEMBER MODERNITEYÊ

Bi kinahî çîroka min ev e. Hûn jî hevaltiya xwe pêş bixin. Dostaniya xwe pêş bixin û mezin bikin. Ev gelê me ye. Derveyî vî gelî jiyan tine ye. Min hemû bernameya xwe, armanc û hedefa xwe li gor vê amade kir. Ger ne wisa bûna ti wateya jiyana min tine bû.

Di zaroktiya xwe de her tim min digot xwezka ez ne Kurdekî wisa bûma. Ji malbateke gelek lewaz hatibûm. Min digot, ma gelo koka min ji Kurdiniyê tê an na? Min ev lêkolîn dikir. Min digot belkî ez jî ji tirkan bim. Piştre min mêze kir kesê wisa dihizirin dikevin. Di hemû jiyana xwe de wunda dikin. Kesên wisa mejiya wan, ruhê wan, hizirînên wan bi dijmin re ye. Ji ber wê wisa dihizirin. Kesên wisa li ber çavên min di reviyan. Ji ber ruhê xwe nekiribûn yên Kurdînî, xwe firotibûn dijmin. Her roj direviyan cem dijmin. Tu kesî ne digot ev welatê me ye, em Kurdin, divê em tekoşîn bikin. Hevalên ku ev gotin hevalên di zindanan de li berxwe didan bûn. Hevalên hemû zor û zehmetî dabûn berçavên xwe û ji bo gel xwe feda dikirin, dikaribûn wiha bigotana. Rêxistin jî bi kesayet û hizrên rast yên van hevalan ve pêş ket.

Dema min dest bi dibistana seretayî kiribû ez dihizirîm ku ez li pêşberî cinawirekî çawa rawestiya me. Pir ecêb bû. Ez rastî wan cinawiran hatim û di wê demê de bûm zarokê wan yê xwoşewîst. Ez li ser destên xwe digirtim. Min jî, ji wan re hêk û mast dibirin. Dema cara yekem min hevokên Tirkî bi zimanê xwe digot, min bawerkiribû ku êdî

ber bi moderníteyê ve çûyîme. Lê her tim aliyeke ku min veşartibû hebû. Aliyê ruhê xwe yê tirsok û diricifî min her tim vedişart. Bawerim kesayetên dur û wisa pêş dikevin. Gund û malbat çi dayîbû kesayeta min? Nizanim min fam jî nedikir. Ez ti carî nebibûm ewladekî baş yê malbatê û gund. Her kesî di nava xwe de digot kurê Omer an jî yê Uweyşê yê bê hêvî. Jixwe zêdetirîn digotin, Evdilê Uweyşê. Navê min wisa derketibû. Min ji vê rewşê şerm dikir. Aciz dibûm. Lê ji şêwêzê xwe yê kesî jî min tawîz ne dida. Her kesî zarokê xwe ji min vedidizî. Ne dihiştin ku em bi hev û du re biçin geşta çiyayan. Min ev rewş bi xwe ne dipejirand. Ji bo vê min lîstokên cûr be cûr amade dikirin. Lîstokên weke nêçîra çûkan, maran, marmarokan… Min wisa bala zarokan bi aliyê xwe ve dikişand û me hevaltiya xwe dikir.

(Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk Pirtûka 5. Ya Bi Navê Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Netewa Demokratîk)

Çavê min li ser moderníteya Tirkan mabû. Bi hêsanî jê qut nedibûm. Piştre min fam dikir ku bi navê Kurdînî çi hebe ew ji min digirin. Li pêşiya Kurdîniya min asteng in. Heya sala 1973'an ceribandina min ya koma yekem li dibistanên pergalê weke robotekî ma bûm. Di jiyana min de ew dem tenê tinebûnê îfade dike. Kesayetekî bêxem, binkeftî, yekî ji robot xerabtir dida avakirin. Di van salan de serkeftina min ya herî mezin ew bû ku ez nebibûm weke wan. Bi rastî jî ez kesayetekî pênasekirina wî zehmet im. Ne bawerim fîlmê wî jî bikaribe were çêkirin. Lê cardin bibêjim ez zarokê herî jêhezkirî yê mamosteyên xwe jin-zilam bûm.

Min çawa xwe amade dikir? Min li hemberî moderníteyê hemû kêliyên xwe amade dikir. Weke ku ez her tim di ezmûnê de bûm. Min refê xwe bi pileyên bilind derbas dikirin. Lê ez ti carî nebûm kesekî ku ew dixwazin. Ez her tim di nava berxwedanê de bûm. Min her tim xwe dixist şûna wê jina ku di hemû demên dîrokê de hatiye wendakirin. Min pir caran xwe li beramberî wê pirsgirêkê lêpirsîn dikir. Di vî alî de min bindestî û bandorên şaristaniya navendî baştir fam dikir. Aliyên

bindestiya ku dişibiya hevûdu didîtin. Her ku dem derbas dibû min ji nêzîkatiyên cînsiyetperest nefret dikir. Min kirêt û qirêj didîtin. Min di temenekî biçûk de ferq kiribû ku hunera pîrektiyê mirovan têxe.

Cardin di civîneke li Stenbol de Mûsa Anter di derbarê 12 Îlonê de ev gotibû. Ew bi hevûdu ketine. Em dev ji wan berdin û li karê xwe mêze bikin.

(Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk Pirtûka 5. Ya Bi Navê Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Netewa Demokratîk)

## WERIN EM ŞERÊ MARA BIKIN

Rêbazeke min yê mar kuştinê hebû. Di nava gund de her kes pê hesiya bû. Kê mar bidîtana dihatin bangî min dikirin. Di çûyîna çiyayan de, çûyîna dibistanê de, kuştina maran de min pêşengî girtibû. Her tim nêrînên min yên pêşerojê zelal bûn. Di çûyîna rêde diviyabû ez gavekê li pêş bûma. Ev ji bo min rêgezek bû. Min ev bi hêza xwe ya cewherî pêk dianî. Min ti carî piştа xwe ne da tu kesî. Heta derfetên min jî çênebûn. Daxwazeke min jî çênebû. Ev hemû tevgerên kesê serkeftî bûn. Ji bo girtina çûkan diçûm nêçîrê. Girtina çûkan biqasî îmhakirina yekîneyek dijmin girîng bû. Xwe gîhandina hêlîna teyrê baz, çend mar kuştin weke kuştina dijmin bû.

## TAYBETMENDIYÊN KESÊ BIHÊZ ÇAWA NE?

Taybetmendiya kesê şervan çawa ye? Ka em ceribandinekê bikin.

Em marekî dirinde bavêjin erdê. Wê hest, tirs, parastineke çawa bi kesayeta were bide çêkirin?

Li ser mirovekî dirinde bi hizirin. Weke gur serê xwe rakiriye. Weke mar zimanê xwe derxistiye. Weke lawirekî dirindeye. Li ser mirovekî wisa bifikirin. Wê çavê we derbixe, dilê we derbixe, we biêşîne. Hûn ê di devereke wisa de taybetmendiyên çawa bigirin?

Ger em hêza xwe parastinê, ya xwe rêxistinkirinê bidin we, ma gelo hûn ê bikaribin bikar bînin?

Hûnê bikaribin bi hişyarî bikar bînin?

Wê her tim çavên we vekirîbe?

Ger hûn bi xwe bawer bin hûn ê van taybetmendiyan pêk bînin. Ev taybetmendiyên şervanê bihêz in.

Kurdîstan bi maran dagirtiye. Dijminên wê pir in. Kurd bi xwe jî bûyîne dijminê xwe.

Di bin her kevirekî de dijminek heye. Ma ne wisa ye?

Hizirandineke min ecêb hebû. Ya rastî zekayeke min ecêb hebû. Min digot, nava welatê mirov çawa be, nav mala mirov jî wisa ye.

Min ev waneyên xwe di zaroktiya xwe de biribûn.

Di doza azadiyê de divê di serî de mirov kesayeta xwe bihêz bike, amade bike, zane bike. Ev dibin rêgezên azadiyê. Divê hûn jî cîhana xwe ya Kurdiniyê wisa bihêz bikin.

Min her roj xwe perwerde dikir.

Niha Kurdîstan bi maran dagirtiye. Yanê her axayek, begek, mîrek mar e. Hemû cerdevanên gundan mar in. Hemû taybetmendiyên kesayeta mirovan yên ne hişyar û lewaz mar in. Qehremanên me yên dixwazin şer bikin divê van maran bi zanibin û wan bibin bixin. Lê belê hevalên me diçin pêl mayinê dikin, li ber avê diçin. Hêza dijmin nas nakin. Xwe dikin hedefa dijminan. Wiha nabe.

Hûn ê çawa ji destê van rizgar bibin?

Tê her tim bizanibî mar li ber serê te ye. Di nava mala xwe de tê bi tedbîr bî. Di welatê me de bi mîlyonan mar hene.

Gelek ji wan maran xwe weke berxigan didin nîşandan. Tu nikarî bi çekan jî bibin bixî. Nikarî bi lêdaneke hêsan jî bikujî. Min jî terzekî kuştinê girt. Min di serî de mar hişyar kir. Min got, bireve mar. Ger tu bimînî ez ê te bikujim. Şêwazê min cuda bû.

Di rastiya Kurdan de ev heye. Dema yek ji yekî dukuje dibêje min tola xwe rakir. Li gor wan divê hevûdu bikujin. Lê ez perwerde dikim, hişyar dikim û taybetmendiyên ku bûyîne mar ji holê radikim. Dema ew taybetmendî berdewam dikin piştre dikujim.

Ger Min Hemû Taybetmendiyên Bûyîne Mar Bukuştana Bi Navê Kurdînî Pir Kêm Mirov Diman.

Min aqilê xwe bikar anî. Min mar êşand, da revandin, lê min nehiştt bi min ve de.

Gelek cûreyên maran hene. Hestên we, hizirînên we carna dikarin bibin marê herî bi jehr. Hûn dikarin van aliyên xwe perwerde bikin.

Bi hizirin lewaziyên we çawa we dikujin? Têkiliyeke erzan, hestên erzan, erk girtineke erzan, bêkedbûna erzan, meşeke rast nekirin we dukuje. Ev hemû dibin lewaziyên we. Ev hemû mar in. Ger hûn her tim ne şiyar bin wê bi we ve bidin.

Li gor min kesê ku şer neke nikare bibe xwediyê hest û heskirinên mezin.

Ji bo ez xwe mezin û bi wate bikim şerê azadiyê didim.

Min xwe çawa perwerde kir. Li dora min çiqas neçar hebûn, çiqas bêkes hebûn, çiqas bêderfetî hebûn, çiqas mişk, mar, dupişk, hebûn, çiqas av, çiya, şînatî hebûn min li hemûyan mêze dikir û ji bo hemûyan dibûn çareserî. Min ji xwe re û ji wan re rêz digirt. Min jiyana xwe wisa fetih dikir.

## MA HÛN JIYANA XWE ÇAWA FETIH DIKIN?

Gelek hevalên me hebûn. Ji tariya şevê ditirsiyan, ji dijmin di tirsiyan, ji sîha xwe ditirsiyan. Me ew fêrî şerê mara kirin. Niha bûn qehremanê gelê xwe. Bi lehengî şer kirin û şehîd ketin.

Ez naxwazim tu kes erzan wunda bike. Ez ji dijmin re jî dibêjim. Şerê taybet neke. Were weke qehremanan şer bike. Lê ew şer qirêj dikin. Li cem me şer pîroz e. Ji ber şerê me ji bo jiyaneke aştiyane ye. Jiyana me bi xwe aştiye. Lê dijmin li ser jiyana me yanê aştiya me şer dide meşandin. Ez mirovekî pir hestiyar im. Nikarim gêreyekê bikujim. Nikarim pêl giyayekî bikim. Lê dema êrîş bi ser jiyana me, gelê me, aştiya me, bêrîkirinên me, heskirinên me, dîroka me û ser zimanê me

de tên ez dibim şervanekî dijwar. Wê demê şerê min yê maran destpêdike.

Hûn dizanin di zaroktiya xwe de ez pir tirsonek bûm. Gelek kesan digotin tirsonek. Lê belê dema şert û mercên jiyanê tên fetisandin, şerefa min tê binpêkirin kes nikare biqasî min şer bike.

## MAFÊ MIROVAN ÇIYE?

Ez carna dibêjim

-"Ey APO tu mirovekî. Di roja me de mafê mirovan hene. Tu jî weke mirovekî asayî biçe jiyaneke xwe ava bike". Lê belê kesekî di nava şer de nikare van mafan bixwaze. Ji ber jiyan bi maran dagirtiye. Ez ji mafê herî biçûk bêpar im. Nikarim bigerim, nikarim pêwîstiyên xwe bigirim, nikarim mafekî din bixwazim. Ji ber ez bibêjim mafê min yê kesî wê demê mafê gelan û şer wê zirar bibîne. Mînak her kes dikare cixare vexwe lê mafê min tine ye. Her kes dikare rehet xew bike lê mafê min tine ye. Ji bo mirovê Kurd maf nîn e, erk hene. Em encax wan erkan pêk bînin. Dema em van pêk bînin dikarin jiyan bikin. Dibe ku zarokek mafê xwe yê jiyanê bi xwaze. Lê ez nikarim bixwazim. Ji ber ez RÊBER im. Ez tekoşervanê gelê Kurd im. Ez rêhevaltiya şehîdan dikim.

Min heya niha pariyeke nan navêtiye erdê. Qesrê min jî hebin ez ê bixim bin xizmeta şoreşê.

Ez xwe wunda nakim. Her roj li ser têkilî û hevaltiya xwe dihizirim.

Xeyalên xwe ji bîr nakim.

## DERKETINA JI SURIYÊ

Di derketinê de du rê li pêşiya min hebûn.

Ya yekem rêya çiya.

Ya duyem rêya Ewrûpa bû.

Rêya çiya dihat wateya girankirin û dijwarkirina şer. Ewrûpa dihat wateya şensê çareseriya demokratîk. Tê zanîn berî derketinê bi demek dirêj amadekariyên rêya çiya hebûn. Îhtîmala herî mezin derketina

çiyayan bû. Lê tam di wê demê de heyetek Yewnan hatibû. Nûnerê me yê Atîna Ayfer Kaya bi rayedaran re di nava têkiliyan de bû. Ev ê hişt ku em berê xwe bidin Atînayê. Pirsgirêka Sûriyê jî, ew bû ku ez lez ji wir derketama. Lê belê ji derketina min ya Ewrûpayê ne razî bûn. Bê alternatîfmayîna wan qusura wan ya cidî ye.

## ÇÛYÎNA ATÎNA

Di hesabê me de derketina Atîna tinebû. Firsendek bû. Bi baweriya dostên me yên li wir ji nirxandina vê firsendê dur neketim. Ger min bizanibûna weke tabloya rastî wê ev derbiketiba bimisogerî dernediketim wir. Dema di nehê cotmehê de berê balafira me ket Atînayê û em li wir peya bûn hinekê Sûriye rehet bibû. Dema li Atînayê daketim, Kalenderîs derket pêşiya min. Kalenderîs demek dirêj li Tirkiye ma bû. Erkdarê Natoyê bû. Subayekî kevin bû. Heman kar li Swêdê jî meşandibû. Pir dost diyar dikir. Di navbera me de Kuryeyekî ecêb hebû. Hinek belgeyên Natoyê şandibûn ji min re. Dibe ku ji bo baweriya bide min bû. Ez birim cem Stavrakîs. Stavrakîs li wê balafirgehê di odeyekê de li benda me bû. Generalê hewayî û şefê îstîxbaratê bû. Digot; “nûh” û nedigot “pêxember”. Ne dihişt ez bikevim nava sînorê Yewnanîstanê. Dostên me yên ku soz dabûn hevûdu di holê de nebûn. Heya êvarî em pevçûn.

## ÇÛYÎNA MOSKOVA

Bi tesadufî têkiliyê me yê Moskovayê Nûman Uçar ket navberê. Bi balafireke Yewnan ya taybet berê me ket Moskovayê. Ez bi rêya qenalê Serokê Partiya Lîberal Demokrat yê Rusya Jîrînowskî ketim Moskovayê. Lê vê carê şefê îstîxbarata hindirîn yê Rusyayê derket pêşberî me. Wî jî digot, “na” û ne digot “erê”. Wê demê em nikaribûn bimana. Qaşo ez tam 33 rojan veşartî mayîbûm. Kesên ez li cem wam mam û yên bi min re eleqedar dibûn siyasetmedarên kokena wan Yahûdî bûn. Baweriya min hebû ku durUstun. Bi rastî jî dixwestin min

veşêrin. Lê min ev rêbaz rast nedît. Di wê demê de Serokê Îsraîlê Arîel Şaron û wezîrê karê derve yê ABD yê Allbrîght hatibûn Rusyayê. Di heman demê de serokwezirê Tirkiye wê demê Mesût Yilmaz jî li ser kar bû. Serokê Rusyayê Prîmakov bû. Hemû jî ji kokena Yahûdiyan dihatin. Biqasî têkiliyên dostê me yê Atînayê dostên me yên Moskovayê jî xeyalên me şkandibûn. Ya rastî ev têkilî dabûn diyarkirin ku baweri bi van têkiliyan nayê.

## ÇUYÎNA ROMAYÊ

Rotaya me ya sêyem ber bi Romayê ve bû. Me dixwest ji têkiliyên wê derê sûd werbigirin. Bi alîkariya du mîletwekîliyan serpêhatiya me ya Romayê destpêkir. Ev serpêhatiya me 66 rojan berdewam kir. Masîmo D'alema serokê wê demê bû. Durustbû, lê lewaz bû. Ewlehiya siyasî tam nedabû. Rewşa me ji dadgehê re hiştibû. Ez hêrs bibûm. Min biryar dabû di firsenda yekem de ji wir derbikevim. Dalema di hefteya dawiyê de gotibû:

-"Li gor kêfa xwe dikare bimîne."

Lê weke helwesteke zorakî ji min re hat. Di vê navberê de ne şaşbim lêgereke Ereban jî çêbû. Dixwestin min bibin cihekî û navê wir nedixwestin eşkere bikin. Ji ber fermiyet û ewlehiya wê tinebû min nepejirand.

## CARA DUYEM ÇÛYÎNA RÛSYAYÊ

Çûyîna Rûsyayê ya duyem çêbû. Ev xeletî bû. Di vê xetayê de helwesta ne ji dil ya Nûman Ûçar hebû. Min ruyê wî yên hindirîn bizanibiya ti carî ji Romayê dernediketim. Dema bi balafira Dalema ya taybet ji balafirgeha Natoyê derketim, min axîneke kûr kişand. Lê ev rewş dişibiya reva ji baranê û çûyîna ber teyrokê bû. Vê carê li hev kiribûn. Îstîxbarata hindir ya Rûsya wê min bibirana Ermenîstanê. Em çûn heya balafirgehê. Lê belê li wir got:

-"Ev kar sekiniye".

Ger min bixwesta wê ez bibirama Tacîkîstanê. Ji bo hefteyekê ez dikaribûm li wir bimama. Di vê navberê de wê alternatîfên din bihiziriyana. Bi awayeke xapandinê ez xistim balafireke kargo û em li paytexta Tacîkîstanê daketin. Hefteyekê em qet derneketin derve. Li odeyekê man. Cardin vegeriyan Moskovayê. Ji neçarî cardin me serlêdana dostên Yewnan kir. Me du rojên berf-baran-sar derbas kirin. Piştî vê macerayê me cardin berê xwe da Atîna yê.

## CARA DÛYEM ÇÛYÎNA ATÎNAYÊ

Biqasî tê bîra min, min ji xwe re gotibû vê carê bi hemû aliyan ez ketim nava lîstokên xwedayên olîmpûsê. Tam min xwe di nava xeyalên van xwedayan de didît. Bi taybet Hades dihat bîra min.

Di salona VÎP re derbas bûm û ketim balafirgehê. Bi ketina vê balafirgehê û taqîba dijwar ya xwedayê cehennemê Hades destpêkir.

Wê şevê li mala Matzakîs a dost mam. Ev jineke weke cadiyên berê ku sêhêr çêdikirin bû. Malek gelek belav bû. Min jê pirsî bû?

-“Pangalos çi dike?

Wê jî got:

-“Ew ê vê rewşê di hilbijartinan de bikar bîne”.

Dema ev digot, rastiya demê jî dida diyarkirin. Di kesayeta wê de hinek taybetmendiyên gelê Yewnan yê asîl hebûn. Lê ew taybetmendî bêhêz hatibûn hiştin. Piştî wê şevê demeke berbi kampa mirinê destpêkir. Bi hemû aliyên xwe Hades li ser kar bû. Hemû tiştên dihatin gotin, hemû karên dihatin kirin sexte bûn. Ma qey hêmanên durust nemabûn? Hebûn. Lê belê li hemberî cinawirê kapîtalîzmê neçar mabûn.

## ÇÛYÎNA EFRÎQAYÊ

Em derdiketin ber bi rêwitiya Efrîqayê ve. Vê carê fîgura Mandela bibandor dibû. Dema em ber bi Rûsyayê ve diçûn fîgurê Lenîn çawa bibandor dibû niha jî yê Mandela bibandor bû. Qaşo ez ê biçûma wir,

me yê têkiliyên dîplomatîk çêbikirana. Pasaporteke fermî derbasdar bigirtana. Lê lîstoka sextekariya dewleta Yewnan hîn bibandor bû. Di vê lîstokê de bi ser diket.

Di rastiyê de di hemû demên dîrokê de gelê Yewnan di bin navê demokrasiyê de bi van lîstokan hatine xapandin. Her tim bi trajediyan re rû bi rû mayîne. Divê bi vê zanebûnê nêzîk bibûma.

Ez her tim bi paqijiya zaroktî nêzî têkiliyên dostanî bûm. Di helwesta min ya vê demê de jî ev nêzîkatî bibandor bû.

Dema em ji Yewnanîstanê derketin û diçûn balafirgehê şoforên wesayîtan hewl didan min hişyar bikin. Durustiya xwe bi hewldanên xwe yên şiyarkirina min eşkere dikirin. Dixwestin ez bizanibim komployeke çiqas mezin tê meşandin. Dibe ku ew memûrên îstîxbaratê yên hinek jêrîn bûn.

Xwestin bi van bûyeran min hişyar bikin. Em ber bi balafirê ve diçûn. Wesayît li balafirê xist. Wisa em hinek rawestiyan.

Wesayîta duyem em biribûn balafirgehek veşartî. Diviya kes bi me nehesiyana. Li nêzî balafirgehê heft caran weke ku wesayît xera bûye rawestiya.

Lê belê ji me re soz hatibû dayîn. Min ewqasî bi wan sozan bawer kiribû ku ez bi van bûyeran hişyar nebûm. Berevajî şiyarbûnê min dixwest li pêşiya me çi heye berî demekê bigihêjimê. Balafira hatî ya Gladyo bû. Di karê îstîxbarata veşartî de bikar dianîn.

## BERÎ NAÎROBÎ ÇÛYÎNA MÎNSKÊ

Ji xwe berî vê rêwitiyê sefera me ya Mînsk ê hebû. (MÎNSK balafirgeha Rûsya sipî ye). Berî Naîrobî bi rêya Mînskê ez ê derbasî Hollanda bibûma. Di wê demê de bi balafireke taybet nêzî du seatan li Mînskê di sermayeke şewat de hatim rawestîn. Balafira em li bendê nehat. Polîsên balafirgeha Rûsya sipî demek dirêj balafir kontrol kirin. Dibe ku weke firsenda dawî ez li balafirgeha Mînskê hiştibûna. Tişta mayî li ser însafa rêveberiya Rûsya sipî dima. Tişta ecêb ew bû di wê

demê de wezîrê parastinê Îsmet Sezgîn jî Mînsk ziyaret kiribû. Balafira em li bendî nehat. Qaşo me şensek wunda kiribû. Paşde vegerîn weke mirina sipî bû.

Balafira Gladyo li ser behra reş difiriya. Piştre min ev şîrove kiribû û min gotibû:

-"Weke tirêna di komkujiya Yahûdiyan de hatiye bikaranînê ye. Di şexsê min de li ser gelê me, rejîma qirkirinê dihat meşandin".

Ew dem dest pêkiribû.

Dema em ji Mînsk vedigeriyan agahiya giştî dabûn hemû dewletan û gotibûn:

-"Ev balafir divê li balafirgehên Ewrûpayê danekeve."

Bi vê anonsê ev hatibû famkirin. Di wê demê de tenê balafirgeha Mînsk ya Rûsya sipî îsyankar bû. Derveyî vir ti deverek din ya daketinê nehatibû hiştin.

## CEHENNEMA NAÎROBÎ

Di cehennema Naîrobî de sê rê danîbûn pêşiya min.

1- Dixwestin min bixin rewşeke bê îtaatiyê. Yanê wê tiştek bi gotana, min ê jî emrê wan pêk ne anîna.

2- Piştre weke pevçûn derketiye bidana nîşandan û wisa bikuştana.

Ev jî dihat vê wateyê: Bi temamî divê ez bi ketima bin emrê CIA. Yanî teslîm bibûma.

3- Ya sêyem jî bi wê balafira tirkan ya ku zûde hatibû amadekirin radestî tirkan kiribûma.

ÇEKA BI GÛMAN

Wan bi xwe çekek 5 xwur dabûn me ji bo ez xwe biparêzim. Min ev pêşniyara wan di cihde nedît. Ev ji bo me û ji bo min dihat wateya întîharê. Lê niyeta min ya întîharê tine bû. Bi israr dixwestin ez çekê bigirim ser xwe. Ji bo vê li dora min difiriyan. Gr çek li ser min bûna û

min bikişandana ev helwest sedî sed wê bibûna mirin. Piştre di lêpirsînê de ev ji min re gotibûn.

Wê demê emrê lêdanê dabûn me. Ger te çek girtibûna ew emir wê bihata pêkanîn.

Li Naîrobî di elçîtiyê de xwestin ez ji wir derbikevim. Heta xwestin min bi zorê derbixin. Di lêpirsînê de ev jî gotin:

-"Ger tu ji elçitiyê derbiketana tu yê bihatana kuştin."

Wan ji min re gotin:

-"Te helwesta herî aqilane raber kir."

Çiqasî rast gotin nizanim, lê ev hatibûn eşkere kirin.

Pangalos gotibû, ji bo çûyîna Hollandayê destûr girtiye. Min zêde bawer nekiribû. Ji ber tîmên taybet yên Yewnan dixwestin ez ji elçîtiyê derbikevim. Ger derneketama wê bi ser min de bihatan û bi darê zorê ez derxistama. Ji bo vê di pûsûyê de sekinî bûn. Polîsên Kenyayê jî, xwe ji bo heman nêzîkatiyê amade kiribûn.

## ÇÎROKEK HATIBÛ AMADEKIRIN

Çîrokek hatibû amadekirin. Çîroka çûyîna Komara Başûrê Efrîqa yê. Ev çîrok bi xwe jî ya xapandinê bû. Gelek senaryoyên din hatibûn amade kirin. Digotin:

-"Xwe bisipêre YE yê. Yan jî Dêrê."

Ev senaryo hemû bi gûman bûn. Ji bo ji elçîtiyê dernekevim min pir li ber xwe da.

Pêvajoya sê mehan ya ji 9 Cotmehê heya 15'ê Sibatê berdewam kir, wiha muthîş derbas bû. Di wê demê de derveyî Emerîqa ti hêzên din nikaribûn vê operasyonê saz bikin. Di wê demê de tenê berpirsê hêzên şerê taybet Engîn Alanmiş dibin kontrola Emerîqayê de balafir derbasî Tirkiye kiribû. Misoger ev operasyona dîrokî ya NATO yê bû. Ev eşkere bû. Ji ber her dera em diçûnê heman helwest raber nedikirin. Yên dijî wan derdiketin di heman demê de dihatin bêbandor kirin. Rûsya mezin bixwe bi awayeke eşkere hatibû bêbandor kirin.

Helwesta Yewnaniyan ji xwe her tişt eşkere dikir. Hêzên wan yên ewlekariyê heya odeya min her der 24 seatan dibin kontrolê de dihiştin

Hukûmeta Dalema, hukûmeteke demokratên çepgir bû. Lê bê tecrûbe bû. Bi tena xwe nikaribû biryar bigire. Îngîlîstan jê re gotibû:

-"Divê biryara xwe ya cewherî bidî."

Pir zêde piştgirî nedayê. Helwesta Brukselê ne zelal bû. Di encam de hukûmeta Dalema meseleya me ji dadgehê re hişt. Di vê helwestê de bandora Gladyo yê neyê dîtin nabe. Jixwe welatekî ku herî zêde Gladyo li ser bibandor bû. Berlusconî hemû hêza xwe xistibû tevgerê. Ew bi xwe jî zilamê Gladyo yê bû. Ji ber min di zanî Îtalya nikare min di nava xwe de bigirin û barê min rakin, ez neçarî derketinê mabûm. Beramberî vê Tirkiye ji aliyê ABD û Îsraîlê ve bibû dewleta herî duvik ya ku wan jê bawer dikir.

Ecewît berî bimire wiha gotibû;

-"Min hîn jî fam nekiriye, çima Abdullah Ocalan radestî me kirine?"

'Ji Paraznameya Atîna Hatiye Girtin'

# ZAYÎNA SÊYEM

Dema sêyemîn ya jiyana min, ger ji wê re û ji cewherê wê re jiyan bê gotin, em dikarin ji 15'ê Sibata 1999' an heya qonaxa dawî ya bigihêje veqetînin. Taybetiya wê demê ev e ku bigiştî navend dewlete. Lê bi taybetî bi veqetîna jiyana hemdem dest pê dike. Ez dîsa li jiyana kovî venagerim. Ez ê neçim hezar sal berê. Lê eşkereye ku hinek nirxên mirovahiyê di van deman de veşartîne. Di demên mirovahiyê ku bi hezar dek û dolab û bi zordestiya şaristaniyê hat qutkirin heta bi asta zanistî – teknîk negihîje hevûdu wê azadî û rizgariya rastîn a mirovan jî nebe.

## PÊVAJOYA ÎMRALIYÊ

Min pêvajoya Îmraliyê ji bo xerakirina vê lîstokê weke platforma îdeal nirxand. Bingeha xwe ya pêwîst ya teorîk bihêz kir. Hemû argûmanên pratîkî yên felsefî yên şert û mercên çareseriya siyasî û aştiyane pêş xistin. Li ser xweseriya çareseriya siyasî ya demokratîk hizirîm. Ev xebata zor û sebir dixwest encax bikarîbûna alternatîfa çareseriya vê komploya dorveger û teng pêşbixistana. Di vê mijarê de ji xwe bawerkirinê zêdetir, ti çareyên din tine bû. Niyeta yên din di vê komployê de cih girtibûn cuda bûn. Dixwestin di kesayeta min de tevgera azadiya gelê Kurd PKK'ê tine bikin. Hemû cezayên girtîgehê, DMME (AHÎM)'ê û YE' yê bi vê nêzîkatî û armancê ve girêdayî ye. Tevgerekî Kurdan a ku ji min hatibû paqijkirin dixwestin.

Ez bawer im ji bo zaroka mirovan pirsgirêka herî zehmet bi civakîbûnê dest pê dike. Dema biçûkantiya xwe bibîr tînim têkiliya min ya herî zor ya bi dayika min re tê bîra min. Me ji ber têkiliyên civakî digirte hev. Mijara van hevgirtina namûs bû. Wisa tê famkirin ku di wan deman de şert û mercên gund, şertê yekem yê civakbûnê binamûsbûyîn bû. Bi namûsbûyîn jî, bi rêgezên malbat û civakê re girêdayî jiyankirin bû. Weke zarokek Kurd ji dayikbûna xwe heya niha ez nebûm xwediyê vê têgeha namûsê. Bi namûsbûyîn pirsgirêkek ku di nava civakê de mirov fêr dibû. Yanê piştî ji dayikbûnê dihat fêrbûn. Diyare dayika min jî dixwest li gor pîvanên xwe min bike endamekî

civakê. Rêya vê jî pêkanîna hemû rêgezên civakî bû. Ji ber vê di navbera me de pevçûna pir tund derbas bû. Wisa eşkere dibe ku hîn di wê demê de ez van rêgezên malbatî têr û rast nabînim. Cara yekem li hember kevneşopiya derdiketim.

Kêm maye ku ez di Îmraliyê de sala 12. bi qedînim. ÎMRALI… di dîrokê de jî navê wê derbas dibe. Cihekî di nava deryayê de, bi avhewaya xwe fîzîka mirovan gelek bandorên xerab dike. Ji dema împaratoriya Bîzans heya niha ji bo mehkûmên gelek bi xeter tê bikaranîn. Cihê surgûn û mirinê ye. Ji bo van Îmrali tê bikaranîn. Ger heqîqeta mirovan ya pir bihêz nebe, mirov nikare demek dirêj li vê derê liberxwe bide. Xwedayên dewlet-netewa hegemonîk ez li vir dam girtin. Ne tenê ji bo ku ez ji van xwedayan rizgar bibim, ji bo maskeyên wan yên sexte jî eşkere bikim Îmrali ji bo min cihê hîndekariyake mezine. Ji bo Kurd hem ji bandora van xwedayan rizgar bibim, hem jî bi şîroveya zanistî xwezaya xwe ya civakî ve girêdayî sazûmaniya xwe ava bikin, min Îmrali weke dibistaneke pir baş nirxand.

## BINGEHÊN TIRKIYEYA DEMOKRATÎK LI ÎMRALIYÊ HATIYE AVÊTIN

Zanist û hîndekariya dibistana Îmraliyê ne tenê ji bo gelê Kurd ji bo hemû gelan bi taybet ji bo tirkiyeya modern were avakirin jî, sûdeke pir baş daye. Dikarim bibêjim bingehên tirkiyeya demokratîk li Îmraliyê hatiye avêtin. Ez li vir tenê di yek alî de behsa para xwe nakim. Veguhartina dewletê bixwe bi cesareta ji Îmraliyê hatiye girtin pêşket. Kurdîstana modern jî bi Heqîqeta Îmraliyê girêdayî derketiye holê. Her çiqasî ev bi komploya mezin ya 1999’ an re girêdayî jî be. Hem tirkiyeya modern ya demokratîk, hem jî Kurdîstana modern û azad bi hevûdu re girêdayî pêş dikeve. Di encama ezmûnên di Îmraliyê de hatiye girtin tê avakirin.

Ez ne tenê car caran, her tim xwe diafirînim. Di nav xebata vê afirandinê de bi Heqîqeta Kurdîstana modern û tirkiyeya modern ve girêdayî min tevger kir. Bi vê şêweyê min xwe bi awayekî azad civakî kir. Min xwe kir netewa demokratîk û Kurd şênber kirin. Weke moderníteya demokratîk pêşkêşî tevahiya mirovahiyê, gelê Rojhilata Navîn yê mazlûm û kesan kir.

## DI DERBARÊ JIYANA MIN YA ÎMRALIYÊ DE

Heya niha di nivîs û diyalogên xwe de zêde li ser jiyana xwe ya kesî ne sekinîm. Min behsa berxwedaniya xwe ya li hember tecrîda li ser min tê pêkanînê nekir. Ev rêbazeke taybet ku pergalê ji min re amade kiriye. Ez van derveyî pirsgirêkên xwe yên tendurustî dibêjim. Ez bawerim herî zêde ev tê meraq kirin. Li hember vê jiyana mutlaq ya tenê û sekinandî pêşxistina min ya ceribandina jiyanê ye.

Baş tê bîra min. Dema ez zarokbûm, di gund de mezinekî me hebû, zaneyê gund bû. Gelek roj û bûyer dîtibûn. Gotineke wisa ji min re gotibû;

-“Li ciye xwe runê, ma di kesayeta te de civa heye.”

Tê zanîn ku cîva elementekî herikîne. Ez wisa kesayetekî gelek bitevger bûm. Ger xwedayên mîtolojîk ev rastiya kesayeta min berbiçav bikirana wê bizanibûna ku wan çiqas cezayekî giran dane min. Diyare wê demê bihiziriyana wê nikaribûna cezayê girêdana zinarên îmraliyê bidana min. Tevî vê jî di vê hucreya yek kesî de ez sala 12. di qedînim.

Girava Îmrali, di dîrokê de bi înfazên kesên erkdarên dewletê ku li vir hatinê pêkanînê tê naskirin. Hewaya wê hem hişk û hem jî bi nêm e. Di aliyê fîzîkî de laş lewaz dike. Dema tecrîd di odeyeke girtî de be, li ser bûnya mirovan bandoreke hincirandinê zêdetir dike.

Di dema mezinbûna temenê min de ez anîm vê giravê. Demek dirêj dibin venêrîna fermandariya hêzên taybet de hatim hiştin. Bawerim di van du salên dawiyê de ev derket bin venêrîna wezareta dadê. Derveyî

yek pirtûk, rojname, kovar girtinê û radyoyekî derfetê yek qenalê ragihandinê tine ye.

Çend heyvan carê ziyaretên malbatê an jî ziyaretên bi bira re yên nîv seatî jî dibin navê muxalefeta hewayê tê sekinandin. Tenê hevdîtina parêzeran gerduna min ya ragihandinê ava dikirin. Bêguman ez van hêmanên ragihandinê biçûk nabînim. Lê belê ji bo li ser piyan sekinandinê ev têkilî bes nakin. Ya ku li ser piyan mayînê bide diyarkirin, ya ku nahêle ez ne rizim îradeya min û zêhna min e.

Di rojên destpêkê de min bixwe jî, xeyala tehamuluya vir nedikir. Ne tenê bi salan, ez ne dihizirîm ku salekê jî li vir derbas bikim. Hizirîneke min ya wisa bi lome hebû. Min digot:

-"Ma hûn çawa dikarin bi mîlyonan kesan di nava odeyeke ewqasî biçûk de bihêlin?"

Bi rastî jî weke RÊBER ê Netewî yê Gelê Kurd di dema ketina girtîgehê de û di wan şert û mercan de min xwe kiribû senteza bi mîlyonan mirovan. Gel jî wisa fam dikir.

Mirov nikare bêyî malbata xwe, zarokên xwe jiyan bike. Ez ê çawa demek dirêj ji wê îradeya bi mîlyonan yek bibûn dur biketama? Min ê çawa ev hevdîtina bê dawî ji holê rakirana.

Ez wisa dihizirîm. Di derbarê sutatuya gelê Kurd ya civakî de bû. Ji bo ez jiyaneke azad bi xwazim divê ew civaka ez girêdayî wê me azad bibe. Azadiya min ya kesî bi azadiya civaka min re girêdayî bû.

Di girtîgehê de, dermanê hêza tehamûlê pêşxistina famkirina Heqîqetê ye. Di derbarê hemû aliyên jiyanê de famkirina Heqîqetê girtin û ew bihêz jiyankirin tê wateya her kêliya jiyanê biwatekirine. Dema mirov famdikin, çima jiyan dikin û şûnde êdî ferq nake li kuderê jiyan dike. Ev der nabin pirsgirêk. Jiyan her tim di nava derew û xeletiyan de derbas bibe wê wateya xwe wunda bike. Wisa jî ew diyardeya ku dibêjin jiyana yoz derdikeve holê.

Bêkêfî, nerehetî, şer, dijûn encamên xwezayî yên jiyana kirêtin. Jiyana mirovan ji bo kesên ku famkirina wan ya Heqîqetê heye weke

mûcîzeye. Jiyan bixwe çavkaniya coş û kelecana mezin e. Di jiyanê de wateya gerdunê veşartiye. Ger ev sir hat ferq kirin, mirov li kuderê be, li zindanê jî be pirsgirêka berxwedanê dernakeve holê. Jixwe ger zindan ji bo azadiyê be, li wê derê famkirina Heqîqetê hîn mezintir dibe. Jiyana ku bi famkirina Heqîqetê mezin dibe, êşên herî zor û zehmet jî dikare veguherîne kêfxweşiyê.

Ji bo min girtîgeha Îmraliyê ji bo famkirina diyarde û pirsgirêka Kurdan, derfetên çareseriya wê avakirin, tam bû qada şerê Heqîqetê. Li derve zêdetir axaftin û pratîk derbasdare. Lê belê li hindir hêza wate pêşdikeve.

Jiyana Îmraliyê rê li ber pirsgirêkên tendurustî yên fîzîkî dide vekirin. Derveyî van pirsgirêkan tiştekî ku ez nikaribim xwe li hember ragirim tine ye. Moral, îrade, zanebûn, li gor berê zêdetir bûye. Hîn zelal bûye. Di tîmara estetîk re derbas bûye. Bi pêşketina xwe ya xweşik dewlemend bûye. Her ku îzaha Heqîqetên civakî bi zanist, felsefe, estetîk re dihat pêşxistin derfetên jiyana xweşik – rast – baş zêdetir dibin. Li şûna ez bi wan mirovên ku modernîteya kapîtalîst ew ji rê derxistine re jiyan bikim, bi tena serê xwe heya nefesa xwe ya dawî di hucreya xwe de jiyankirin tercîh dikim.

Bi jiyana min ya Îmraliyê re girêdayî dibe ku weke pirs gelê me meraq bikin hebe. Di rewşeke derketinê de ez ê li ku û çawa jiyan bikim. Ez ne kesayetekî xeyalperestim. Divê baş were zanîn ez xwediyê terzê jiyana şoreşger im. Kesê ku jiyana min ya zaroktî mêze bike dikare bersivan pirsên xwe jî bidin. Min berî deh saliya xwe li hemberî otorîteya malbatê îsyana xwe ya yekem da meşandin. Ev ji bo van pirsan dibe mînaka yekem. Ji wan deman heya niha îsyankarê bi tenê me. Li hemberî jiyana gund û bajaran îtîrazên xwe min di paraznameyên xwe de vekirine. Kesên eleqedar dibin, dikarin ji wan pirtûkan sûd werbigrin û bersivên xwe bigirin. Bi kinahî dikarim bibêjim ku ji bo min jiyan bi azad jiyankirinê gengaz e.

Wê demê bi îhtîmala derketinê ez li kuderê bim jî, di kîjan demê de jiyan bikim jî, ji bo wê civaka ez endamê wê me ji bo wan Kurdên ku trajediya vê jiyan kirine, ji bo çareseriya wan ya rêya rizgariyê ÇARESERIYA NETEWA DEMOKRATÎK ez ê heya dawiyê di nava tekoşînê de bim. Ji bo wî gelê Rojhilata Navîn ku Kurd jî endamê wê ne, ji bo wê cîhana mezin ku çareseriya xwe ji yekîtiya netewa demokratîk digire ez ê tekoşîn bikim. Ev tekoşîn wê heya dawiyê bi soz –pratîkê, terzê çalekiyê her tim berdewam bike. Diyar e ya rast û xwezayî jî ev e. Ez ê bi wê kesayeta xwe ya bi hêza etîk-estetîk felsefî –zanistî hêza mezin, qezenc kiriye kesayeta xwe ya Heqîqetê bimeşim. Jiyanê qezenc bikim. Bi her kesî re parvebikim.

**21 kanûna 2010**
**Girtiyê Odeya Yek Kesî**
**Ya Girtîgeha Îmraliyê Tîpa F**
**Abdullah ÖCALAN**

## DADGEHA TÊKILIYA XWE JI ZANISTÊ QUTBÛYÎ TU CAR NIKARE ADIL BIBE

Dadgehkirina min ya di nava van şert û mercan de, derveyî kompoloya navnetewî, sedema cezayekî pir girane. Ji ber ku min civaka ku îdaya xwe wunda kiribû û ketibû pey hêrs û kara zêde, kir civakek xwedî xwestek û hêz ev ceza hatiye dayîn. Ew civak bû xwedî çalakî û tevger. Ev tê ferzkirin. Kengî were gotin:

-"Ka civaka min, ka çanda min, ka zimanê min, ka azadiya min"

Ev hemû li gor pergala desthilat dibûn cihêkarî û xiyaneta bi welat re. Di şaristaniya Osmaniyan de gunehekî wer hebû. Di sîstema qewmên tirk de bi giştî cûreyekî wisa yê guneh nîn e. Ev guneh, vedîtin û îcada rejîmên faşîst, nijadperestên şaristaniya Ewrûpa yê û rejîmên din ên desthilatdariya total in. Di sedsala 20.de derbasî sîstema dewleta tirk bûne. Ger guneheke min hebe, ew jî ev e ku min jî, hinek ji mîkrobên çanda şer û desthilatiyê wergirtiye. Wexta ku ji bo azadiyê desthilatiya dewletê û şer mîna fermaneke quranê bi bawermendî hat fêmkirin ez jî tevlî lîstokê bûm. Her kesê ku li ser navê bindestan rabûn têkoşiyan, nikaribûn xwe ji vê nexweşiyê xelas bikin. Li ser vî hîmî ez ne tenê li hemberî pergala serdest, her wiha ez li hemberî tekoşîna azadiyê ya min her tiştê xwe ji bo wê danî holê jî gunehkarim. Ez ê di vê mijarê de rexne li xwe girtinê, ne tenê bi teoriyê, ez ê di pratîka esîl a tenêbûna xwe de heta dawiyê bimeşînim. Lê pergala ku civak û gel bi zorê ji xwebûnê derxistiye, wê çawa xwe bide efû kirin? Ger wê dadgehkirineke adîl hebe, divê li îdeayên herdu aliyan jî were guhdarîkirin. Li gorî wê biryar were dayîn. Dadgehek têkiliya xwe ji zanistê qutbûyî ti car nikare adil bibe. Eşkereye zanistên civakî wê çeka min a bi tenê be. Ez ê serî li wê bidim. Ez biqasî ku xwe pê rohnî bikim, ez ê bikarbim li ser rêya rast bimeşim ku ev jî yek jî şerte, ji bo mirov bi şeref û rûmet be. Mirov dikare jiyana min a fermî û rêxistinî dabeşî sê deman bike.

-"Armanc her tişte."

Bi vî awayî kesayeteke çavkor derdikeve pêş. Di vê cûreyê doxmatîzmê de bi şêweyekî çarenûs û weke Xulase Şertên Îmraliyê: Ne tenê weke kes, weke komar û gel jî tê wateya zayîneke sêyemîn. Zayîna duyemîn bi şîddet û şer zayînê, paqijbûyînê vedigot. Di xwezayê de û di civakê de heyîna ev dijberiyên di her bûyerek de derbasdar û li gorî pêwîstiya qanûna yekîtiya wê serdema dijberiya komara olîgarşîk a demdirêj li ser bingeha şîddetê wê cihê xwe ji komareke demokratîk û laîk a ji demokratîkbûnê re bihêle.

Di rastiya xwe de, li giraveke li girtîgeha yek kesî ya dixwazin di şexsê min de mehkûm bikin, ev Kurdîtiya azad e. Li Îmraliyê 12 sal in polîtîkayên rojane têne bicîhanîn. Sîstematîkin. Eger em van polîtîkayan tenê weke polîtîkayên li girtîgehên tirk bibînin ev yek dê rê li ber xwe xapandinên girîng veke. Di heman demê de ev yek wê bi xwe re hem ji bo Kurdan û hem jî ji bo tirkan polîtîkayên tiştekî çareser nakin bi afirîne ku rê li ber şer veke. Rêbertiya ku ez dikim Rêbertiya nemire û heya mirovahî hebe wê were jiyîn.

Ez dê li vir nehêlim ku sedem ji mirina min re çêbibe. Ez dê dawî li jiyana xwe neyînim. Lê ger bixwazin bikujin, dikarin bikujin. Ji bo bilindgirtina hêviya aştî û azadiya gelê xwe ez hewl didim ku zêdetir bijîm.

Ez li vir girtiyekim. Ez baş jî di ferqa vê de me. Ez di zanebûna vê rewşa xwe de me. Dikarim bidim xuyakirin ku weke girtiyekî li vir bi şêweyeke hêjayî hevalên xwe, gelê xwe meşa xwe ya dawî temam bikim. Armanca min tenê ev e. Ez dikarim li vir ancax van bikim. Li gorî pêwîstiya berpirsiyariya xwe ya li hember gel ez neçarim xwe bidim jiyîn. Ji ber vê çendê ez hewl didim ku li hemberî van şertên li vir ên ji mirinê xerabtir li ber xwe bidim. Hûn berxwedaniya Mazlûman, Kemalan, Xeyrîyan dizanin. Mazlûm xwe darde kir. Kemal û Xeyrî di rojiya mirinê de jiyana xwe ji destdan. Ez neçarim ku ez rêzdar bim li hember biranînên van hevalan. Neçarim biranînê wan bidin jiyîn. Ew mirovên pir wêrek bûn. Ez eşkere bibêjim, ez biqasî wan ne bi

cesaretim. Dibe ku ez yekî ji rêzê bim jî. Dibe ku ez kesekî zêde neyêm mezinkirin jî. Lê ez tiştekî tenê dizanim. Ev jî ev e ku ez li vir hewl didim bi awayeke bi rûmet bi kesayet, bi şêweyeke gelê me û nirxên me heq dikin bijîm. Tekoşîna min a li vir bi awayeke herî hêsan herî eşkere tekoşîna parastina nefsa xwe ye. Têkoşîna xwedî derketina li nefsa xwe ye.

# HELBESTÊN RÊBER APO

## *LI ÇIYAYÊN SÎNCARÊ*

*LI BA DERWÊŞÊ EVDÎ BÛMA*
*LI SER PIŞTA HESPÊ BOZ*
*DAKETAMA DEŞTA MUSILÊ*
*DEMA DERWÊŞ HAT LÊDAN*
*MIN BIDANA PIŞTA XWE*
*BIRIBANA ÇIYAYÊN KURDÎSTANÊ*
*MIN JÊ RE GOTIBÛNA:*
*"BINÊRE VAYE BI HEZARAN E DULÊ*
*Û DUWANZDEHAN HENE"*
*MIN BI GOTA: "LI VAN ÇIYAYÊN KURDÎSTANÊ*
*KU XWEDAVENDA TEXT DANÎYE DE*
*REHET RAZÊ,*
*MIRIN JI KUDERÊ TÊ BILA BÊ,*
*ÊDÎ TU XEMA NE XWE."*
*MIN BI GOTA: "KURDÎNIYA VEBIRÎ*
*U JIYANA AZAD*
*RASTIYA BÊ DAWIYE".*

## *DAYIKA PÎROZ Û JINA EVÎNÊ*

*JI BONA KU BI TERE JIYAN BIKIM*
*JI ADEM Û HAWAYÊ VE DI NAVBERE ME DE*
*EW DEVIYÊN REŞ KU HATINE ÇANDIN, RAKIRINA WAN,*
*PÊWÎSTE EW DÎWARÊN HATINE BILINDKIRIN BÊN HILWEŞANDIN.*
*JI BONA VÊ ;*
*JI ÇÎNA YEKEM, DI DESTHILATDARIYA YEKEM,*
*BINKENFTINA EW ZILAMTIYA DEREWKAR Û ZALIM*
*Û PÊWÎSTE AGIRÊ ŞARISTANIYÊ YA KU HATIYE DIZÎN BÊ GIRTIN.*
*JI BONA VÊ ;*
*JI BERDELA HEMÛ PROMETEUSAN VE MIN ŞEREKÎ DA BER ÇAV.*
*MIN CÎHAN LI HEMBERÎ XWE DÎT.*
*Û EZ LI WELATÊ PROMETE BI XAYÎNTÎ DÎL HATIM XISTIN.*
*EY DAYÎKA PÎROZ*
*Û JINA EVÎNÊ*

***NAVÊ Û DÎROKÊN PARAZNAMEYÊN***
***RÊBER ABDULLAH OCALAN***

- *AÎHM 1*

*JI DEWLETA RAHÎBÊN SUMERAN BERBI KOMARA GELAN VE ( 2 TIRMEH 2001)*

- AÎHM 2

JI DEWLETA RAHİBÊN SUMERAN BERBI KOMARA GELAN VE ( 11 NÎSAN - 28 TEBAX 2001)

- PARAZNAMEYA MIROVÊ AZAD (PARAZNAMEYA ATÎNA) 20 GULAN 2003

- PARASTINA GELEKÎ (27 NÎSAN 2004)

- NEXŞEYA RÊ ( Li Tirkiyê Pirsgirêkên Demokratîkbûyînê û Di Kurdîstanê De Modelên Çareseriyê) ( 15 TEBAX 2009)

- MANÎFESTOYA CIVAKA DEMOKRATÎK (PÊNC PIRTÛKIN)

1-ŞARISTANÎ (Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên bi Maske)

2-ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST(Serdema Qralên Tazî û Xwedayên Bêmaske)

3-SOSYOLOJIYA AZADIYÊ

4-LI ROJHILATA NAVÎN KRÎZA ŞARISTANIYÊ û ÇARESERIYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK (04.08.2009)

5-PIRSGIRÊKA KURD Û ÇARESERIYA NETEWA DEMOKRATÎK ( 21 - 22 KANUN 2010 )

**DÎROKA GIRAVA ÎMRALIYÊ**

Girava Îmraliyê girêdayî bajarê Bursa yê ye. Di nava behra Marmarayê de ye. Di nava behra Marmarayê de çar giravên mezin hene. Yek ji wan Îmralî ye. Rûpîvana Îmraliyê 9,98 km2 ye. Dirêjiya giravê 19,4 km'ye.

Navê girava Îmraliyê Kalolîmnose. Di dema Orhan Begê osmaniyan de Fermandarê bi navê Emîr Elî vê giravê ji Bizansiyan distîne. Piştî girav tê desteserkirin navê Emîrelî digire bi demê re ev nav dibe ÎMRALÎ. Di sala 1913’an de li girava Îmraliyê 3 gundên Roma hebûn. Ev gund 250 malbûn. Dibistan û Dêrek wan hebû. Debara xwe bi çandinî, masîvaniyê dikirin.

Piştî peymana Lozanê di sala 1924’an de biryar hat girtin ku gelê vir derbasî Yewnanîstanê bibe. Girav heya demekê vala tê hiştin. Di sala 1935’an de ji aliyê Oste Fexrî ve dîwarên Dêrê hatin çêkirin û weke girtîgeh hat amadekirin.

Kesên ku cezayên giran û yên dardakirin digirtin derbasî vê giravê dikirin. Cara yekem girtîgeha nîv vekirî ya li Tirkiyê hatiye sazkirin girtîgeha Îmraliyê ye. 50 kesên ku hukmên giran girtine di vê girtîgehê de hatine hepiskirin.

Hukûmeta KT. Serokwezîrê xwe Adnan Menderes, Wezîrê Karê Derve Fatîh Ruştu Zorlu, Wezîrê Maliyê Hesan Polatkan li girava Îmraliyê dardakirine. Piştî 29 salan cenazeyên wan ji girava Îmraliyê derbasî Stenbolê dikin.

Piştî ku Rêbertiya me derbasî girava Îmraliyê hat kirin hemû girtiyên wir hatin derxistin û tenê Rêbertiya me li wir hat bicih kirin. Dewlet û hukûmeta tirkiyê her tim îxanet li dîroka xwe û gelê xwe kiriye.Ti carê mafê mirovan nedaye wan. Ji ber vê sedemê her tim rûyê berpirsên tirkiyê reş e. Lê piştî Rêbertiya me derbasî vê giravê kirin ev perpirs herdu rûyên xwe reş kirine û heya niha jî sûcên mirovahiyê berdewam dikin. Em weke gelê Kurd, Jinên Kurd, Ciwanên Kurd, Zarokên Kurd wan efû nakin û vê bêmafiyê lanet dikin. “Nırxandıneke Taybet”

**TÊBINÎ**

Ev pirtûk ji aliyê hevalên JIN Komîteya Ziman û Hînkarî ve hatiye redaktekirin. Ji bo alîkariya di derbarê amadekariya vê pirtûkê de ji bo Hevalên Komîteya Ziman TZP zor, zor SPAS.

Ji bo alîkarî, nirxandin û berçavan re derbaskirina Hevalên JIN yên Komîteya Zanist û Ronakbîrî zor, zor SPAS.

Ji bo alîkariya hevalên ku di dibistanên Wargeha Şehîd Rûstem de dixebitin ku derfeta xebata vê pirtûkê dane zor, zor SPAS.